K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

# DI el-KELÎMATU’L-QÎSARA BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ

TEZA LÎSANSA BİLİND

AMADEKAR
NARMÎN MOHAMMED HUSSEİN
17950001006

ŞÊWİRMEND
Doç. DR. Nesim SÖNMEZ

VAN-2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

# BABA TAHİR HEMEDANİN el-KELİMATU'L-KİSAR ADLI ESERİNDE İRFANÎ ÖZELLİKLER

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
NARMÎN MOHAMMED HUSSEİN

17950001006

DANIŞMAN
Doç. DR. Nesim SÖNMEZ

VAN-2019

T.C.
**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

## TEZ KABUL TUTANAĞI

### YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Narmin Mohammed Hussein HUSSEIN tarafından hazırlanan **"Di el -Kelîmatul-Qîsara Baba Tahirî Hemedanî Da Taybetmendîyên Îrîanî"** adlı bu çalışma, 02/09/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan(Danışman)** | : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ | İmza: ……………………… |
| **ÜYE** | : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR | İmza: ……………………… |
| **ÜYE** | : Dr. Öğr.Üyesi Ahmet BARDAK | İmza: ……………………… |
| **ÜYE** | : ……………………...…… | İmza: ……………………… |
| **ÜYE** | : ……………………….…… | İmza: ……………………… |

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

02/09/2019
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
Enstitü Müdür Vekili

ETİK BEYAN SAYFASI

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım "*DI EL 'KELÎMAT'UL-QÎSAR' A BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ*" adlı çalışmasında, tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar çerçevsinde elde ettiğimi, tüm bilgi belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygum olarak sunduğumumu, tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak gösterdiğimi, kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı;

Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda aleyhime doğabilecek tüm hak hayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Narmîn Mohammed Hussein

02.09.2019

Teza Lîsansa Bilind

Narmîn Mohammed Hussein
ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZİMANÊN ZİNDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZİMAN û ÇANDA KURDÎ
Îlon-2019

(DI el-KELÎMATU'L-QÎSARA BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ)

**Kurte**

Baba Tahirê Hemedanî yek ji kesên herî navdar û helbestvanên arîfî yê Kurd ê li Îranê ye. Beşeke zêde ya helbestên wî fikir û ramanên îrfanî pê ve diyar dibin. Di dîrokê de lêkolînvan û nivîskarên di warê îrfaniyê de xebat kirine Baba Tahir weke sergermê helbestvanên arif ê di nava cîhana wêjeyî de bi nav dikin. Di derbarê jidayîkbûna wî de jî ti pirtûk û nivîsên zanistî, rast û dirûst li ber dest nîne ku dema jidayîkbûna wî diyar bike. Herwiha çawa navê wî yê temam nediyar e, tişta di pirtûkan de behs tê kirin Baba Tahir li sala 390-391'ê ji dayîkbûye û nasnavê xwe wek Uryanî hilbijartiye.

Baba Tahir ji bilî dîwana xwe ya helbestan, belavokek bi navê *'Kelîmatu'l Qîsar-Peyvên 'Erebi'* nivîsandiye. Di vê belavokê de gelek sembolên îrfanî hatine bikaranîn. Me di beşa sêyemîn a lêkolîna xwe de bi hûrî kar li ser vê babetê kiriye û şîrove kiriye. Me hewl daye beş û zaraveyên îrfaniyê li gor pîvan û ferhenga îrfanî şîrove bikin. Tişta di vê lêkolînê de girîngtrîn cî girtî ev e ku Baba Tahir helbestvanek arif ê navdar bû û bi taybetmendiya xwe, fikra îrfaniya xwe di nav helbest û berhemên xwe de eşkere kiriye.

Peyvên Sereke : Baba Tahir, Îrfan, Sofîgerî, Ol

Hejmara Rûpelan : 85
Şêwirmend : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

Yüksek Lisans Tezi

Narmîn Mohammed Hussein

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI
Eylül-2019

(BABA TAHİR HEMEDANİN EL KELİMAT'UL-KİSAR ADLI ESERİNDE İRFANÎ ÖZELLİKLER)

## Özet

Baba Tahirê Hemedanî; İran Kürdistan'ında arifliğiyle bilinen bir Kürt şairidir. Büyük bir kavrayış gücüne sahip olan şairin şiirlerinde sezgisi güçlü düşünce yoğunluğu hemen kendisini hissettirir. Tarihte araştırmacılar ve yazarlar irfan konusunda Baba Tahir'i edebiyat dünyasında çoşkulu ve akışkan olarak tanımlıyor. Doğum tarihiyle ilgili her hangi yazılı bir bilgiye ulaşamadık. Nasıl ki gerçek ismi tam olarak bilinmiyorsa, bazı kaynaklarda belirtilenlere göre 390-391 yılları arasında kendisine bir yakıştırma, sıfat ya da günümüz deyimiyle soyadı olarak Uryanî'yi seçiyor Baba Tahir. Artık o, Baba Tahirê Uryanî olarak tanınacaktı.

Baba Tahir şiir divanın dışında özlü sözler anlamına gelen 'Kelîmat El-Qîsar-Peyvên Kurt' adıyla yazdığı bir risale günümüze kadar geldi. Bildiride birçok irfan sembolü kullanmış bir bilgindir aynı zamanda. Biz ona güzelleme yapmıyoruz. Biz, bu ilim ve irfan insanını Araştırmanın üçüncü bölümünde enine boyuna ele alarak yorumlamaya çalıştık. Bu arada irfana dair bölümde onun kullandığı tasavvufî terimleri irfan kültürüne göre yorumlamaya çalıştık. Burada ortaya çıkan en önemli şey Baba Tahirê Uryanî bilinen arifane bir şairin yaklaşımıdır. O, oluşturduğu kişilik özellikleriyle irfani bir şahsiyet olduğunu göstermiştir.

Anahtar Kelimeler : Baba Tahir, İrfan, Sofilik, Din

Sayfa Sayısı : 85
Tez Danışmanı : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

**(M.Sc. Thesis)**

Narmîn Mohammed Hussein

**YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY**

**INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES**

**July-2019**


## Abstract

Baba Taher Al-Hamadani, who is one famous and well-known Kurdish poet in Iran. Much of this poem was about conceptional,

Mental and Knowledge. through out many years the invertigators and writers in the knowledge field called him the (trainer of literature's world) . so about the time of coming and his enter into the world of literature, there is nothing, none book or writing in our indicate that his coning into world of litretarue scientifically and correctly. so even his full name wasn't complete and unknown and this found like this in books baba taher was born in (390-391) . He choosed his famous name (Al-Uryani) as a nickname, Exeep his colleetion of poems. He has a

Book in name (Kalimat Al-qisar), and in this book he used symbols and wishes in knowledge. we look for in the third part in this investigation and we search on it a explication in detail and carefully. we tried to investigate it's terms in knowledges a ccording to the measure and evaluation in the index of the knowledge.

That we attraention in the explication that was baba taher Al-hamadani aknowledge woll-known poet and disclosed it's poem perterties in the field of *conceptional knowledge*….



Key Words : Baba Taher, Irfan, Sufis, Religion,
Quantity of Page : 85
Supervisor : Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

# NAVEROK

Kurte ........ I

Önsöz ........ II

Abstract ........ III

NAVEROK ........ IV

Pêşgotin ........ VII

Despêk ........ 1

1. Jiyan û Neteweya Baba Tahirê Uryan ........ 5

1.1. Jiyana Baba Tahirê Uryan ........ 5

1.2. Serdema Zarokatiyê ya Baba Tahirê Uryan ........ 9

1.3. Navê Temam ê Baba Tahirê Uryan ........ 9

1.4. Navê Bav û Bapîrên Baba Tahir Uryanî ........ 10

1.5. Mezheb û Exlaqê (Silûkê) Baba Tahir Uryanî ........ 12

1.6. Îrfan û Baba Tahir ........ 13

1.7. Nasnavên Baba Tahirê Uryan ........ 14

1.8. Dû Beytên Baba Tahirê Uryan ........ 16

2. NASANDINA (PÊNASEYA) ÎRFAN Û SOFÎGERIYÊ ........ 21

2.1. Pênaseya Sofîgeriyê: ........ 21

2.2. Nasandina (Pênaseya) Îrfan: ........ 26

2.2.1. Cûdahiya Sofîgerî û Îrfan: ........ 28

2.2.2. Cûdahiya Îrfan û Ol (Dîn) ........ 30

2.2.3. Çavkaniyên Sofîgeriya Îslamî ........ 31

2.2.4. Sedemên Belavbûna Îrfaniyê ........ 35

2.2.5. Cûdahiya Îrfan û Felsefeyê ........ 35

2.2.6. Gotinên Bê Wate (Şetehat) ........ 35

2.2.7. Edebiyata Îrfanî (Sofî): ........ 35

2.2.8. Şerîet û Îrfan ........ 37

2.2.9. Hinek Xwederxistinên Arif û Sofiyan ........ 39

3. DI El 'KELÎMAT UL-QÎSAR A BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ ........ 39

3.1. Di Derbarê Zanistî De ........ 39

3.2. Di Derbarê Marîfe De ........ 53

3.3. Di Derbarê Îlhamê De ........ 59

3.4. Di Derbarê Mejî (Awez) De: ........ 61
ENCAM ........ 64
ÇAVKANÎ ........ 66
PÊVEK ........ 70

KURTEBÊJE

| | |
|---|---|
| amd | :Amadekar |
| B | : Berg |
| Ç | :Çap |
| d. | :Dîwan |
| H.r | :Heman rûpel |
| J | :Jimare |
| C | :Cild |
| Ko | :Kovar |
| T | :Tercume |
| Wer | :Werger |
| Weş | :Weşanxane |

**Pêşgotin**

Eger em bixwazin pênaseyek baş di derbarê îrfan û sofîgeriyê de bikin, divê em vegerin çavkaniya herdû terîqetan. Divê merasîm û kevneşopiyan destnîşan bikin. Lê li gorî çavkaniyên di vî warî de hatine nivîsandin, ew yek ji bo me derdikeve ku zuhd û sofîgerî vedigerin ser heman çavkaniyê. Em bi rêya hal, meqam, sema û govendê li rastiyê digerin. Sofîgerî dest berdana ji dinyewîtiyê û xwe veqetandina ji bo cîhana dawiyê (axîret) re ye. Îrfan jî serapa bi rêya keşif, şihûd û kerametê (mezinahî) li pey rastiyê digere.

**Sedemê Hilbijartinê vê Mijarê**

Tevî ku di nava lêkolînên wêjeyî û ayînî de lêkolînên baş li ser mijara îrfanî hatine kirin jî, lê di wan lêkolînan de gelek astengî û kêmasî hene. Ji wan jî peywendiyên îrfan û wêjeyî gelekin. Tevî ku heta niha bi kêmî lêkolîn li ser Baba Tahir hatine kirin, ew jî ne li gor pêdiviyan in. Heta niha ti lêkolîn di derbarê *'Kelîmat El-Qîsar-Peyvên Ereb*î'de nehatiye kirin. Lewra me pêwîst dît ku li ser vê mijarê dest bi lêkolîna xwe bikin. Lewra navnîşan lêkolîna me "*DI el-'KELÎMAT'UL-QÎSAR' A BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ"* ye.

**Armanca Lêkolînê**

Armanca vê lêkolînê ew e ku bi awayek giştî îrfan, sembol û nihêniyên îrfan û pênaseya îrfan ligel nasandinek ji bo sofîgeriyê eşkere bikin. Armanca me ya taybet jî destnîşankirina taybetmendiyên îrfanî di "Kelîmat'ul Qîsar" a Baba Tahir de ye.

**Rêbaza Lêkolînê**

Me di vê lêkolînê de rêbaza dîrokî û şîrovekirina wesfî bikaraniye.

**Astengiyên Li Pêşiya Lêkolînê**

Em di vê lêkolînê de rastî gelek astengiyan hatine. Ji wan jî;

-Nebûna çavkaniyên pêwîst li ser vê mijarê

-Nebûna çavkaniyên zanistî li ser jiyana Baba Tahir

-Nebûna çavkaniyan bi zimanê Kurdî. Ji bo vê yekê jî me sûd ji çavkaniyên biyanî wergirt û ev jî bi hêsanî nedihatin bidest xistin.

**Beşên Lêkolînê**

Lêkolîna me ji despêk, kurtî û sê beşan pêktê. Me di beşa yekemîn de behsa jiyana Baba Tahirê Hemedanî kiriye. Me hewl daye ku em nav, nasnav, sala dayîkbûn û koça wî ya

dawiyê ligel naveroka helbestên Baba Tahir destnîşan bikin. Beşa duyemîn ku ji çend mijaran pêktê, me hewl daye behsa pênaseya îrfan û sofîgeriyê bikin. Herwiha me behsa cûdahiya îrfan, şerîet û sofîgeriyê jî kiriye. Herwiha behsa cûdahiya îrfan, ol, çavkaniyên sofîgeriyê û wêjeya îrfaniyê hatiye kirin. Di beşa sêyemîn de jî me hewl daye, îrfanî û taybetmendiya îrfanî di 'Kelîmat'ul Qîsar' a Baba Tahir de destnîşan bikin. Em di dawiya lêkolînê de jî gihiştin çend armancan. Me bi awayeke kurt û sade eşkere encam eşkere kiriye. Di dawiyê de jî me sûd ji gelek çavkaniyên Kurdî, Farisî û Erebî wergirtin û me di dawiya lêkolîna xwe de bi awayek zanistî rêza çavkaniya diyar kiriye. Bêguman ti hewldan û nivîsînek bê kêmasî nîne, herweha kêmasiyên vê lêkolîna me jî hene. Hêvîdarim hûn giringiyê bidin kêmasiyên vê lêkolînê, ev kêmasî nebin sedem ev lêkolîna me nirxê wê bê kêmkirin û westana (mandîbûna) me vale biçe. Hêvîdarîn em bikarin vê lêkolînê sûdekê bigihînin ferhenga wêjeya Kurdî.

**Despêk**

Îrfan û sofîgerî weke deryayek kûr û bê binî ne. Ji ber vê yekê her kes dikare li gor dîtin û ramana xwe lêkolînê li ser bike. Sofîgerî ji despêka derketî ve ji wan kesan re dihat gotin ên ku dest ji xweşiyên cîhanê berdidan. Dixwestin bi rêya hal û meqaman xwe bigihin rastiyê. Di heman demê de ji bidestxistina pejirandina Xweda û biheştê karên bi wî awayî dikirin. Ji despêkê ve navê *zuhdî* lê hatibû kirin. Gelek tevgerên ecêb û seyr dikirin. Wek mînak, cilûbergên taybet dikirin ber xwe û bi taybet jî yên ji hiriyê dihatin çêkirin. Di vî warî de nêzî rahîbên Xiristiyan bûn. Îrfan jî tê wateya nasînê. Ango nasîna zanist, rastî, nasîna Xwedayê Mezin û hwd. bi rêya keşif û şihûdê ve.

Em di vê mijarê em qala filosof, zanyar, hozanê Kurd ê navdar Baba Tahir Hemedanî û fikra wî ya di derbarê sofîgerî û Îrfaniyê de bikin. Ev wek helbestwan û arifek Kurd di navbera salên 937–1019an de jiya ye. Li Hamedana herêma Loristan a Rojhilatê Kurdistanê de hatiye dinê. Helbestvanê Ahlê-Heq ango Yaresanî ye. Helbestên xwe bi zaravayê Lorî, Goranî yê Kurdî de nivîsandiye. Hin helbestên wî, di kitêba muqaddes ya Yaresanan de jî cîh girtine. Hêj di zaroktiya xwe ve, bala xwe dide peydakirina zanyariyan, pirsên civatê, cîhanê, mirov, dîrokê. Evîna Îlahî dibe rêya wî. Nav û dengê wî di nav xelkê de bandorek berfereh dike. Beytên wî, gotinên wî, ramanên wî, helbestên wî di nav xelkê de belav dibin. Herweha bandora xwe li muzîka Farisî, Kurdî dike. Fikra xwe ya diderbarê hemî termen tesewwûfê de di wan helbest û dubeytiyên xwe de aniye ziman. Bi wî şiklî jî bûye fîlosof û arifek bi nav û deng.

Ji ber navûdengê wî yê mazin Faris wî wekî filosofê Farisî didin nasandin. Lê, rastiya wê nî ne. Ew bi xwe, xwe bi Kurd binav dike. Hîn di xortaniya xwe de şevek gava gengeşe li gel xwendevanên xort ên din dike, sibehî radibe û vê beyta xwe ya navdar dibêje ku '*ez şevê Kurd razam, biyanî Ereb şiyar bûm*'. Hin şiroveyan vê yekê bi zulma Ereban, ku li deverên Kurd pêkanîn dinirxînin. Ango, ew dever Kurd bûn, welatê Kurdan bû, lê Ereban bi zorê bidest xistin.

Ya ku em dizanin di serdema jiyana Baba Tahir de dînê Ehlê Heq ango dînê Yarsan li gelek heremên çiyayî yên welatê Kurdistana vê hingê û navçeyên nêzîkî Kurdistanê dihatin zanîn. Bi piranî ev ola ku em behsa vê dikin, li gel ku ji Îslamê jî kevintir e, lê di nav zeman de bi awayek din wekî mezhebekê misilmantîyê xwe dida nîşan û di nav zeman de Yaresanan dijîtî kirin, bi taybetî di serdema Osmaniyan de ji wan re "Xulatê Şîe", "Batinî" û Elî Îlahî hat gotin. An jî deweran ew bi wî şiklî hatin bi navkirin.

Bêguman hewayê dînî yê Yarsanê ku tevlî sofîzma Îslamê bûye, ne tenê di şiirên Baba Tahir de derdikeve holê. Her wiha di hin berhemên din de jî derdikeve meydanê. Guman heye ku di dawîyê de emê behs bikin, belko bi xwe jî endamekî wê yê mezin bûye û rêxistina dînî ya Yarsanê de xwedîyê sevîye, derece û meqamekê taybetî bûye, ku zimanê wan ê resmî diyalektê Goranî yê zimanê kurdî ye. Li gel ku ew zimanê Baba Tahir ku dubeytan pê nivîsandîye, ne diyalektê Goranî ye û diyalektekî Lorî yê navçeyî tê de heye, lê peyrewên Yarsanê jiber dikin û bi sirûd dibêjin, ku li gor wan lazim e kesek nehênîyên wan fehm neke. Dibê em vê jî ji bîr nekin ku Baba Tahir diyalektê Goranî zanîye û vê tesîrê dubeytên wî kirîye. Heta ku em dizanin wî di dubeytiyên xwe de hemî fikr û ramanên xwe yên sofîgerîyê anîne ziman.

Mezintirîn çavkanî di dîroka dînê Ehlê Heq ê Yarsanê de, şahê xebatê yê Hacî Nîmetullahê Mukrî yê bi navê “Şahnameya Heqîqetê” ye. Di vir de nivîskar ji nav hemî ew rêberên peywendîya wan bi dînê Yarsanê re heye, cihekî diyar ji Baba Tahir re veqetandîye, ku bi xwe navê wî dike “Mezinê Ehlê Heq”.

Êdî nabe bê liberçavgirtina dînê Yarsanê bîr li şi’rên Baba Tahir bê kirin û pêwist e ew dîn jî qet nebe di warê nivîsandina edebîyata kurdî de- bi çavlêkerîya sofîzma klasîk a teorîya Îslamê ku beşek e ji sofîzma cîhanê lê bê nêrîn, her çend di warê praktîkê de Baba Tahir xwe wekî derwêşekî wê serdemê dide nîşan jî. El-Kelîmatu’l-Qisar Ev berhema Baba Tahir berhemeke tesewifî ye. Di vê berhemê de bi gotinên wî ên puxtedar, aliyê wî yê tesewiî derdikeve pêş, herwiha ramanên soîtî û aribûna wî xuya dike. Berhem ji aliyê mutasawifan ve peywendiyeke xurt dîtiye. El-Kelîmetu’l-Qisar 23 bab e ku ji remz û nasandinan pêk tê. Derbarê 21 rîsale gotegot heye ku ji aliyê Baba Tahir ve hatiye nivîsîn lê derbareyê van gotinan belge di dest de tun ne. Baba Thir bala gelek aliman kişandiye k udi dawiyê de lêkolînerên cîhanê ên mîna; Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elızabeth Curtıs, Minorsky û wd. li ser berhemên Baba Tahir xebat kirine, helbestên wî ên ku berhev kirine, birine welatên xwe çap kirine(Cihanbexş, 1384, 144).

Di dewrê xwe de hevdîtina wî û arifen wê deme jî hen. Heta ku en dikarin bêjin di ditîneke wiha de gihîştina wî ya şahê cîhanê Baba Xoşên û Baba Tahir de, rojhilatnasê Rûs V. Êvanov zanyarîyeka baş dide dest, bi taybetî sohbeta di navbera Şah Xoşên û Baba Tahirê Hemedanî û Fatmelereyê de bi lêv dike. Ev gotûbêj sembola romantîk ya nazik ya insên digihîne kopa serî ya zanayîyê, bi taybetî ew jina xwedîyê bîr û raya pîroz û bi exlaq ku di bin xizmeta Baba Tahir de bûye, di koşka Şah Xoşên, Baba Tahir û Fatmelereyê de cewhera jinanîyê bûye. Gotûbêj bi şi’r, bi çend cureyên din yên helbeswaniyê hatiye qeyd kirin.

Ba tahir wek pisporê dubeytiyan hatiye nasîn. Îro bi dubetiyên xwe ên delal, dilsoz û têrwate deng vedaye. Wî, di dubeytiyan de him eşqa ilahî aniye ziman, him jî derbarê qelenderî, feqîrî û hejariya xwe agahî daye. Dubaytiyên wî bi piranî eşqa Xwedayî, ramana wehdetu'l-wicudê dihindurînin. Ew ji aliyê gel ve wekî mirovekî pîroz tê naskirin û hezkirin. Dubeytiyên wî ji aliyê gelek kesî ve hatine jiberkirin, hinekî wan hatine bestekirin û hin dubeytiyên wî jî wekî stranan bi tembûrê tên gotin kuçêja teraneyên wî ji stranan pirtirin.

Di derbareyê zimanê Baba tahir de gelek gotinên cüda cüda hene. Ji ber ku dubeytiyên wî wekî xwe nemane. Bi awayê xwe yê resen nehatine parastin derketiye holê. Di nav dîrokê de li ser helbestên Baba Tahir guherîn pêk hatine û zimanê helbestên wî bi zimanê edebiyata Îranê ve hatiye nêzîkirin. Komek dubeytiyên helbestvanên din herwiha yek ji wan jî Pûrî Ferûdun e, ketine di nav dubeytiyên Baba Tahir. 106 Dubeytiyên Baba Tahir bi şêwaza zimanê Pehlewî hatine nivîsandin ku ji ber vê yekê hin caran ji zimanê dubeytiyên wî re Pehlewiyat jî tê gotin. Pehlewiyat tê wateya Pehlewiya Îslamî, ku nayê wateya Pehlewiya navîn. Kilîman Hewar bawer dike ku zimanên ku li rojavayê Îranê (Mad/Med) hene, ji zimanê gava ku heman dubeytî yên ku di çapên cuda de ne, em didin li ber hev, dibînin ku peyvên heman dubeytî yên nusxeyên cuda ji hev cudane. Di hin çapan de dubeytî ber bi Farisî ve hatine nêzîk kirin. Di hin nusxeyên dubeytiyan de peyvên Farisiya îroyîn, yanê peyvên ku van demên nêzik ketine Farisiyê de jî hene. Di heman dubeytiyên çapên cuda de, peyvên ku di Farisî, Lorî herwiha zaravayên Kurdî yên din, bi taybet devokên Kirmanşah û İlamê xêncî van di Lekî û Bextîyarî de tên bikaranîn hene. Di dubeytiyên ku hatine çapkirin û yên ku di destên me de ne, him peyvên Kurdî û him jî yên Faris (Ezkiyayî, 1375, 49).

Baba Tahir eşqeke dilsoz jiyaye û di nav wî eşqê de şewitiye. Çiyayê Elwendê sitargeha wî ye. Demên dur û dirêj li wir borandiye û ew der e cihê ku nêziktirinê yara xwe bûye. Li wir ji dilberê re helbestan rêzkiriye û ew her tim nalî ye. Ew di heyama xwe de mirovekî arif, navdar û xwedî keramet bûye. Her tim laşê wî derdkêş, dilê wî hesretkêş, ji ber xerîbiyê, bêriya yar û war kiriye û ji ber vê singa wî agirkêş bûye. Ew her demê xwe di nav êş û xemginiyê de borandiye û dermanê wî gihîştin û fena ne. Ew li her ku nêhêriye ji balabejna yarê nîşaneyek dîtiye(Ezkiyayî, 1375, 47). Herwiha gotiye ku ez dil û dilberê tevlihev dibînim ku ev gotinên wî ên di dubeytiyên wî de derbas dibin, eşqa wî ya Xwedayî û ramana wî ya wehdetê wicûdê radixin li ber çavan.

Di dubeytiyên Baba Tahir de mijarên evînî û ruhî bibandor in. Di dubeytiyên wî de eşkere dibe ku ew evîneke rût û tazî jiyaye û evîndarî wî serdanpê şewitandiye. Ji ber vê rewşê dubeytiyên wî bi giştî lîrkîne. Heman demê de mijarên evîniyê di dubeytiyên wî de bi ramana wehdetu'l-wicûdê (yekitîbûn) ve têkil in. Ew di helbestên xwe de ji bo vegotina raman û

hestên xwe gelek sembolên xwezayî û yên tesewifê bikar anîye. Wekî mînak ew gulê wekî sembol di helbestên xwe de bi kar aniye ku gula di helbestên wî de bêwefa, bêhêvî û temenê wê yek hefteyî ye. Ew bi rondikên çavên xwe gulê av dide lê gul dîsa ji destê wî derdikeve. Di dubeytiyên wî de wekî şêweyê jiyana wî qelenderbûn û derwêşbûna wî xuya dikin. “Ew wekî qelenderiyê yekem tê hesibandin.” Her wiha têkiliya wî bi soîzma Îslamî û bi baweriya Yarsanê ve jî heye. Heman demê de ramana yekitiya heyînan(wehdetê wicûd) dubeytiyên wî balkêştir kiriye. Di dubeytiyên wî de yekitiya baweriyan jî xuya dibe. Bi giştî di naveroka dubeytiyên wî de eşq, ramana wehdetu’lwicûdê, soîzma Îslamî, jiyana qelenderî û derwêşî hin taybetiyên baweriya Yarsanê wekî mijar cî digirin(Xeznedar, 2010, 215-216; Hidayet: 1346, 146).

# 1. Jiyan û Neteweya Baba Tahirê Uryan

Baba Tahirê Uryan yek ji helbestvanên Îranî yên herî diyar, berçav û giring e. Wî, di berdewamiya dîrokê de helbest û wêjeya (edebiyat) Farisî bi cîhanê daye nasandin. Emê li vir berê xwe bidin jiyan, bawerî û helbestên wî. Di heman demê de emê lêkolînek zanistî di derbarê Babe Tahirê Uryanî de bikin.

## 1.1. Jiyana Baba Tahirê Uryan

Eşkereye eger em bixwazin lêkolînek hûr û zanistî li ser serpêhatî û jiyana Baba Tahirê Uryan bikin, bêgûman em nagihin encamek baş û zanistî. Sedema vê yekê jî ew e ku çavkaniyên berçav û diyar di derbarê jiyan û nijadê (Netewe, irq) Baba Tahir de li ber dest nîne. Bi heman awayî di derbarê çavkaniyên baş li ser jiyana helbestvanên din ên Îranî jî nîne.

Bi dîtina mamosta Elaedîn Secadî, helbestvanekî Kurd ê sedsala 3'yan a koçî ye. Li gor hinek belgename û destnivîsên dîrokî, di serdema Sahbî kurê Ebad û Îbnî Sîna de jiyaye. Di serdema hikûmeta 'Buye' de jiyan kiriye(Secadî: 1979, r. 171).

Gelek dîtinên cûda li ser dema dayîkbûn û mirina Baba Tahirê Uryan hene. Lê tişta eşkere û bi vekirî derdikeve holê ev e ku Baba Tahir dawiya sedsala 4'an an jî despêka sedsala 5'an a koçî; derdora salên 390-391'ê koçî li bajarê Hemedanê ji dayîk bûye. Herwiha derdora salên 450'ê koçî jiyana xwe ji dest daye(Zindigî Name û Helbest: 1384, r. 113). Di navbera du beytên (du malikên) Baba Tahir de, du beytên ku gelek nivîskar û lêkolînvanan dîtina xwe li ser anîne ziman hene û dibêjin, eger ev herdu beyta helbestê li hêjmara ebceydî (ABC) bên zêdekirin, derdikeve ku Baba Tahir Uryan li sala 326'an a koçî ji dayîk bûye.

Herdu beyt wiha ne;

*Mu an behrem keder zerfî amadeste...*
*Çu an nuqtê ke der herf amadestem*
*Be her elfî Elif qedî beraye...*
*Elfî qedem keder elfî amadestem*

Nivîskarê navdar ê Îranî Ezkiyayî di derbarê van herdu malikan (beyt) de wiha dibêje, kesayetiyên weke Mîrza Mehdî Xan Kewkeb dîtinên balkêş li ser van herdu malikan hene. Tîpên Elif Qed, li beramberî 215 danîne. Lê eger Elif Qed' a 215 ligel 'Elif' 111 bê lihev dan,

wê demê dike 326. Ev jî dike sala jidayîkbûna Baba Tahir Uryan. Lê dibe heta salên 401 a koçî jiyan kirîbe(Baba Tahir Name: 1375, r. 116).

Nivîskar Ezkiyaye di berdewama behsa xwe de wiha dibêje: "Tevî ku ev dîtin gelek mantiqiye, lê di rastiya xwe de tekane belgeya li ser jiyana Babe Tahir li ber dest, pirtûka 'Rahe El-Sedur' a Necmedîn Ebûbekirê Mihemedî yê kurê Selmanê Rewendî ye. Ev pirtûk derdora salên 599-600'ê koçî hatiye nivîsandin. Di çîrokekê de û di dîdara Baba Tahir a ligel Tuxrul Selçûqî de vedigêre. Koça dawî ya Baba Tahir weke 447 a koçî diyar dike"(Baba Tahir Name: 1375, r. 116).

Nivîskarê navdar ê Îranî Rewendî di wê çîroka behsa Baba Tahir tê gotin de wiha vedigêre: "*Agehiya min jê hebû dema Sultan Tuxrul Begê Selçûqiyan sala 447'ê hicrî hat Hemedanê. Li Hemedanê 3 mirovên baş (Ewliya) hebûn. Ew jî Baba Tahir, Baba Cefer û Baba Himşaz bûn. Qubek (Mizgefa Quba) heye bi navê Xizir tê naskirin. Ev hersê kes li wir rawestiya bûn, bi hev re çûn û hev maç kirin. Baba Tahir arifek aloz (Şîfte) bû. Ji Sultan re wiha got; Ey Tirk, tû ligel xelkê xwe çi dixwazî? Sultan wiha bersiv da; Ew tişta tû dibêjî.. Baba Tahir jî got, wê tiştê bike ya Xwedayê Mezin dixwaze û piştre ev ayet jêre xwend. "Înellahe Yamûrû Bil 'Edlî Wel Îshan-Xwedê biryarê li ser tiştên rast û dirûst dide*"(Rahe el-Sedur: 1388, r. 99).

Sultan dest bi giryanê kir û got, ezê wisa bikim. Piştre Baba Tahir destê Sultan girt û jê re wiha got: Te ji min wergirt. Sultan got, belê. Baba Tahir lûleya misînek şikayî di dest de bû û bi salan bi wî misînî destnimêj digirt. Baba Tahir ew misîn da Sultan û gotê, min hemû serwetê xwe yê li ser erdê xist destê te û tû jî li ser dadweriyê be. Sultan diyariya Baba Tahir parast û ji bo çi şerekê çûban, dixist di destê xwe de"(Rahe el-Sedur: 1388, r. 99).

Li gor van dîtinên Mîrza Mehdî Xan Kewkeb, Baba Tahir li sala 326'ê koçî, jidayîk bûye. Dibe ku hevdîtina ligel Sultan Tuxrul jî nêzî sala 121'an be. Ev jî dîtinek dûrî rastiyê ye. Lewra em nikarin bêjin Baba Tahir li sala 326'an hatiye cîhanê. Ji ber vê yekê em çavkaniya Rahe El-Sedir a çavkaniyek dîrokî, cihê baweriyê, belgeyeke kevin û binirx e, rast dibînîn. Nekû gotin û gotinên cihê gumanê yên keseke weke Mîrza Mehdî Xan Kewkeb ku zêdetir li ser bingehê jimare saziyê werbigirin û ev jî ligel rihê (giyanê) Baba Tahir hevnagire.

Bi dîtina Reşîd Yasemî jî Baba Tahir di wan malikên ku me li jor behs kirî de, bal kişandiye ser wê yekê ku hêjmartina koçî di wê demê de ne gelek belav bû. Bi dîtina wî, armanc jê heman sedeya zayîniye. Ew jî dike despêka meha kanûna sala 1000'an a zayînî û

dike meha muherem a 391 a koçî. Ango li gor baweriya Reşîd Yasemî, Baba Tahir li sala 1000 a zayînî ji dayîk bûye û dike beramberî 390-391'ê koçî. Ji wê serdemê heta hatina Sultan Tuxrul a ji bo Hemedanê, ango di navbera salên 447-450'ê koçî de dike nêzî 55-58 sal. Bi vî awayî rastî û dirûstî wisa ye ku Baba Tahir derdora salên 390-391'ê koçî hatiye cîhanê(Baba Tahir Name: 1375, r. 52-53).

Li gor Dr. Marûf Xeznedar jî sala dîtina Baba Tahir nediyar e. Di çavkaniyekê de tê gotin ku Baba Tahir kurê Fereydûn e. Di sala 1019'an de jiya ye. Ji belgenameyek rast hatiye wergirtin ku Baba Tahir di heman salê de canê xwe ji dest daye. Hinek di wê baweriyê de ne ku di navbera salên 937-1019'ê zayînî de jiyan kiriye. Hinek jî dibêjin di navbera salên 999-1058'ê zayînî de jiyan kiriye. Beşek din jî bi hevçerxê Îbnî Sîna 1073 dibînin. Hin nivîskarên din jî dibêjin di serdema Xoce Nesredînê Tûsî (1273) de jiyan kiriye(Xeznedar: 2010, r. 206).

Herwiha Reza Qulexanê Hîdayet di pirtûka 'Mu’cem’ul-Fesha'yê de dinivîse ku Baba Tahir li sala 401'ê koçî canê xwe ji dest daye. (Mu’cem’ul-Fesha: 1199). Bi balkişandina liser şîrove û baldariyên Rewendî yên di pirtûka 'Rahhe El-Sedur' de dema mirina Baba Tahir ji sala 447'ê koçî ya behs tê kirin derengtire. Lewra dîtina Rewend bi giştî şaş e û em vê angaştê red dikin.

Gelek nivîskarên din ên Îranî jî dîtinên xwe li ser vê malika '*Elfî qedem keder elfî amadestem*' Baba Tahir tênin ziman. Bi dîtina wan Baba Tahir li sala 1000 a zayînî murşîdekî (mûrîd) temam û kamil tê nava cîhanê. Nivîskar di wê baweriyê de bû di mezhebê Îrfanî de gihiştiye pileya meqamê me’newî. Armanc ji vê malikê (beyt) jî berhevkirina xwe ya ligel arifên ku gihiştine pileya me’newî ne(Zîndegî Name û Şî’r: 1384, r. 114).

Bi awayek giştî gelek caran bi awayên ecêb, balkêş û efsaneyî ne behsa jiyana Baba Tahir hatine kirin û hemû jî ne cihê baweriyê ne. Ji wan jî, Elî Qullî Xan di 'Riyaz El-Şi’rî' û di beşa dîdara Baba Tahir û mamosta Nesrî Tûsî de dibêje, Baba Tahir 672'ê koçî canê xwe ji dest daye. Herwiha nivîskarê 'Tezkerey Îbrahîm' di hevdîtinek ligel Îbnî Sîna de, sala mirina Baba Tahir wek 428'ê koçî dest nişan kiriye. Nivîskar li vê derê behsa gelek çîrokên ecêb û balkêş dike(Dubîtî Bumî Serayan Îran: 1379, r. 29).

Pehanî Sêmnanî çîrokên di Daxistanê de behs dike ku di vê çîrokê de vegêranek cûda heye. Li gor dîtina Penahî Sêmnanî; "Yan Mamosta Nesîr ku bi awayekê din warê exlaqî de pirsgirêk hebûn û Îbnî Sînayê stêrnas (astrolog) yê dixwest cihê diyar ê marsê (merîx) diyar bike; di merasîmekê de van herdu zanayên serhişk Baba Tahir dîtine. Baba Tahir bi jîrî û

jêhatiya xwe pirsgirêka wan herdu zanayan çareser kirine(Dubîtî Bumî Serayan Îran: 1379, r. 29).

Diyare ti bingehekî zanistî yê van çîrokan nîne. Ji ber ku di navbera jiyana van zanayan de demek dirêj heye. Mînak, Xewace Nesîr zêdetirî 200 sal piştî Baba Tahir canê xwe ji dest daye(Dubîtî Bumî Serayan Îran: 1379, r. 30).

Nivîskarê pirtûka "*Riyaz El-Arfîn*" jî di wê baweriyê de ye ku Baba Tahir di werza zivistanê ya sir û serma Hemedanê de, di nava çiyayên Elwend de bi awayek rût (tazî), bê cilûber rûniştiye û ji ber germayê kiriye nale nal (Riyaz El-Arfîn: 1346, r. 146). Gelek nivîskarên din ên Îranî jî Baba Tahir weke arifeke temam bi nav dikin. Hinekên din jî Baba Tahir weke keseke dîn (şêt) û mejî têkçûyî bi nav dikin. Ji bo vê yekê jî gelek serpêhatiyên nerast li ser wî çêdikin. Ji wan jî çîrokek ji hemûyan ecêbtir çîroka zivistanê 40 caran xwe li ser cemedê avêtina xwar e ye ku ev jî gotineke dûrê rastiyê ye(Dûbeytî Bumî Sirayan Îran: 1379, r. 30).

Ger mirov bi hûrî temaşeyî wan çîrokan bike, mirov wê bibîne naveroka van çîrokan ji bilî efsane û hatine çêkirin, ne tiştek dine. Ger mirov mînaka dînî û netemamî weke mînak bîne, derdikeve holê ku ji bilî tiştek ji aliyê xelkê ve hatî çêkirin ne ti tiştek din e. Lê bi awayekî giştî Baba Tahir di pirtûkên wêjeyî yên Îranî yên cihê baweriyê de weke kesayetiyek "*Mişayix, arif û navdarekî cîhana helbesta îrfanî ya Îranê"* tê naskirin. Di sedsela 5'an de jiyaye û li Hemedanê derwêşî kiriye. Di warê dîtina îrfaniyê de xwediyê gelek zanyariyan bû. Ligel emîr û sultanên serdema xwe gelek rêz lê dihat girtin (Duys Suxen: 1378, r. 355).

Mamosta Elaedîn Secadî di pirtûka *Dîroka Wêjeya Kurdî* de wiha wesfê Baba Tahir Uryan dike; "*Rehend û dêwane û qelender, xwanas û parêzgar û herdegerd, besozî eşqêkî me'newî kurey derûnî le girrda bû, le yadî dostêkî nihênî demarekanî le xiroşanda bû, şeyday barehahî yezdan, herdegerdî çol û biyaban. hawrazî zemanî (Demawend) û hawrazî şewanî dîmenî (Meymend), carêk lalezarî zewî cêgey bû, carêkî dîkeş ciriyew estêrey asman şewçiray bû, rûhî le lalezarî erwahda le hemû gulêkî mijîwe, demêk le dunya dur bedur bû, demêk le aheng rûberû bû, tawêk le deştî Kifirda sergerdan bû, seremêkîş le korî ewdallanî xuda nasîda meygêrî meerîfet bû, hendêkcar xoy winkirdûwe, hendêkcarîş win bûwî bînîwetewe, henaseyek derwêşêkî nadan bû, hendêkcar şêxêkî melewan bû, zemanêk ezanêkî pek kewtû bû, dewranêkîş zanayekî gewhernas û durnasêkê bê wêne bû*"(Secadî: 1379, r. 170-171).

### 1.2. Serdema Zarokatiyê ya Baba Tahirê Uryan

Li gor çavkaniyên ku behsa jiyana Baba Tahir dikin, heta niha zanyariyên rast û hûr li ber dest nîne. Lê li gor çîrokên li ser Baba Tahir hatine nivîsandin, wê derdixe holê ku Baba Tahir li bajarê Hemedanê dest bi xwendina dibistanê kiriye. ‘Baba Tahir li Hemedanê dest bi xwendina seretayî kiriye, di wêjeya Erebî û Farisî de çalak bû. Ti guman li ser nîne Baba Tahir di warê zanist û zanyariyan de gelek xebat kiriye, ne kesek nezan û nexwendekar bû. Kariye di warê zanist û şînberiyê (manevi) de serkeftinê bidest bixe. Bê gûman ji bo vê yekê karên bêhempa kiriye. Lê ew gotinên behsa nezanî û paşketina Baba Tahir dikin, ne bingehên rast û zanistî ne’(Zîndegî Name û Şi’r: 1384, r. 144).

### 1.3. Navê Temam ê Baba Tahirê Uryan

Mirov dikare di derbarê navê temam ê vî arifê navdar de bêje, hemû çavkaniyên behsa jiyana Baba Tahir dikin li ser wê yekê hemfikir in navê wî yê temam Baba Tahir e û ji bajarê Hemedanê bû. Nezme Tewrêzî ji bo nasandina Baba Tahir wiha dibêje: ‘Baba Tahir, navê Tahirî hatiye’(Suxnur: 1378, r. 355).

Herwiha Dr. Marûf Xenzenedar jî di debarê navê Baba Tahir de heman dîtin heye û wiha dibêje: ‘Navê wî Tahir e û jêre Baba hatiye gotin. Ji ber ku yek ji firişte û zilamên rast ên Yarsanî bû. Bi bikaranîna navê Baba li pêşiya navê Tahir, ji bo rêberên baweriya Yarsan, mezhebê derwêşîzma Îslamî tê bikaranîn. Di Kurdiya niha de jî li cihê gotina 'Pîr' tê bikaranîn’(Xeznedar: 2010, r. 205).

Herwiha Baba Tahirê Uryan bi xwe jî di naveroka dû malikên helbesteke xwe de behsa navê xwe dike û dibêje

*Miwaz ruz ezil Tahir Bizadim*
*Ez în ru nam, Baba Tahir stim* (Dîwana Baba Tahir: 137)

Yan jî dibêje:
*Dilim dîrim çu mirix pa şikeste*
*Çu kiştî bir lib derya nişiste*
*Hime guyned Tahir tar binwaz*
*Seda zun de tar şikeste* (Dîwana Baba Tahir: 95)

Yan jî dibêje:

*Xidaya eş Tahir bî nişa bî*
*Ke ez işq bitan bî pa sirstim*(Dîwana Baba Tahir: 134)

Yan jî dibêje:
*Minim Tahir ke dir xunabe tuşî*
*Mihemed ra kimîne çakirîm* (Dîwana Baba Tahir: 13)

Di naveroka van malikan de ew yek ji bo me eşkere dibe ku Baba Tahir bi xwe behsa navê xwe kiriye û xwe weke Tahir dide nasandin. Bi awayekî giştî hemû nivîsên ji aliyê nivîskarên wêjeya (edebiyat) kevin û îrfanên Îranê ve hatine nivîsandin, hemfikirin ku navê Baba Tahir, 'Tahir' e.

### 1.4. Navê Bav û Bapîrên Baba Tahir Uryanî

Emê dîsa li ser navê bav û bapîrên Baba Tahir vegerin ser çavkaniyên di derbarê Baba Tahir de hatine nivîsandin. Ji bo vê mijarê emê vegerin ser babeta dibêje:

"*Ezîza merdî ez namerdî ez namerd nayî,*
*fuxan û nale ez bî derd nayî,*
*hefîqet bişnu ez purî ferîdun,*
*ke şûele ez tenufî serd nayî*

an jî;

*Bure kiz dîde ceyhunî yesazîm,*
*bure kez dîde ceyhunî bisazîm,*
*bure Leylî û Mecnûn bisazîm,*
*Fereydun Ezîz ez dest mu reft,*
*biya nu Fereydunî bisazim*."

Li gor van gotinan navê Baba Tahir Fereydûn e, lê hinek nivîskarên din jî wisa difikirin ku Fereydûn navê zarokekî Baba Tahir e (Zindegî Name: 1384, r. 144). Lê gelek nivîskarên din jî wiha dibêjin, Fereydûn hem navê Baba Tahir bû û hem jî navê yek ji zarokên wî bû. Lê Seîd Efîsî di pirtûka *'Dîroka Nezim û Nesir'* de diyar dike ev angaşt ne rast e. Ji ber ku zanyariyek hûr li ser navê Baba Tahir li ber dest nîne, ya baş ew e di naveroka du malikên wî de zanyariyek heta astekê rast bidest bixin. Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje:
*Min espîde ba Hemedanî*

*Kelanedarim endre ke nihanî*
*Be hal xud pirim guhan be kuhan be*
*Çing xud kinim mixcîrbanî* (Dîwana Baba Tahir: 117)

An jî dibêje:

*Gilî kişte bîm elwend daman*
*Oş ez dîde saman sebeh û şaman*
*Wifit en bî ke biwîş wa miwaî*
*Bire bidiş bire saman*(Dîwana Baba Tahir: 79)

An jî dibêje:
*Min en rindim ke namih bî qilindir*
*NEcan dîrim ne man dîrim ne lişgir*
*Çû ruz eyd bigirdim gird gîtî*
*Çu şu eyd bexçî wanihim sir* (Dîwana Baba Tahir: 43)

Diyare di derbarê Baba Tahir de çavkaniyên berdest tünenin. Jji bo ku em bikarin navê wî yê temam, sala jidayîk bûyî û sala canê xwe ji dest dayî diyar bikin. Lê em dikarin bi rêya helbestên wî hinek zanyariyên despêkî bidest bixin. Nivîskarê Îranî, Rastgo di despêka Dîwana Baba Tahir de wiha nivîsandiye; ‘Dibe yek ji sedemên jiyana arifek navdar ê weke Baba Tahir ew be Baba Tahir ne arifek civakî bû. Yek ji sedemên din ên nebûna çavkaniyên derbarê Baba Tahir de ew e ku Baba Tahir nebûyê cihê axaftinên dîroknasan û di nava kesayetiyên civatan û helbestvanan de cih negirtiye. Ji ber ku ne qesîdeyeke wî heye, ne jî xezelek wisa diyar û ne jî pesnê padîşahekê daye’(Dîwana Baba Tahir: 1-2).

Lê li gor van zanyariyên kêm ên ku niha li ber dest hene, mirov dikare bêje: ‘Baba Tahir yek ji wan arîf û fîlozofane ye ku ji bo pêşvebirin û berfirehkirina asoya nêrîna xwe, daxwazeke zêde ya hunera helbestan hebû. Di rastiya xwe de Baba Tahir banga wê yekê nekiriye û bêje, ez helbestvan im. Belkî nivîsîna helbestan bi awayê axaftin û gotûbêjan daniye, ji bo têgihiştina kesên beramberî xwe kiriye weke wesîleyekê. Ji ber vê yekê jî di warê ziman de, bê dilgiranî û netewperestî mirov dikare bêje; Baba Tahir ti erkek nebû û bi zimanê diaxivî helbest nivîsandine.’ (Behre Milt Ke Hestîm: 1372, r. 85)

Serdema Baba Tahir di warê zanist, çand û wêjeyê de gelek bi xêr û bereket bû. Divê bê gotin ku Baba Tahir di serdemekê de jiyaye, serdemek tejî zanist û huner bû. Li meydanê jî gelek nivîskar, helbestvan û fîlozofên wekî; Şêx Ebû El-Hûseynî Xerqanî, Ebû Elî Sîna,

Unsirûy Belxî, Ebû Seîd Ebû Lixî, Baba Kuhî û Ebû Şifezlî Beyqî hebûn. (Zindegî Name û Şiir: 1384, r. 114)

### 1.5. Mezheb û Exlaqê (Silûkê) Baba Tahir Uryanî

Di derbarê mezheb û exlaqê Baba Tahirê Uryan de divê bê gotin ku gelek bi kêmî li ser jiyana Baba Tahir hatiye nivîsandin. Di ti jiyanameyekê de bi eşkere nehatiye gotin ku Baba Tahir girêdayî kîjan mezhebekê şî'eyan bû. Ne tenê ev yek, belkî bi eşkere behsa wê yekê nehatiye kirin ku gelo exlaqê îrfaniya Baba Tahir girêdayî kîjan mezhebê bû. Tevî vê yekê jî zincîreya mezhebê (terîqet) Baba Tahir venegerandine ser zincîreya xwe ya resen. Lê gelek nivîskaran wiha gotine, Baba Tahir weke irfanê tekane perestî danîne. Hinekên din jî weke derwêşê rastiyê binav kirine. Ev herdu dîtin jî xwediyê taybetmendî û dîtinên xwe yên taybet in. Lê li ser gotin û helbestên Baba Tahir, baldariyek temam û deqîq didin helbestên wî. Ew jî zêdetir balê dikişîne ser ayeta Qur'an'ê û vegêrana ayetên îmamên duwanzde îmam heye. Herwiha mirov dikare balê bikişîne ser wê yekê ku Baba Tahir helbestvan bû û girêdayê firqeya îmamiyê bû(Şirih Ehwal yd. 1354, r. 60). Herwiha hinek nivîskarên din bi du malikên Baba Tahir wî weke Şîeyê duwanzde îmam bi nav dikin.

*Ez en ruzî ke ra ferîdî*
*Bexîr ez mesît çîzî nidîdî*
*Xudawenda be heq heşt û çarit*
*Zimu bigzir, şitir dîdî îdîdî* (Dîwana Baba Tahir: 86)

An jî dibêjin:

*Şu tarit buyinim tar taru*
*Girifte vilmitiş hir birix û baru*
*Xidaya ruşnayî bir dilim de*
*Ke ta wînim cemal heşt û çarû* (Dîwana Baba Tahir: 86)

Li vir Baba Tahir li çend cihan zaraveyê 'Heşt û Çar' ango 85 bikaraniye. Armanc ji vê heşt û çarê jî duwanzde îmamiya Şîe ye(Şirih Ehwal yd. 1354, 61).

Lê bi dîtina Dr. Marûf Xeznedar ku ji zimanê *Akopovim* werdigire, Baba Tahir girêdayî baweriya '*Yarsan Ehlî Heqe*.' Di vê derbarê de wiha dibêje: 'Baba Tahir di nava baweriya Yarsanî de pile û payeyek bilind hebû. Hinek ji du beytên wî ji bo pîroziya destnivîsîna pirtûka Ayîna Yarsan (Serencam) hatine tomarkirin. 'Mînorıskî' sêzde dû beytiya Baba Tahir

di pirtûka Serencam de hatine dîtine. Hevalên wî yê ji Yarsanên Ehlî Heq sih û yek (31) dû beytên din jêre şandine' (Xeznedar: 2010, r. 209).

### 1.6. Îrfan û Baba Tahir

Nivîskarê navdar ê Îranî Kazirûnî di derbarê îrfaniya Baba Tahir Uryan de wiha dibêje: 'Helbestên îrfanetî heta cihê ku dîroknasên wêjeyî nîşan didin, Baba Tahir Hemedanî û Ebû Lisîed Ebû Lixîr di wêjeya Farisî de bingehek danîne. Piştre jî 'Senayî û Etarî Nîşapurî' pêşve birine, 'Mewlana û Hafiz' jî ew yek gihandina lûtkeyê ye(Fihluyat Dramdî Bir Dubîtî Siray: 1379, r. 47).

Di vê ev yek bê gotin ku di dema Baba Tahir de dû corên Îrfanê hebûn. Ya yekemîn *Xokird* bû, ew jî weke îrfaniya Şems Tebrêzî. Ya din jî *Fêrbûn* bû û Haneqa peyrew kiriye û li ser meşiya ye.  Vî arifî ji naxud agehî û fikrên xwe wergirtiye, ne ku li xaneqa û medreseyan fêrbûye. Ji ber vê yekê Baba Tahir ligel xelkê asayî tevdigeriya û ligel wan dijiya. Baba Tahir ezmûn ji jiyanê werdigirt. Li çiyayan fêr dibû û bal dikişand. Ji ber vê sedemê jî bi berdewamî bi zimanê sade yê xelkê diaxivî û helbest dinivîsand. Di mezhebê îrfanî de serkeftî bû. Li Rojava desteyeke îrfanan nas dike û êdî ew îrfan tevlî mezhebê '*Babayî*' dîbn. '*Babaha*' desteyeke ji mezhebê sofîgeriyê ye(Zindegî Name û Şiir: 1384, r. 113-114).

Zekayî, Baba Tahir weke îrfaneke dîn (şêt) bi nav dike. Zekayî, di wê baweriyê de bû, Herçendî cûdahiyeke wisa diyar di navbera felsefeya Xiyamî û Baba Tahir de nîne, Lê hinek nivîskar Xiyame weke hekîmekê bi nav dikin ku naverok û wateyên çarêneyên taybet nirxandiye. Di heman demê de cûdahiya di awayê qalibê helbestên çarik, dûbeytî (du malikî) û naveroka wan a fikrî tên dîtin." (Baba Tahir Name: 1375, 228).

Kazrunî jî Baba Tahir weke pîreke paqij, pak û derwêşek dûrî giringiyê bide mal û serwetê cîhanê dide nasandin. Dibêje wî bi dîtinek berfireh û kûr dilê xwe daye îrfaniya rast û evîndarê perestgehê ye. Kazrunî, Baba Tahir weke helbestvanek piledar dibîne û dû beytên wî jî weke felsefeya wî bi nav dike. Pîreke mezin, xwediyê pendeke taybet û îrfanî bû. Weke helbestvanên berê xwe ti demê dema xwe bi deshilatdar û şahan ve vala derbas nekiriye. Bi derwêşiyê fêr bûye û ti demê êş û azar negihandiye giyanê (rih) xwe. Kazurnî wiha dibêje: 'Baba Tahir ew arîfê dilşewitî bû, dîtin û fikra xwe ya arîfane di warê zanist, marîfet, zikir, îbadet, serxweşî, evîndarî û heskirinê de, di navbera gotinên taybet ên îrfanî de reng vedaye. Bi awayek eşkere û diyar destê xwe ji tiştên cîhanê rakiriye, bi serbilindî di pirsgirêkên riyazet û meqamên manewî de dûr jiyan kiriye. Ev jî bûye sedem ku Baba Tahir li pişt xwe

tiştek wisa diyar di derbarê jiyana wî de neyê bidest xistin. Bi wê rewşê jî tenê navê wî di çend pirtûkên sofîgeriyê de hatiye'(Fihluyat Dramdî Bir Dubîtî Sirayî: 1379, r. 56).

Baba Tahir di serdema navdariya îrfan û sofîgeriyê de jiyan kiriye. Wê demê dildariya beramberî Xwedê li holê bû. Ev core îrfanane derbasî zimanê Îranê bibû. Em dikarin di nava du beytên Baba Tahir de hest bi dildariya wî ya nazik bikin. Lê ligel sirûda helîna di nava xwe de, tevî vê yekê jî Baba Tahir evîndariya ji bo Xwedê hebû. Bila hinek wêne jî bêhna evîna ji bo mirovan jê bê. Her ji ber vê yekê jî du beytên Baba Tahir di nava xelkê de cihekê wan ê taybet hebû, ji ber dengvedana dil û derûna wan bû(Xeznedar: 2010, r. 215).

Meşrebê (Mezheb) îrfanê yê Baba Tahir ku bi awayekê ji taybetmendiyên jiyana wî bû. Ti guman li ser nîne vê yekê di helbestên wî de jî reng vedaye û bandora xwe li ser hiştiye. Baba Tahir rewşa cor bi cor bi awayek berifreh û bi taybet behs kiriye. Danûstendinên Baba Tahir bi baldariya li ser sadeyiya xwe tejî gotinên îrfaniye. Di vî warî de mînaka herî baş a fikra sofiyanî û arîfanî ye. Helbestên wî beşek in ji helbestên herî navdar ên zimanê Farisî. Di rastiya xwe de du beytên Baba Tahir ji ber kevinbûn û wateya wan a bilind ya îrfanî, bala wêjevanan rakêşaye. Di vî warî de weke berhema herî kevin a wêjeyî ya piştî hatina ola Îslamê tê binavkirin.

Bi awayekî giştî divê bê gotin ku Baba Tahir Uryan di derbarê yekitîbûnê û piştre li ser rê rastî 'Şewq û Wicid û Qelq û Edem' tê. Baba Tahir di her tiştekê de ciwanmerdiya Xwedê dibîne. Helbestên xwe bi awayê xezel werdigire û rengvedana di nava dilê hemû ciwaniyekê de ye. Vêca bila ligel helbestvan ti cûdahiyek di navbera keç û gûlekê de nebe. Ji ber ku herdu jî wêneyên kirdar in. Lê yê ji keçekê hez bike, timî ew keç ligel wî keç e. Lê yê ji gûlê hez bike, keç jî ligel dibe gûl jî. Bi vê yekê jî kirdgar (kirdegar), keç û gûl yekitîbûnê çêdikin(Xeznedar: 2010, r. 215-216).

### 1.7. Nasnavên Baba Tahirê Uryan

Di derbarê nasnavên weke *Uryan* û *Baba* yên ji bo Baba Tahirê Uryan hatine bikaranîn, nêxzîkbûnên cûda hene. Em dixwazin bi rêya çavkaniyên ku li ber destê me hene, wan nasnavan eşkere bikin.

Despêkê gotina *Baba* di pirtûka ferhenga 'Ennedac' de hatiye: Gotinek ji bo pîrên kamil tên bikaranîn û tê wateya 'Bav'. Wek mînak, 'Baba Efzelî Kaşî' û 'Baba Tahirê Hemedanî.' Her kesê karek mezin û balkêş kiribe, jêre 'Baba' hatiye gotin. Tirk jî jêre dibêjin, Ata. (Ferhenga

Ennecad, Zîl Wajey Baba) Herwiha di 'Burhan Qatih' de jî wiha behsa wê hatiye kirin: "Serkirde (Rêber, Lîder) û rûspiyên mezhebê Qelenderan di wê demê de weke 'Baba' dihatin binavkirin"(Burhan Qatih: 1362, r. 65).

Di derbarê gotina Baba ya di despêka navê Baba Tahir de hatiye, divê ev yek bê gotin ku ev nasnav ji bo hemû şûngir û kesên li pey Baba Tahir çûne hatiye bikaranîn. Di heman demê de ev gotin ji bo kesên pîrên kamil, têgihiştî û pêşketî hatiye bikaranîn. Lê di derbarê Baba Tahir de, "Baba naveke giştiye, zêdetir derbirînê li derwêş, qelenderiya wî heta bûna wî ya serok di nava mezhebê Sofyan de dike. Sedema vî nasnavî jî kûrbûna di nava evînek rast û şidiyiyê digire. Gotina Baba tê wateya şêx, pîr û mamosta. Ji bo ewliya û arîfan hatiye bikaranîn(Baba Tahir Name: 1375, r. 127).

Kazirunî di derbarê nasnavê 'Uryan' ê ji bo Baba Tahir hatî bikaranîn de wiha dibêje: ‘Gelek kes di wê baweriyê de bûn ku Baba Tahir zilamek pîs û ne ji çire bû, ji ber vê yekê nasnavê Uryan wergirtiye. Lê bi dîtina gelek şîrovekar û nivîskaran çîrokên li ser vê yekê vegêrane; qaşo hinek kes bi ser rûtî û pêxasî di nava bajar, kolan û cadeyan de digeriyan. Ji wan jî Baba Mihemedê Tosê ku ew jî ji wan kesan bû di serdema xwe de bala xelkê dikişand (meczub). Timî bi serê rût û pê rûtî digeriya. Nasirê Îsfehanî meczûbek din ê mirîdên Nûr Elî Şa bû û piraniya demê bi rûtî (tazî) digeriya.

Li gor vegêranan, qaşo di temenê xwe de ji bilî pantolekê ti tiştek din nekiriye ber xwe. Herwiha Şewketê Buxarî jî arifek navdar bû. Ew jî wisa diyar dike ku peste kêkî dirawî li ber bû, bi piyê rût di nava befrê de digeriya. Herwiha bi Uryan bangkirina Baba Tahir jî, veguhestina mezinahî û karên wî nîşan didin ku bala xelkê dikişan û şorîkdekan bû. Bi vê dîtinê û li gor vegêrana çîrokên di derbarê Baba Tahir de hatine behskirin; Baba Tahir jî weke arifên din tevgeriya ye. Herwiha li cade û kolanên Hemedanê bi pê xasî û rûtî geriya ye û ji ber vê yekê ev nasnav wergirtiye(Burhan Qatih: 1362, r. 65).

Lê desteyek din a nivîskaran di wê baweriyê de ne nasnavê Uryan ti peywendî bi xwe rûtkirina Baba Tahir ve nîne. Belkî ji ber wê yekê ye ku Baba Tahir ji her qeyd û bendekî madî û cîhanî dûr bû û destê xwe ji xweşiyên cîhanê rakiribû(Jiyan Name û Şî’r:1384, r. 113).

Baba Tahir derwêşek xwe fanî bû, xweşî ligel wî bê nirx bûn. Tenê dilê wî ji bo dost û xweşiya ezelî lêdida. Ji xwe mezinkirinê bêzar bû. Lewra gelek çîrok û efsaneyên di derbarê Baba Tahir de wiha dibêjin, Baba Tahir di şevên sar ên zivistanê yên Hemedanê de heta sibehê qeşaya hewzan dişkand. Ji bo bi vê rêyê bigihe pile û meqamê manewî û zanistî yê

zanista îlahî. Lê desteyek din jî derbarê Baba Tahir de wiha dibêjin; ‘Kesek bê sewad, gêj û nefêm bû’(Fihluyat Dramid Bir Dubîtî Sirayî:1379, 58).

### 1.8. Dû Beytên Baba Tahirê Uryan

Dema li her cihekê navê dû beytan bê, wê demê ligel wê, navê Baba Tahirê Uryan jî tê. Ev tê wê wateyê dû beyt girêdayî navê Baba Tahir in. Li cihê cihî ku navê helbesta netewî bê, dîsa behsa navê Baba Tahir tê kirin. Divê ev yek bê gotin ku sedema navdariya du beytan di helbesta Farisî de, Baba Tahir bû. Piraniya dû beytên helbesta Farisî girêdayî Baba Tahir in. Di rastiya xwe de despêka soz û helbesta neteweyî ya me û bi taybet piştî hatina Îslamê; bi du beytên Baba Tahir ve hatiye girêdan. Lewra "Di cîhana wêjeyê de weke cîhana xwezayî (sirûştê) û bidest xistina Kemalê Mirhun ku bi taybet bikaraniye, heta di coreyên xwezayê de derbas nebe, beşên li jêr mirovek kamil dernakeve holê. Helbestvan jî di vê bi salan hewl bidin, bi karîn û jêrekatiya cûda ji bo bi zimanê helbestê, sibeha evîndara û îrfane bigihe asta karîn û kemaliya xwe. Heta li beramber rawestin û bi lihevdana dil, vekişîna rewşên cûda û ji bo helbestvan bikarin çîrokên evîndarî û soza xwe diyar bikin. Di vê derbarê de di demek ku dîroka wêjeya her neteweyekê berî ziman hêjayî te'bîr (tabîr) û beyanê be, giyanek bihêz hat holê û nekarî xwe nîşan bide. Bi neçarî gotinan dibe ser agirê evîndarên baxan û li ser tayê dar û gulan di werza biharê de winda dÎbn. Helbestvan gotinên di nava dilê xwe de yan jî rewşên evîndariyê yên xwe di piraniya nexweşiyan de bi awayên cor bi cor vedigêrin, xwe ji eşkerekirina çîrok û manewiyê bêpar dikin. Yan jî nîşanekê datînin û zimaneke xwe yê taybet dirûst dikin. Di despêkê de dîwana helbestên wî cûdahiyek wisa diyar di naverokê de nedihatin dîtin. Li hemû cihekê evîndarek bêçare û ji hemû evîndardariyekê bêbeş radiweste û dinalîne. Di derbarê ya duyemîn de jî ew zemanê dirûst kirî, digihe pileyeke kamil û bihêz, piştre tamek nû di nav de bi cih dibe. Êdî hêdî-hêdî navdar dibe û di nava peyvên wê neteweyê de cihê xwe digire"(Baba Tahir Name:1375, r. 45-46).

Herwiha eger mirov du beytên Baba Tahir weke du beşan bigire dest û naveroka wê jê derxînin, tenê; "Nalenaleke dimîne. Nalenalek evîndar, ya pir raman û balkêş, ji hemû hevokên din baştir û zelaltir e. Di herdu beytan de bi awayekî xwe nîşan dide û quncikek ji derûnê tejî evîn û dilşewitî nîşan dide"(Baba Tahir Name: 46).

Di rastiya xwe de, du beytên Baba Tahir ji nava dil de derdikevin, tevlî agirê evînek rast dÎbn û aramiyê dide xwendekaran. Bi wateyek din jî du beytên Baba Tahir çavkaniya xwe ji derûn û rihê kesên dû rû û ne aram digire. Lewra bi vî awayî li cîhanê navdar bûye.

Bi dîtina nivîskarê navdar Daniş Pêşwe; 'Tişta ku Baba Tahir di wan qaliban de nîşan dayî, ew yeke ku hunera helbestê danîna du beytên wî çavkaniya xwe ji du taybetmendiyan werdigire. Baba Tahir di warê awa (şêwaz) de vegeriyaye jora hemû helbestvanên wêjeya Farisî. Ji ber ku helbestên wî taybetin bi her kesek hestek di derûna wî de hebe û bi awayê du beytan hatiye ser zimanê kesên pêwîstî bi wane (ders) û dibistanan hebe.'

Bi dîtina Hemganî jî hebûna helbestên du beytî di nava xelkê Îranê de, di zaraveyên cûrbicûr de û di nava helbestan de taybetmendiyên Baba Tahir diyar in. Heta hinek caran navê bajar û daxwazên wan di helbestên wî de hatiye bikaranîn. Ev jî belgeya wê yekê ye ku hemû her kesê du beytên wî xwendibe. Wek mînak; di gelek cihan de navê 'Kêwî Lar' û 'Şarî Quçan' hatine bikaranîn. (Baba Tahir Îrfanî Kinnedey Dubeytî Hay Aşqaney Mihelî: 1379, r. 233-234).

*Be kiwe lar çupanî kinim min*
*Ke dilbir eye mihmanî kinim min*
*Bigîrim qaçî ez sirdar qoçan*
*Be pîş paş qirbanî kinim min* (Baba Tahir Îrfanî Kinnedey: 1379, 234)

Dema mirov temaşeyî naveroka herdu beytên Baba Tahir dike, ji bo mirov derdikeve holê ku helbestên Baba Tahir ne taybet girêdayî grûp an jî neteweyekê ne. Belkî naveroka du beytên wî cor bi cor in. Heta naveroka helbestên wî yên heskirinê jî weke xezelên Hafis û Seedî cor bi cor in. Di hemûyan de behsa evîndariyê tê kirin.

*Mira nesir saman efrîdind*
*Pirîşanim pirîşanim efrîdind*
*Pirîşan xatrat riftid dir xak*
*Mira ez xak eşan efrîdind* (Dîwana Baba Tahir: 42)

Hunera du beytên Baba Tahir di wê yekê de ye di nava helbestvanên Faris de ji hemûyan serkeftîtir bû. Du mijara bingehdanîna du beytan de jî, di rastiya xwe de ti helbestvanek bi endazeya Baba Tahir bi hûrî bala xwe nekişandiye ser bingehê du beytan. Ango li gor Baba Tahir du beytî, ne tenê helbestên mezin bûn, belkî du beytî helbesteke bi milyonan kesên bi Farisî daxivin di dema sed salan de gotine. Du beytî ne qalibek taybet bi navçe yan jî serdemek diyarkiriye, heta di helbestên eruzî de giringî û bihayên zêdetir jî hebûn. Di helbestên bi vî awayî de, yanî du beytî di navbera zêdetirî 1500 salan de; Baba Tahir bê hempa bû. Lê; 'Taybetmendiya duyemîn a helbestên Baba Tahir, eşkereye ku

helbestên du beytî di tama helbestvanan de ye. Bi awayek giştî behsa sembolên dil dike. Naveroka wan behsa dil, dilber û dildariyê dikin. Heta du beytên Baba Tahir jî her bi vî awayî bûn, tevî ku ev mijar ji du beytên Baba Tahir kêmtir hest pê hatiye kirin. Ji ber ku di helbestên Baba Tahir de zêdetir beşên îrfanî zêdetir xwe nîşan didin. Her bi vî awayî mirov dikare bêje, Baba Tahir berî Mewlana û Seedî naveroka îrfanî tevlî xezelê kiriye. Dû beytî bi îrfanê xemilandiye. Di demek ku em dizanin tevlîkirina îrfan ligel du beytî karek dijwar û ne hêsan e. Gelek sedemên wê jî hene. Ji ber xezel corê helbestê yê herî zanistî û klasîk e. Di rastiya xwe de têgihiştina ji xezelê, hem pêwîstî bi zanabûnê û hem jî pêwîstî bi selîqeya helbestê heye. Ji ber du beytî helbestek sade ye û girêdayî xelkê ye. Bi taybet jî kesên nikarin binivîsin û bixwînin. Ger bi vî awayî be; qalibek wisa sade tevlîkirin, beşek ku pêwîstî bi zanist û marîfetê heye ne karek hêsan e. Lê Baba Tahir li ser vê astengiyê serkeftiye. Di qalibên gelek biçûk û kurt ên weke du beytiyê de ku qalibek taybet bi evîn û heskirina xwezayê ye, di du beytan de hem gotina di dilê evîndaran de û hem jî ya di dilê arifan de gotiye. Li aliyekê gotinên vê cîhanê gotiye û li aliyê din jî gotinên cîhana din. Di rastiya xwe de Baba Tahir di du beytan de karek kiriye ku Hafiz piştî sê sedsalan karî di xezelên xwe de encam bide. Bi wateyek ku li aliyekê behsa evîna cîhanê kiriye, li aliyê din jî behsa evîna îrfanî kiriye û ligel gelek beşên din'(Baba Tahir Îrfan Kinnidî:1379, r. 235-236.)

Em digihin wê encamê ku Baba Tahir arifek temam û kamil bû. Lê naveroka du beytên wî bi naveroka îrfanî ve hatiye girêdan. Du beytên wî ji çarçoveya xwe dûr nexistiye, belkî îrfan pê ve girêdaye. Bi awayek giştî kemaliya îrfaniyê di nava du beytên xwe de nîşan daye. Hemû cih weke mala evîndarî û menzîleya evîndariya rast dibîne. Herwekû wiha dibêje:

*Xoşa enan ke pa ez sir nidunin*
*Mîşan şîele, xişk û tir nizunin*
*Kinşit û keebe û bextane û dîr*
*Sizayî xalî ez dilbir nizunin* (Dîwana Baba Tahir: 38)

Mutemin gotinên Baba Tahir du gotinên du beytên wî cihê baldayînê dÎbne. Taybetmendiniyên wî di sadeyî û rastbêjiyê de dibîne û wiha dibêje: "*Tevî ku du beytên Baba Tahir biçûk û kêm tên ber çav, lê di lûtkeya hest û sozdariyê de, herwiha di sazkirina rewş û pêşvebirina îştiyaqde serkeftî bû û tiştên balkêş encam dida. Helbestên dilrevîn û awazên tejî heskirin bingeh digirtin. Di zimanê dilek tejî evîndarî, di dilekî di xwezaya xwe de weke agir, xewnek nexweş û riheke bi hesret bingeh dadirêje. Herwiha dibêje, herdu beytên biçûk û kurt, hemû jî behsa evîndariyê dikin ku ji yarê (evîndarê) cûda bûne. Vê yekê jî sebir û taqeta wî jê*

*wergirtiye. Wisa derdikeve ku çend roje jê cûda bûye, bêhna evînekê lê peyda bûye û giyanê wî bi avek nefam şewitiye*"(Tîh'ul Şî'r'il-Farisî:1352, r. 102).

Baba Tahir di naveroka du beytên xwe de tenê behsa hest û bendên derûna (pîskolojî) xwe ligel xurûş (heyecan) û evîna derûniyê kiriye. Bêyî ciwankarî û pîşesaziyê, bal nekişandiye ser tiştekê û gotinên derûna xwe kiriye. Bi dahênanên (îcat) hunerî xirab nekiriye. Her bi vî awayî helbestên Baba Tahir sade, dûrî keresteyên eruz û hunera wêjeyî ne. Her vê yekê jî wisa kiriye ku helbestên Baba Tahir cihê xwe di nava dil û derûna xelkê de bikin û bÎbn cihê keyfxweşiya wan'(Tîh'ul Şî'r'il Farisî:1352, r. 103) Bi kurtî tişta helbestên Baba Tahir gihandî asta tam û dilnizimiyê, ew e ku Baba Tahir ti kevneşopiyek ji bo xwe nedaniye û dilê wî bi çi xweş be, gotiye. Xwe ji qeyd û bendên awaz û lêkdanan dûr xistiye.

Du beytên Baba Tahir di warê awayê ziman de, zimanê helbestên Baba Tahir hêsan û sade bûn. Ji ber ku bi zimanê asayî û zimanê rojane yê xelkê dinivîsand. Ew jî tejî hêmayên heskirin û evîndariyê bûn. Zimanê Baba Tahir zimanekî derdê xelkê wê serdemê bû. Her wê sadeyiya ziman wisa kiriye ku Baba Tahir neçar bibe û sinorê xwezayê derbas neke. Ji bo vê armancê jî sûd ji xwezaya çiyayê Elwend wergirtiye, dahênan û huner ava kiriye û bandora gotinên wî her ji ber vê xwezayê bûn. Gotin û axaftinên Baba Tahir weke xwezayê eşkere û rewan bûn. Bi awayekê behsa xweza û derdorê kiriye ku her kes wiha têdegihe ku ev helbest ji bo wî hatiye nivîsandin(Baba Tahir Name:1375, r. 47).

Naveroka fikir û helbestên Baba Tahir peywendiyek xort bi çiya, deşt û sehrayan ve heye. Baba Tahir bi endazeyekê tevlî xwezayê bûye, mirov dikare bêje darek di xwîna wî de çêbûye. Lewra xwendekaran bi wî awayî rast bi xwezayê dide nasandin. Lewra gotinên Baba Tahir, berî hezaran salî cihê xwe di nava dilê mirovan de girtiye. Ji ber vê yekê gelek helbestvanên Lur û Kurd bi awayê Baba Tahir dinivîsin. Bi awayek ku hinek helbestvan helbestên xwe ligel du beytên Baba Tahir tevlîhev dikin. Bi dîtina nivîskaran ev yek jî bi bandora Baba Tahir a li ser wan nivîskaran derdikeve(Baba Tahir Name:1375, r. 47).

Zimanê du beytên Baba Tahir bi zaraveyê Pehlewî bû. Bê gûman sedemê heskirina Baba Tahir a di nava Îranê de vedigere ji bo wê yekê ku bi wî zimanî helbest nivîsandiye. Bi zimanekî sade û her kes jê fêm bike, helbest nivîsandiye û dilê Îranê dermankiriye. Baba Tahir zimanên xwecihî yên Îranî tevlî giyanê îrfan kiriye, nekû helbestvanên din. Piştre wan helbestvanan ji bo bihêzkirina mijarên xwe helbestên Baba Tahir hilbijartine û sûd jê wergirtine. Lewra asayiye bê gotin ku ger Baba Tahir tiştek negotibe, ew yek gotiye ku

ahenga zimanê herêmî û sadeyî gotiye. Herwiha kariye xizmeta tevahiya xekê bike, libasek (cilek) paqij bike ber helbestan. Lê ev nayê wê wateyê ku helbestên Baba Tahir dûrî felsefe û gotinên felsefî(Baba Tahir Name:1375, r. 49).

Naveroka du beytên Baba Tahir wê rastiyê derdixin holê tevayî çîrok û efsaneyên ji aliyê Baba Tahir ve hatine nivîsandin, hemû jî tiştên pûç û bêbingeh in ku li ser vî arifî, dil şewitî û yê bi agehdar nivîsandine. Bi belgeya ku Baba Tahir wiha dibêje:

*Şib tarîqk û singistan û mu mist*
*Qedif ez desit mu îftad û nişkist*
*Nige darinde eş nîku nige daşt*
*Û girine sed qedih niftade bişkist* (Dîwana Baba Tahir: 33)

Eşkereye di naveroka du beytên Baba Tahir de di rewş û hewayek taybet de ne û di rêzalîrikên herîbaş de ne. Jiber ku sadeyî û eşkereyiya fezayek deshilatdar li ser helbestan hebû. Lewra balax wen dekaran rakêşaye û bandor li wan kiriye. Bi awayek ku di awazê helbestên wî de cihêxwe di dilêxelkê de girtiye, birîna evîndar û ne aramiya wan dermankiriye. Herwihakîn û nefreta di dilê wan de rakiriye.

Her ev jî bûye sedemk u giraniya du bey tên wî ciwan û eşkere derbikevin. Di rastiyaxwe de redîfên helbestên wî bi giştî ‘BehrîHizic Misidis Mehfuz’ bûn.

Bi kurdî Baba Tahir, serdestê helbestvanê Kurd ên li Hemedanêbû. Du beytênwî di dîro kawê je yaklasîk a Kurdî de bi rûpelên zêrîn cihêxwe girtiye. Baba Tahir bi Kurdîji yankiriye, bi Kurdî fikiriye û baweri yawî bi ayînaYarsandihat. Helbestênwî bi ZimanêKurdî û Lahûtî hatine nivîsandin. Sirûdên Baba Tahir bi ziman û awayêzimanêKurdîbûn, lê di warênaverokê de derbirîn li hemûmirovatî, qalibêsofîzmî û kozmosiyêdikir(Xeznedar:2010, r. 248)

ElaedînSecadîjî di derbarêKurdbûna Baba Tahir de wihadibêje: Baba Tahir helbestvanek Kurd bû û jimalbata Kurd bû.” Mîna kavê yekê jî weke belge tine;

*Dilî dîrim zi îşqitgîç û wîçe*
*Mijeber hem zenemxunaber rice*
*Dilîaşiqbesanîçobterribî*
*Serêsoce, sere xonaber rice* (Secadî: 1979, 172).

# 2. NASANDINA (PÊNASEYA) ÎRFAN Û SOFÎGERIYÊ

## 2.1. Pênaseya Sofîgeriyê:

Di nasandina sofîgeriyê de pêwîstiya me bi şarezayên baş û piralî heye. Ji bo heta astekê nasandinek baş û guncaw (destdayî) di derbarê sofîgeriyê de bê holê. Ev jî vedigere ji bo wê yekê ku reftar û tevgerên sofiyan ji serdemekê bo serdemek din di nava guhertinan re derbas bûne. Herwekî çawa ji navçeyekê ji bo navçeyek din ji hev cûda bû. Heta di nava mezheb û terîqetan de jî cûdahî hebû. Mînak; kevneşopî û tevgerên sofiyên Xoresanê ligel sofiyên Misir û Şamê ji hev cûda bûn. Herwekî çawa helwest û tevgerên sofiyên Iraqê ligel sofiyên Medîneyê ji hev cûda bû. Lewra mirov di nasandina sofîgeriyê de rastî gelek pirsgirêk û aloziyên zêde dibe. Em nikarin li gor hinek reftar, kevneşopî û çanda cihmayî ya sofiyan pênaseyên cihê baweriyê bikin. Mirov dikare vê yekê bêje ku sofîgeran li gor guhertina dem û qonaxên cûda, di bin guhertinên Budî, Rahîbên Mesîhî û felsefeya Yûnanî de guhertin di wan de jî hatine kirin. Despêka dirûstbûnê bi merasîmekê dest pê kir û di dawiyê de jî bi merasîmekê pêşket û dihat çespandin.

Despêkê ji wan kesan re dihat gotin sofîgerî yên xwe diparastin û ji Xwedê ditirsiyan. Hemû nasandin û pênaseyên ji bo sofîgeriyê hatine, di wê baweriyê de ne despêkê sofîgerî bi miamele û micahideyê bû. Piştre jî ji wan kesan re dihat gotin ên li bihiştê û ne jî li dozexê (cehenem) Xweda diparastin. Bi kurtî sofîgeriyê ji xweperestiyê dest pê kir û piştre jî ber yekitîbûnê (Wehdit Wicud) ve pêngav avêt(Xenî:1383, r. 179). Zaraveyê sofîgerî despêkê di sedsala duyemîn a koçî de hizra Îslamî peyda bû û ji despêkê ve peyva zuhdî li beramber dihat bikaranîn(El-hemranî:2000, r. 15)

Sofîgerî rêya despêkê ya Xwedaperestiyê ye. Piştre bi sema û govendek xemilandî, di encamê de li ser bingehê evîndarî û cizbe ber bi yekîtîbûnê ve diçe. Di berdewamiya dîrokê de neçûye nava çarçoveya sade de. Ji ber vê yekê her kesek li gor hizir û fikra xwe rê û cihê xwe eşkere dike. Lewra gelek pênase û cûdahî li ser sofîgeriyê anîne.

Sofîgerî, dawiya sedsala duyemîn a koçî serî hildaye. Di sedsala sêyemîn de ber bi pêgehiştinê ve pêngav avêtiye(Himayş:1366, r. 81-82). Em nikarin pênaseyek kurt û sade ji bo sofîgeriyê bînin ziman. Ji ber ku li ti dem û cihekê de wek xwediyê porê taybet û sinordar nehatiye diyarkirin. Belkî di her kêliyekê de hatiye guhertin en jî sofîgerî bi xwe, xwe guherandiye.

Sofîgerî di warê gotinê de bi wateya; ‘liberxwekirina hiriyê’ hatiye bikaranîn. Sof tê wateya hirî û corekî hiriyê. Di warê biwêjê de jî tê wateya xwepaqijkirina ji daxwazên nefs û tiştên dunyewî. Ji ber vê yekê gotine parzinandina dil ji xirabiyan û dûrketina ji daxwazên bandoriyên nefse. Herwiha gotine (Sifa û Miamele) ligel Xwedayê mezin bingeheke ji yên xwe dûrketina ji dunyayê(Seîdî:1383, r. 167) Helebî, ji ber vê zêdeyî û berfirehiya wateya Sofîgeriyê wiha gotiğe ku bi hezaran pênaseyên sofîgeriyê hene. Ji ber ku li gor her sofîyekê pênaseyek taybet heye. Li aliyekî din jî sofîgerî ne rêyek an jî awayekî diyarkirî û tekane ye. Sofîgerî evînî û xweza ye ku em dikarin bibêjin evîndariya ti kesekê ne weke ya kesek din e(Helebî:1376, r. 25).

Zaraveyê sofî ji peyva *'el-Sefe'* hatiye ku culayek bû li bajarê Medîne taybet bi mizgefta Pêximber (s.a.s) bû. Gelek kesên hejar û bênewa di nav de dijiyan û yektaperestî dikirin. Hinek ji wan timî li wê derê bûn, weke Ebû Zerê Xefarî, Mûsa Eşerî û Selmanê Faris, hinek caran jî rûniştina Sefa digihişt 13 kesan(El-hemranî:2000, r. 15).

Reftarên sofiyan ji du arezayan pêkhatine. Mirov ji dû cîhanan pêktê. Cîhana gewdeyî û cîhana giyan. Ev gewde li tevayî cîhanê tejî ne, lê giyan li ser vê cîhanê nîne. Bi ti awayî ne girêdayî vê cîhanê ye û li vê cîhana maddeyî ya biyanî. Rêya sofîgeriyê bi asteng (Riyazet) e û têkşikandina bi vî gewdeyiye. Vekirina şîşên qefesa vê cîhana gewdeyî, heta giyan reha bibe û ber biçe(Xelîfe:1975, r. 22).

Reftar û encamên sofiyan ji dû aliyan ve hatine afirandin. Mirov ji du cîhanan pêktê. Cîhana gewdeyî û cîhana girî. Ev gewde girêdayî vê cîhanê niha, lê ruh ne girêdayî vê cîhanê ye. Bi ti awayî peywendî bi vê cîhanê ve nîne. Rêya sofîgeriyê bi hewl û ziyaret e. Dawî li vî gewdeyî tîne. Vekirina van astengiyan û heta rih azad dibe û heta ber bi asîman ve diçe berdewam dike(Xelîf:1975, r. 22).

Nîkilson di derbarê pênaseya sofîgeriyê de wiha dibêje: "*Di zimanê Farisî û Erebî de nasandinek zêde û berfireh li ser sofîgeriyê hatiye kirin. Lê piştî vê yekê jî divê bê gotin ku nasandin an jî pênaseya sofîgeriyê nîne. Her weke guman lêkirinek çawaniya fêlekê (hîle) di şeveke tarî de, mesnewî manewî bergê sêyemîn têne holê. Bi wateya ku sofîgerî diyardeyek (fenomenek) derûniye, di mijara hestê takekesiyê (ferdî) de ye û her kes li gor hest û derûna xwe di derbarê wê de tiştekê dibêje. Hemû jî nikarin pênaseyek sade ku ji hemûyan baştir be, di derbarê sofîgeriyê de bixin ber çavan*”(Mehmûd: 2017, r. 3).

Pêvistiya me pê heye ku çend pênaseyên cûda di derbarê sofîgeriyê de bênin ziman û ji bo hê zêdetir pênaseya wê bê fêm kirin. Sofîgerî di eynî wextî de tê wateya 'Giraniya te'mê (Riyazet), derûn û hewlane, bi armanca vegêrana xwezaya mirov ji rewşên nebaş û guhertina wan ber alî û kiryarên ciwan ve tavêje. Herwiha xweparastina ji guneh û tawanan, ji bo derûna mirovan li cîhanê bilind bibe û li cîhana din jî xelatên baş bidest dixe'(Îbn Cuzî:1381, r. 136). Sofîgerî di vî warî de, weke eniyeke giyanî (ruhî) li ber çav bê girtin yan jî di dil û hinavê hemû dînan de derbas bibe bi vî awayî ye(Şîmîl:1377, r. 36)

Lê em nikarin bingehên diyar ên sofîgeriyê tenê li ser ramana olî dabeş bikin. Ji bo vê armancê mirov dikare felsefeya nû ya Eflaton a ku wêneyek berçav, bandorek diyar û ne bingehekî ayîniye û tevî vê yekê jî bandor li ser sofîgeriya Îslamî hebû. Zuhd û 'Uzlet ji despêkê ve bingehên sofîgeriyê bûn. Despêkê sofîgerî bi Zuhdê derket, lê ti hebûna 'Uzlet nebû. Ev teorî heta demekê domand, hê jî ligel mijara fikrê wan têkel nebibû û her di çarçoveya dîtina Îslamiyetê de mabû. Lewra Senayî, riyazet herî serekî yê pêngav avêtina ber mezheb ve datîne. Bi dîtina wî rêya vale û çol li Riyazet, ti demekê nagihe armancê(Zirqanî:1378, r. 160).

Gelek ayet di derbarê Riyazet û 'Uzletê de hene û ji zimanê arîfan hatine wergirtin. Bi dîtina Luwîs Masonî, ev ayet piştî serhildana sofîgeriyê derketine holê û li ser exlaqê Pêxemberan bûn. Cihê şik û gumanê ne. Ji ber vê sedemê jî nikare ti tiştekê di derbarê jiyana Pêxemberan de behs bike(Xenî:1383, r. 28).

Zuhd (Xweparastina ji gunehan), xweparastina despêkê ye û di ola Îslamê de gelek ayet li ser hene û di bingehê xwe de xweparêzî dihat pejirandin. Ji ber ku ne girêdayî hejarê Îsa, ne rebenî, ne Cihutî û ne jî Hindû bû. Guman heye ku li ser bingehê sadeyî, exlaq û derdora jiyana pêxember diziviriya.

Îzaledîn Mehmûd Kaşanî di pirtûka 'Misabah'ul-Hidaye'ê de û di beşa şeşemîn de wiha dibêje: "*Ti guman tê de nîne, ketina xelwetê (Dema kesek ji bo demek dirêj xwe ji civakê dûr dixe û bi tenê dimîne) bi awayek giştî di nava sofîgeriyê de belav bibû. Her wekî Sihabet di rojên Pêximber de ne kevneşopî bû, ji ber vê yekê Sihabet bi tiştên din ve girêdan*"(Kaşanî:1385, r. 115).

Pêxember (s.a.s) eshabî ji '*Istixraq*', '*Riyazet*' û ji rebeniyên Mesîhî agahdar kiriye û nehî li wan kiriye. Ji bo vê armancê jî gelek mînakên weke, Ebdullah Bin 'Omer û Bin As di rojiya berdewam û Osman Bin Muzefer *'Tecird'* agahdar kiriye û daxwaz ji wan kiriye ji wan

re gotiye kudest ji vî karî berdin(Zerîn Kub:1387, r. 44-45). Her di vê derbarê de Hucuyrî di pirtûka *'Keşif'ul-Mehcûb*' de wiha dibêje: "*Pêximber gotiye, rojiyên herî baş rojiyên birayê min Dawid in. Gotin pêxember ev rojî çawa ye? Got; rojekê rojî digirt û rojekê nedigirt, heta bikare li ser nefsa xwe bibe hakim*"(Hoceyrî:1386, r. 71).

Ew heskirina ji bo xwe parastinê hebû, di serdema Benî Emyed de ji ber ku ber ber bi taybetmendiyên xwe, zêr û zember perestî û guhertina xelîfeyê ji bo seltenet û bê agehiya ji bingehên ola Îslamê bû sedemê serhildana xweparêziyê. Bi wateyek din jî tevgerên li dijî kiryarek beramberrî zêdegaviya deshilatdarên Benî Umeyde bûn(Zerîn Kub:1387, r. 45).

Vegêranên di derbarê Eshabê Sofeyê de hatine vegotin, ji ber ku di nav de zêdegavî hene, ji rastiya xwe derketine. Ber bi tirs û toqandinê ve çûne. Gelek mînak li ser vê mijarê hene. Her yek bi awayekê ve behsê vedigêrin û bi lêv dikin. 40 kesan libeke xurmeyê mijîne û birsî nebûne. Yan jî xwe di bin xîz û berên sehrayê de veşartine, ji ber cil û bergên wan nebûn. Ev çîrokane ligel rastiya dîrokê hev nagirin(Zerîn Kub:1387, r. 46).

Mirov dikare mînaka Mihacirîn jî bîne holê. Dema ji Mekke ber bi Medîne ve koç dikin vê hingê rûniştvanên bajêr (Ensar) bi germî Misilmanan pêşwazî dikin. Xanî, mal û kelûpel (tişt) dane mêvanên xwe yên nû. Herwiha xwarin û karkirin jêre hat peydakirin. Lê hêjmarek kêm jî cihê wan nebû û di mizgeftan de jiyan. Lê ew jî hêdî-hêdî xwe ligel rewşê guncandin, dest bi kar û pîşeyên xwe kirin. Piştre tevlî şeran bûn. Piştre jî ji ber bidestxistina bermayên şer, ji bê serwetî û hejariyê rizgar bûn û vegeriyan nava civakê. Tevgera kesên di nava mizgeftan de jiyane ne xelwetgerî bû. Ne jî hejariye ku wan bi xwe hilbijartine û ji bo bi wê rêyê xwe bigihînin Xwedê. Belkî tenê ji ber rewş û derfetên Misilmanan ên wê demê bûn. Hejar bibûn, ji ber mal û milkên xwe bi cî hiştibûn, ji Mekke ber bi Medîneyê ve koç kiribûn; ew jî ji bo parastina dînê Xwedê û yê Hz. Muhemmed (s.a.s) bû û ne ti tiştek din.

Qur'an'a Pîroz û jiyana eshabiyan. we parastin bi wan ve diyar dibû. Nikarin di bin bandora Xiristiyanî de bimana weke du ayînan berî Îslamê belav bikin. Nivîskarê navdar Yan Ripka wiha dibêje, nîva yekem a sedsala duyemîna koçî/heştama zayînî; Xoresan cihê serhildan û şoreşa dijî Emewiyan bû. Di heman demê de li Sûriye perwerdeya dêran û taximên cor bi cor ên Xiristiyanan, timî rengekî îrfanî û sofîgerî bi wan ve diyar bû. Di heman demê de Asyaya Navîn bibû navenda Budîxwaz an û di despêka tevgerkirin û pêşve birinê de bû. Li Xoresanê jî hê bi kêmî dibistanên ayîna Îranê yên ji corê agirperestî û Manîxwazî li holê hebûm. Hikûmeta Hindî li aliyê Rojhilat û Xiristiyan jî li aliyê Rojava pêş diket, berfireh

dibû û gihiştibûn Xoresanê. Ev derfet ji aliyê xweparastinan ve dihat pejirandin. Lê çend aliyên din derxistin û dibistanên sofîgerî yên Îranî pê hatin avakirin(Yan Rîpka:1383, r. 215).

Ew xelwetkirin, perestin û xweperestiya zêde, bingehek bi tîpên zêrîn ji bo çandina tovê sofîgeriyê amade kir. Bandora wê civakê li ser bingehê tirs, xweparastina zêde û îbadetê hatibû danîn. Piştre jî, ‘ber bi mijarên evîndar, Pîrê rizgarî û îrfaniyê ve pêngav avêt. Ev bandor jî ji ber hevsinoriya cîhana Îslamî ligel Îran û Romê bû. Bîr û ramanên hemû zahîdan jî ji ber hêvênê peywendiyên wan ên ligel ol û baweriya derveyî sînorê Îslamê mabû. Vê yekê jî rêyek zêdetir ji Zahîdan xweş kir. Zahîdan despêkê wêneyê xweparastina (zuhd) Hindî û Xiristiyanî dest bi geranê kirin. Dest ji cîhanê berdan û hewla xortkirina nefsê dan. Di encamê de jî ev yek bû (Curbe), jiyana tevlî hest, tevî azadiya derûn û exlaq perestin, ji bo gihiştina ji bo Xwedê bû; di encamê de bi awayê yekîtîbûnê xwe nîşan da’(Gulpînarî:1380, r. 232-233).

‘Omer Şêx Nûredîn Mûftî jî di pirtûka ‘Rastiya Tesawûf’ê de wiha dibêje: ‘Sofî ji wî kesî re tê gotin ê ku tenê li ser rêbaza Hz. Pêximber (s.a.s) bimeşe û tevgerên wî li ser suneta Pêxember (s.a.s) be”(Nuredîn:2012, r. 27).

Mijara anîna xweparastinê (Zuhd) di nava Ereban de dîroka wê vedigere berî hatina Îslamiyetê. Di vê navberê de jî mirov dikare mînaka Helbestên ‘Udeyê Kurê Ziyad weke mînak bîne û di dema Sasaniyan de li Îranê jiyan kiriye. Hem bandora Îranê û hem jî bandora Xiristiyaniyê li ser wî hebû(Kedkenî:1385, r. 48). Li gor hinek çavkaniyan, dîroka xelwetgerî û xweparastinê vedigere serdema Diyoxcanûsî Kelbî ku di Yûnana kevin û serdema Îskenderê Makedonî de jiyaye(Nejad:1383, r. 175).

Lê îlahiyatnasê navdar ê Amerîkî Can Bî Nas di pirtûka 'Dîroka Pextî ya Olan' de wiha dibêje: "Tevî ku sofîgerî di sedsala 8'mîn a zayînî de serî hildaye û nasnavê xwe bi corê pûş danîne; lê navê wan weke xweperestiya Îslamî derketine. Xweparêz û xweperestina Xiristiyan bi cilûbergên hiriyê ve li cîhanê digeriyan û ji xwe re digeriyan. Bi yasa û destûra Incîlê dabûn destê daxwaz, mûqederat û Xweda, fikra siberoja xwe nedikirin. Ji ber ku Îsa em fêrkirin ku fikra sibe nekin, ji ber ku sibe fikra xwe dike û îro ji bo me bes e. Ev heman fikir û ramane ji Çîn Oîstî û ji Hindên Mihawîreyan wergirtine. Xwe ji xweşiyên cîhanê dûr dixin, xwe bi birsîtî û hejarî dihêlin. Di wê baweriyê de bûn ev daxwaza Xweda ye û bi vê yekê xwe dane ber destê qedera Xweda(Tedeyun:1375, r. 346) Can Bî Nas, di wê baweriyê de bû sofîgeriya Îslamî di ‘Hiriya xwe pê dipoşin, xaneqa, tecrid û tefriq; çav li rahîbên dêran

dikirin û di bin bandora wan de bûn. Heta sema û mûzîka xaneqayan (dîwan) jî di bin bandora wan de bû'(Tedeyun:1375, r. 347).

Mihemed Wesman di pirtûka 'Felsefeya Sofîgeriyê' de dîtina Marûfê Kerxî weke pênaseya herî kevin têne ku ji bo sofîgeriyê hatibe gotin. Marûfê Kerxî wiha gotiye: "*Sofîgerî despêkirina bi rastiyan û bêhêvîbûna ji wê yekê ya di destê xelkê de ye*"(Wesman: 114, r. 2013).

Bi kurtî, di encamê de mirov dikare bêje, sofîzim dikare weke eniyeke rûhî li ber çavan bê girtin, di dil û hinavê hemû baweriyan de derbas dibe. Ji ber ku felsefeya nû ya Eflatûn hatiye wergirtin, fikra Eflatûn ya nû ji bilî rê û cihek dinî mînake berçav e û kariye guhertinek mezin di eniya fikra sofîzmê de bike. Sofîzma di ola Îslamiyetê de hebû û bi dîtina bandora di bingeh de berfirehî di wateya sofîzmê de tê ber çavan. Ji ber vê yekê bi hûrbûna li ser vê mijarê nabe mirov tenê di aliyekê de temaşeyî sofîzmê bike. Çi di warê dîtina baweriya (ol) hêsan yan jî felsefî. Lewra mirov dikare bêje; sofîzim tevlî rihê ayîn û felsefeyê bûye. Bi taybet jî felsefeya Eflatûn a Nû'(Mehmûd: 2017, r. 15).

### 2.2. Nasandina (Pênaseya) Îrfan:

Îrfan tê wateya nasînê û bingeha xwe jî ji *Tewhîd* wergirtiye. Ev tê wateya yekemîn mercê îmanê û jixwe despêka zanist ji bi wê dest pê dike. Herwiha gorî vê têgihê Xwedayê Mezin yek e, bê dost û bê heval e. Di astek din de mala zanist piştî îmanê tê bidestxistin.(Secadî: 1386, r. 266) Lewra ev bingeh di Qur'an'a Pîroz de bi çend awayan behsa wê derbas dibe. Di Qur'an'ê de yektaperestî pêdagiriyê li ser hebûna Xweda û nehîkirina ji wê yekê ku di resenetiya payeyên îmanê de şirîk hebe(Tarumî Zad:1383, r. 406).

Ango wateya îrfanê nasîn, nasandin û wergirtina zanist e. Wateya peyvê jî mirov dikare weke biwêjekê pênase bike ku gorî vê pênaseyê zanist, wergirtina li ser bingehê, rêya dil û ligel anîna mejî, di encamê de jî bi peywestbûna bi Xweda bi dawî dibe. Ev hevkêşe bi têgiha îrfanî ava dibe. Lewra mirov dikare bêje îrfan, têkilkirina dibistanên curbicur ên felsefeya cîhanê ye. Li gor dîtina hinek zanayên îrfanî, îrfan ji peyva 'Mistik' yan jî 'Ginosîm' ku tê wateya 'Seyr, ecêb û nihêniya veşartî' hatiye wergirtin. Xwediyê dîtina taybet bi xwe her bi vê yekê jî peywendiyên rasterast ligel kes û bi giştî jî bi Xwedayê xwe bi rêya keşif, şihud û ezmûnan ve tê bidest xistin(Heqîqet:1375, r. 35).

Wateya zaraveyê îrfan, bi wateya dûbare nasînê yan jî wek nasîna tiştek li berdest (lems) hatiye rawe kirin. Yan jî nasîna Xwedayê Mezin, sembola rastî û bi rêya keşif û şahidan derdikeve holê(Emîn:2009, r. 40).

Lewra eger em bixwazin bi kurtî û sadeyî behsa yektaperestiyê bikin, bi vî awayiye ku kurtiya hemû mijarên behsa yektaperestiyê dikin li ser wê yekê hemfikirin, di hebûnê de kesek heye hêjayî perestejê ye û raste. Ew jî Xweda ye. Her rojê di çavê yekê de tê dîtin ango tewhîd ji çavkaniyên despêkê yên kelamê zêdetir ku armanc jê eşkerekirina yektabûna Xweda ye û piştre jî selmandina (îspatkirina) wê hebûnê ye. "*Bi yekta naskirina Xweda li pişt hebûna Xweda ye. Bi giştî takperestî di felsefeya Îslamiyetê de di sê aliyan de lêkolîn li ser hatiye kirin. Tekaneperestiya zatî, tekaneperestiya sîfatî û tekaneperestiya kiryarî*"(Alim el-Hida'b.: 406, r. 8).

Eger em bixwazin îrfan weke felsefeya gotinê nas bikin, wê demê emê ji despêka karê xwe ve hewl ji bo tiştek neguncav û wê ti encameke wê jî neyê bikin. Lê tişta hersêyan bi hev ve girê dide ev e: Yasayek materyalî heye. Li beramberî vê jî pêwîstî bi mijarên îrfan û rastiya di nava vê cîhanê de heye. Bi dîtina îrfanan di vî warî de di nava cîhan meteryal de ji bilî Xweda ti rastiyek din nîne û tişta heyî jî di nava taybetmendiyên wî de ne. Lewra îrfan li ser vî bingehî rawestiya ne. Ew jî cîhana meteryal dike dûbeş. Yek ji wan cîhana derve û nasnameya rûmetek cûda ye û zêde ye. Ev jî bi rêya mantiq hest pê tê kirin. Ya din jî cîhana hundir e û berevajî ye. Bi rêya hest û mantiq (mejî) hest pê nayê kirin û nayê naskirin." (Edhem:2012, r. 108).

Li gor dîtina arifan, takperestî ji vê yekê pêktê. Ev jî tişta ku çav ji bilî rengekê û ji Xweda zêdetir ti tiştek din nebîne. Dil ji bilî vê yekê tiştek din nezane. Ji bilî yekbûnê, ti tiştek din nebe nava çarçoveya zanistê de. Demên ku takperestiya arifan bigihe lûtkeyê (asta herî bilind), êdî ziman lal dibe. Lê her dema yektaperestî tê holê, ziman jî tê holê(Hêrewî:1375, r. 327).

Di teksta îrfanan de ji bo eşkerkirin û derbirîna rastiyan (heq) û wateya tekaneperestiyê, çend pile hatine danîn. Ango mirov dikare bêje, arifan tekaneperestiya rast weke xwediyê pileya ji her tiştek din bilindtir dizanin. Tekaneperestiyê tenê hêjayê Xwedayê Mezin dibînin(Fena, Fatîme:1383, r. 431).

Tekaneperestî di wê pileyê de ye ku Xwedayê Mezin, bi tenê ye û kesek weke wî nîne, zanista wî di xezêneya xeybê de ye û parastiye. Ev nayê wê wateyê ku hemû zindî (mirov,

heywan û hwd..) dimirin, namênin û tenê Xweda dimîne. Belkî ji ber wê yekê ye ku Xwedayê Mezin di pileya yekemîn de ye. Ti kesek nîn e Xwedayê Mezin behreyiyê jê werbigire û hêjayî wê pileyê be(Quşeyrî:1385, r. 513). Ji bo zêdetir bê zelalkirin, Quşeyrî gotinên Ebû Seîdê Xeraz tîne û ji me re rawe dike, radixe ber çavan. Gorî vê nêzîkbûnê, pileya yekemîn a di zanista tekaneperestiyê de gihiştina hemû tiştên me ye û bi awayek giştî yekbûna wan a ligel Xweda ye(Quşeyrî:1385, r. 520).

Nivîskarê diyar ê di warê îrfaniyê de Rimbak, ceribandina îrfanan weke çavkaniya li ber çav û rewşên îrfaniyê di pantayiya cîhanê de û di dema serhildana mezhebên cûda de datîne. Weke yek bû û her ev berçavî jî bûn sedem ku ezmûnên îrfaniyan bikin belge(Êstês: 1384, r. 23), Li beramberî vê dîtinê jî Cî Êç Loya wiha dibêje: 'Ezmûna îrfaniyan bi fikir datîne'(Êstês: 1384, r. 25). Nivîskarek weke Êstês di wê baweriyê de bû. Îrfan, ji hewldana gihiştina rasterast û takekesî ya ligel Xwedê pêktê. Li gor wê yekê jî temenê ceribandinên îrfanan qasî direjiya temenê mirovayetiye û ne girêdayî çi alî û mezhebekê ne(Zerîn Kub:1387, r. 20).

### 2.2.1. Cûdahiya Sofîgerî û Îrfan:

Li gor çavkaniyên li ber dest, di derbarê cûdahiya sofîgerî û îrfaniyê de behsa wan tê kirin. Gelek dîtin û gotûbêjên cûda serde hatine kirin. Lê heta niha jî negihiştine baweriyeke giştî ku bikarin vê cûdahiyê derxînin holê. Ev dîtin tenê li ser asta fikirin û nebûna projeyên zanistî ye. Tişta heyî, tenê li ser asta kesiye û nebûye dîtinek piralî.

Tişta eşkere gelek xalên hevbeş ên sofîgerî û îrfan hene. Lê bi dîtina Tiwana Emîn, ev herdû rêbaz li ser bingehê xwe tevgeriya ne û di warê rastiyê de ji hev cûda ne. Her yek ji bo bigihe armanca xwe hewl dide. Tiwana Emîn wiha dibêje: "*Arif keseke sembola tiştekê şîrove dike, bi rêya dîtin û fikirînê Xweda keşif dike, ne bi tenê. Lê sofî keseke ligel xwe şer dike, tenê rewş û xemnak bi mekanîzma gihiştina bi nûra îlahî dizane û mezhebê tesewifê peyrew dike*" (Emîn:2009, r. 34). Lê mirov dikare wê yekê bêje ku ev herdu rêbaz di cîbicîkirina ol de weke diravê dûrû ne. Ji bo bigihin rastiyê, dest ji xweşiyên cîhanê ber didin û xwe ji bo cîhana dawiyê vediqetînin. Di vî warî de Zerînko wiha dibêje, sofî timî berê wî li kiryaran e û dijberiya nefsa xwe dike. Lê arif timî berê wî li keşfê ye, dixwaze ji vê yekê belgeyan bidest bixe(Zirîn Kub:1387, r. 58).

Wateyeke berfireh a sofîgeriyê heye. Ligel Ewrûpiyan peyva sofîgerî ji bo kesên bîrmend, hişyar û dûrî mezhebî tê bikaranîn(Şîmêl: 1377, r. 193). Lewra nabe em tenê li ser

corê sofîgeriyê şîrove bikîn.. Belkî sofîgerî weke avake zelal e û berevajî rewaletiyê rawestiya ye, lewra bi berdewamî di nava tevgerê de ye. Bi ti awayî ranaweste. ‘Hemû stêr avê vedixwin û bi berdewamî çarçoveya fikra xwe berfireh dike. Di wateyek din de jî li her cihekê tiştekê radike. Lewra ev navê lê hatî kirin, sofîgeriye. Her ji despêkê ve bi zuhd despê dike, piştre ji bo sofîgerî û îrfanê. Lewra nabe û mirov nikare fikrê sofiyetê bêne ziman. Bi awayekî mirov dikare wê yekê bêje ku ev nav ne ji aliyê sofiyan ve hatiye danîn û belkî ji aliyê kesên din ên li derdorê sofîgeriyê li wan kirine. Li aliyek din jî beşeke sofiyan bi hevsengî ligel nimêjên xwe danîne’(Xezelî:1383, r. 272-275) Ev yek jî weke cûdahiya îrfan û sofîgeriyê danîne, lê tişta eşkere armanca sofîgeriyê ne xweparastin, nimêj, rojî û heta bawerî jî bû(Yesribî: 286:1379) Belkî her carekê bi awayekê û bi rengekê xwe ligel fikrên cor bi cor guncandiye. Hêdî-hêdî meydana fikrê xwe berfireh kiriye. Lewra dema kesek bixwaze bi vê yekê îrfan û sofîgeriyê ji hev cûda bike, divê arîfên navdar ên weke; Cuneyd, Celal, Bayezîd, Rab’ey Edewî û gelekên yên din ji bîne bîra xwe û wisa tevbigere.

Belkî her carekê bi awayekê din ligel fikrên curbicur guncav dibe û meydana xwe ya fikrî hêdî-hêdî berfireh kiriye. Lewra dema kesek bixwaze bi vê yekê îrfan û sofîgeriyê ji hev cûda bike, divê Cuneyd, Helac, Bayezînd, Rab’eya Edewî û çend arifên din ên navdar ji fikra xwe derxîne. Bibe di rêza kesên hiriyê dixin ber xwe û zahîdan ku ti tiştek nû pêşkêşî cîhanê nekirine.

Em dikarin di encamê de bêjin, îrfan û sofîgerî ne hêjayî cûdakirinê ne. Tişta heyî tenê di asta gotin û zaraveyan de ji hev tên cûdakirin. Dabeşkirina sofîgeriyê jî ji bo sofîgeriya kirdarî (kiryarî) û sofîgeriya îrfanî, tenê ji bo pêdeçûna behsên fikriye. Bayezîdî Bistamî ti cûdahiyê di navbera sofîgerî û îrfanê de nekiriye. Bi ti awayî gotina arif li cihê sofî bikar neaniye. Berevajî, zuhdî ji sofîgerî û îrfan cûda kiriye. Di vê derbarê de wiha dibêje: "*Ji bo min gelek baştire xwediyê zuhd be, ji ber ku ti zanyariyan nade. Herwiha dibêje, arif bi ti tiştekê keyfxweş nabe û ji bilî gihiştina ligel dildar*"(Etar: r. 160).

Nivîskar hê zêdetir li ser vê mijarê radiweste û dibêje: "*Mirovên herî zêde tên heskirin 5 kes in. Zanayek xweperest, melayek sofî, sermayedarek xwe kêm dibîne, hejarek sipasiya Xwedê dike û derûn paqijek Sunne"*(Etar: r. 193). Tişta eşkere di vê dabeşkirinê de navê îrfan nehatiye, lewra ji bilî hevtadanîna îrfan û sofîgeriyê, ti wateyek din nîne.

Li gor çavkaniyên li ser cûdahiya îrfan û sofîgerî, mutesewwifên weke Zinûn Misrî, Bişrê Xefî û Îbrahîm Edhem wek mînakên cüda tê hesab kirin(Etar: 85-114). Wekî din gelek

nivîskarên din peyva îrfan û sofîgerî wekhev (hevwate, heman wate) bikartînin. Bi dîtina Seyîd Yehya Yesrî cûdakirina îrfan û sofîgeriyê bi giştî dijî awaz, rewşenbîrî û nehişyariyê ye. Hinek ji ber heskirina îrfanê vê cûdahiyê dikin. Herwiha ji ber zanayên olî vê yekê bilind digirin, wê cûdahiyê encam didin. Eşkereye piştî sadeya 2'mîn a koçî û piştre, îrfan û sofîgerî bi wateyekê sûd ji wan hatiye wergirtin û nikarin ji hev cûda bikin(Yesrebî:1379, r. 23).

### 2.2.2. Cûdahiya Îrfan û Ol (Dîn)

Ewanî, di derbarê cûdahiya îrfan û ol de dibêje ku îrfan, zanisteke berhemê 'wilayet, şihûd, qirb û itisal' ê ye. Her wiha dikarim bibêjim giringî jî îrfan, beşa giring a olî ye(Tedeyun:1375, r. 23). Li gor Seyîd Heyder Amolî ferqa di navbera sofîgerî î îrfanî de em dikarin bibêjin Ola Îslamê îrfanîyek sade di hundirê xwe de dihewîne. Xezelî jî îrfanê weke olê sade bi nav dike. Mewlewî jî îrfan weke kakilê ol bi nav dike. Îbn Erebî jî di vê derbarê de ol, îrfan, tevlîbûna mirov û Xweda ji hev cûda dike. Di heman demê de Îbin Erebî bi xwe kesayetiyeke paye bilind ê ola Îslamiyê, lê ol û îrfan ji hev cûda dike. Îbin Erebî bi eşkere radigihîne ku dibistana gerîn û lêgerînê 'Sîr û Silu' û Riyazet li ser bingehê wehyê ne û bi olê asîmanî bi nav dike. Di vê derbarê de di wê baweriyê de ye ku du corên ol hene. Ew jî, Olê Îlahî û Olê Mirovan in. Dînê îlahî ew e ku Xweda, Pêximber û şûngirên wan xelkê bang dikin. Olê mirovan jî ew e ku Xwedê mirov afirandiye û Xweda mora erênî lêdaye. Olê îlahî ji aliyê Xwedê ve hatiye hilbijartin û di ser ola mirovan re ye. Lê 'Riyazet' mirov afirandiye û li ser bingehê hîkmetê daniye. Lê pêximber û şûngirên wan dijberî nekirine. Ji ber ku rê û rêbazên van olane li ser bingehên destûra îlahî neçûne derve. Xwedê jî ew ol weke olê îlahî mor kiriye. Lewra xelk jî li pey wî olî diçin û dijberkirina van olane jî dibe cihê nerazîbûna Xweda(Yesribî:1379, r. 58-59).

Mirov dikare wê yekê bêje ku îrfan ne tenê girêdayî ola Îslamê ye. Ne tenê her evqas belkî ne girêdayî ti alî û mezhebekê ye û nabe tenê olek xwe weke xwediyê wê bibîne. Mirov dikare vê yekê jî bêje ku ola îrfan oleke bi xwe çêbûye. Êstêsîs jî di vê derbarê de wiha dibêje: "Awayê yasayî yê her arifekê di nava her çandekê de, xwediyê rewşeke taybet e. Di vê derbarê de van pirsan dike? Îrfan di bingehê xwe de îrfaniye? Gelo ol di bingehê xwe de îrfanîne?(Yesrebî:1379, r. 286). Li ser vê dîtinê Êy Bêrt digihe vê encamê: "*Encamên giştî yên derbarê peywendiyên îrfaniyan de li aliyekê û olê îrfaniyan ên weke; 'Xiristiyanî, Bûdî û hwd..' li aliyekî din ew e ku îrfan di vî olî de ji hev cûda û serbixwe ne. Ango dikare bêyî van olan e, hebûna xwe berdewam bike*"(Yesrebî:1379, r. 286).

Bi kurtî îrfan, ne ol e. Lûtkeya ol desteberkirina dîdara Xweda ya di roja qiyametê de ye. Arif ji bo bidestxistina wê hevdîtinê ranaweste, belkî bi kiryarên curbicur radibe û wan kiryaran jî li jora erkên olî datîne(Heqîqet:1375, r. 36).

Di dawiyê de em li ser cûdahiya ol û arîf digihin wê encamê ku eger ol û îrfan yek tişt bûna, divê hemû Misilman li tevayî cîhanê li ser wê rêbazê bûna. Ango wê hemû arifên cîhanê Misilman bûna. Bi wateyekî din jî, ne şerte îrfan ji olê cûda be, belkî peywendî bi olê ve jî nîne. Binavkirina sofîgerî û îrfanê weke hîkmet, bi xwe derbirîna cûdahiya îrfan û olê hesab dike(Yesribî:1379, r. 286).

### 2.2.3. Çavkaniyên Sofîgeriya Îslamî

Eşkereye zoriya terîqet (mezheb), dîtinên cûda û dijber ên di derbarê sofîgeriyê ve wê rastiyê derdixin holê ku sofîgerî çarçoveyekî berfireh heye. Sofîgerî rabûn û tevgerkirina ber bi lutkeyê ve ye. Tevgereke ji asta herî nizim a pileya mirovatiyê ber bi pileya herî bilind, kemaliya Xweda û pegehiştinê ve diçe. Pileya dawî a gihiştina sofîgeriyê ne peywendîkirina ligel Xweda ye, belkî bûna bi Xweda ye. Ji bo gihiştina vê kemaliya mirovbûnê, divê sofî bi rêyên cûda bigihe pileya Xwedayetiyê. Ji ber ku gihiştina Xweda ne tekane rê ye û bi rakirinekê negihî armancê, belkî her kes bi rêyekê dikare xwe bigihîne encama ku bi xwe dixwaze. (El Turiq Îlillah Bîeded nifus el-xelaêq-Rêyên ber bi Xwedê ve bi hêjmara nefsên afirandî) Rêyên gihiştina Xwedê bi endazeya dirûstkirina Xweda ye. Ango rêya gihiştina Xweda ne rêyeke teng e û bi rakirineke kêm ji gihiştina Xweda derbikeve. Belkî her kes bi awayekê taybet dikare rêya rast bibîne û bibe Xweda. Ango her kes bi rêyek ji rêyên mezheb û olî dikare rastiyê bibîne. Ev wê yekê radigihîne ku ola Îslamê ne tekane ola rêya rizgarkirinê ye. Belkî her ol di her dîtin û ramanekê de dikare bigihe rastiyê. Vêca ev çi bawerî û olek be, yan jî felsefe û bîrdoziyek (îdeolojî) cûda be. Bi wateyeke din jî îrfan û sofîgerî rêyeke giştiye, çem û avake zelal e, di hemû fikir, bawerî, mezheb û ramanan de derbas dibe. Her kes li gor têgihiştin û hewlên xwe beşdar dibe, pêdiviyên xwe jê werdigire. Gelo ew reftarên ku sofîgerî encam dane û bi awayekê peywendiya ligel ola Îslamê ve red bikin; di demekê de ger em sunet û ayetên Pêximber red bikin, ma gelo dibe em sofîgeriyê ji Qur-an û sunetê bi yekcarî qut bikîn.

Humayî ji zimanê Etwallah Tedeyun vedigêre û dibêje: "Xweparêzî (zuhd) rewşeke di hemû olan de heye. Bi heman awayî di hemû neteweyan de tê dîtin û bi awayeke taybet xwe bi cih dike. Di ola Îslamê de jî xwe bi awayê sofîgeriyê derxistiye"(Tedeyn:1375, r. 346).

Bi dîtina Rabert Hiyom; "Ola Îslamiyetê weke hemû olên din arifên xwe yên taybet heye. Misilman bi xwe jêre re dibêjin, sofî. Gelek xalên hevbeş ên wekhev di navbera sofî û beşên Xiristiyanan de hene. Di dîroka Îslamiyetê de jî gelek sofiyên navdar hene. Li navend û dîwanan gotinên xwe tênin ziman û mirîdên wan ên taybet hebûn. Gelek kes jî li pey wan ketine. Serdemekê jî wisa hatiye danîn ku çavkaniya sofîgeriyê vedigere ser fikra Eflanoniya Nû û Hindiyan." (Hiyom:1379, r. 373). Lê sofî bi xwe vê dîtinê red dikin û bi dîtina wan; "Bingehê wan vedigere serdema jiyana Pêximber"(Hiyom:1379, r. 375).

Sofîgerî bi wateyeke giştî coreke ji 'Zuhd û Riyazet' hatiye dirûstkirin, fikrên wan weke fikir û ramanên xelkê cûda bûn. Lewra; "Daxwaz ji xelkê dikirin xwe ji şerê nefs û tiştên dinayayî biparêzin û guh nedin daxwazên nefsê. Derûniya xwe ji olên din paqij bikin. Tevî ku sofîgeriyê çavkaniya xwe ji hemû baweriyan wergirtiye û di olekê de bi awayekê hinek jê wergirtiye. Di ola Îslamiyetê de jî weke sofîgerî navdar bûye. Herî zêde jî fikir û ramanên wê ji Îrana Kevin, Hindistan û Yûnanîstanê hatiye wergirtin(Humayî: 1366, r. 41-42).

Martîn Lîngz ku bi xwe ji despêkê ve kesayetiyekî diyar ê Xiristiyanan bû, di derbarê çavkaniya îrfaniyê de xwediyê wê baweriyê ye ku sofîgerî û îrfan oleke serbixwe hene. Lê lêkolînên vê mijarê çavkaniya olê wan têk dane û li gor keyfa xwe çavkaniyên wê dÎbn ser oleke taybet. Di vê derbarê de wiha dibêje, îrfan û sofîgeriya Îslamî berê tevgerê bingehê xwe daniye û Îslam jî hebû. Îrfaniya Îslamî bi wehiyê ve hatiye girêdan û ji hemû dînên din serbixwe ye, lê ezmûn ji olên din jî wergirtiye(Lîngiz:1378, r. 30).

Li vê derê mirov dikare bêje ku fikir û ramanên Martîn Lîngiz wê yekê ji bo me radigihîne ku cîhana hebûna îrfan û sofîgeriya Îslamê ligel cîhana hebûna ola Îslamê bi giştî ne dijî hev in. Ew hemû îrfanên cîhanê weke tîrêj dibîne û di çarçoveya hebûnê de datîne. Bi dîtina wî ber bi rastiyê ve pêngav tavêje. Heta nêzî wê çarçoveyê dibe, di warê fikir de jî nêzîk dibe û di dawiyê de jî dîbn yek.

Marks û Nîkilson di wê baweriyê de ne sofîgerî û îrfan ji fikrên Eflatonî yên nû çavkaniya xwe werdigire(Zerîn Kub:1387, r. 13). Herwiha yek ji nivîskarên navdêr ên vê mijarê Ebdullah Tedîn jî di vê derbarê de bandora fikra Bûdî û Eflaton a li ser sofîgerî û îrfaniya Îslamî hebû û mirov nikare haşatiyê lê bike. Li gor nivîsa 'Îşraqiyan' beşdariyeke di hêmaya kevin a Faris û Pîsagorsî, bandorek diyar li ser fikir û ramanê îrfanan hebû. Di vê derbarê de arifên weke Denun Misrî û Ebû Sehil Tusterî bandora Eflaton û Pîsagorsî li ser wan hebû. Herwekî çawa bandora Farisan li ser Bayezîdê Bistanî, Helac û Ebû Hisn Xereqanî

hebû(Faxurî û Cer: 1385, r. 258). Di vê derbarê de Marks jî xwediyê vê dîtinê ye. Hîkmeta Yûnanî û fikrên cûda yên Îraniyan, ola Xiristiyan, Fêrgehên Hindiyan û heta yên Cihuyan jî li ser fikir û baweriya sofîgerî û îrfanan bûn(Zerîn Kub:1387, r. 13).

Hinek rojhilatnas û lêkolînvanên weke Îbin Xeldun di wê baweriyê de bûn ku gorî vê baweriê, îrfan li ser bingeha mezheba Şî'eyan e(Yesrebî:1379, r. 42). Lê sofîgerî li gel bawermendên ehle sunnet welcemaet li derdora kevneşopî û têgiha teqwayê dizivire. Lê ligel Ehlê Şî'e beşek din lê tê zêdekirin ku yeke ji bingehên mezhebê şîe, ew jî heskirina Îmamên Şîeyan bû. Lê ligel hinek nivîskaran ev heta astekê zêdegavî bû. Ji ber ku bi dîtina Şîeyan, îmam timî di hemû qonaxên jiyanê de zindî û pêşeng in. Divê hemû fermanên wan weke xwe bên cîbicîkirin. Îmam ligel aliyan bi îmamê demê (Welî Emir), qutin (Metib), Pîrê Sade (Pîrê Kamil) an jî Mirovê Kamil tê şîrovekirin(Humayî:1366, r. 63).

Bi dîtina İbn Xeldun, mijara qutbayetî û ebdal ji bîr û baweriya Şîeyan hatiye wergirtin. Li beramberî îmam û neqîb radiwestin û eşkere dike, sofiyên Iraqî li beramber hevsengiya navbera îmam û xwe de, qutib hilbijartine. li beramberî neqîban jî ewldan anîne holê. Peywendiyên bi îmamê Elî re red dikin û tênin bîra me, ti ji hevalên despêkê yên Pêximber (s.a.s) bandor li ser hev û mezhebên hev nekirine. Belkî ew kesên herî xwe diparastin bûn û di warê ol de cûdahî nedixistin di navbera Misilmanan de(İbn Xeldun: 1363, r. 983-984)

Quşeyrî bingehên sofîgeriya Îslamê li ser bingehê fêrkariyên Qur-an û sunnetê datîne û weke kiryarekî sofîgerî dibîne. Di demekê de Nîkilson di wê baweriyê de ye sofîgerî di despêka Îslamiyetê de nîne, belkî ji mezhebên ne Îslamî çavkaniya xwe wergirtiye. Tenê beşeke biçûk ji bo fêrkirina Îslam, Qur-an û sunetê vedigerîne(Tedeyun:1375, r. 336). Suhrewerdî di vê derbarê dibêje, sofîgerî di Qur'anê de nehatiye, lê hinek ayetan behsa sofîgeriyê kirine û pejirandine.

Hinek nivîskar û lêkolînvan di wê baweriyê de ne ku sofîgerî ji despêka sedsala 5 a koçî ve serî hildaye. Li aliyekê felsefeya Yûnanî ji sedsala duyemîn a koçî ve bandor li ser sofîgeran hebû. Di demekê de nivîsên wan ji bo zimanê Erebî hatine wergerandin. Her ev yek bû fikir û baweriya sofîgeriyê ji fikrên Yûnanî cûda kir. Yek ji jînamenivîsên herî navdar gotina Misilman, îmandar û xweparêzî weke hev datîne û sofîgerî di hemû corên fikrên Hindî, Yûnanî û hwd. xwe dûr dixin(Tedeyun:1375, r. 327). Lê nivîskarên weke, Zerîn Kub di derbarê sofîgeriyê de wiha dibêje: "*Di sofîgeriya Îslamî de gelek çavkanî hene ku ligel hinek fikir û baweriyên ne Îslamî peywendî hene û dibe hinek fikir û bawerî ji wan hatibe wergirtin.*

*Lê sofîgeriyê bi ti awayî çavkaniya xwe ji wan wernegirtiye*"(Zerîn Kub:1387, r. 14). Nivîskar di encamê de bilêv dike ku sofîgeriya Îslamî, ne berhemê hizirên Îslamiye û bi xwe serbixwe ye. Tenê çavkaniya serhildana wê Qur'an û sunet e. Herwiha dibêje, sofî hinek caran xwe dÎbn ser eshabeyan, bi taybet jî Îmamê Elî. Ji xwe ger ne bi vî awayî bûya, sofîgerî nedibû xwediyê vê çarçoveya Îslamî ya wisa berfireh. Îmam û feqeyên mezin ên weke; Îmamê Şafiî, Henbelî û Xezalî li ber çavan temaşe nedikirin. Lewra dibe hemû taybetmendiyên ne Îslamî jê qut bÎbnû bi xwe cihê rê û xwediyê exlaqek bilind e(Zerîn Kub:1387, r. 21).

Zinûnê Misrî, Helac, Şiblî û Bayezîd hemûyan jî bawerî bi *'Wehdet'ul-Wicûd'* hebûn. Bi vî şiklî ji bilî Xweda ti tiştek din nedidîtin. Zinun kesê yekemîn bû ji ber rexneyên rexnegiran hewara xwe gihandin nihêniya sofîgeriyê. Cuneyd ew rêbaz berfireh kir û Şîblî jî gihand ser mînbera mizgeftan. Cuneyd di got, me ew zanist hê berê di malên xwe de bi awayek veşartî digotin. Şiblî hat û li ser bilindahiya mizgeftan eşkere kir. Bayezîd carî 'Wehed El-Wicud' da û bû rêberê rêya mestî (sekr). Mensûrê Helac zêdegavî kir û peyva 'Enellah' bilind kir. Sofîgerî bi destê kesên weke Ebû Hemid Xezalî, Îbin Erebî û Suhrewerdî pêş ket, fikir û ramanên navbera şeriet û sofîgeriyê li ser destê kesên weke; Quşeyrî, Serac El-Tusî, Hicuyrî û Ebu Hemid Xezalî hat ronîkirin(Xenî: 1383, r. 58-60).

Ger em temaşeyî fikrên Asîn Plason bikin, baweriya wî bi bandora Xiristiyaniyê li ser sofîgeriya Îslamî hebû û heta felsefe jî. Bi dîtina Hortîn jî fikir û ramanên Hindiyanwiha rawe dike. 'Şaşitiyeke mezin e em tenê çavkaniya sofîgeriyê bi fikrê Îraniyan ve girê bidin. Ji ber ku bi awayekê bandora Ereban jî li ser fikra sofîgerê heye û em nikarin vê rastiyê înkar bikin. Tevî ku helbestên Farisî wateya xwe ya herî kûr ji bo fikir û ramanên sofîgeriyê veqetandine'(Yan Ripka:1383, r. 417-418).

Di encamê de em dikarin vê yekê bejin, despêka sofîgeriyê ji Îslametiyê dest pê dike û bi demê re guhertin di nav de hatiye kirin. Lê di hemû qonaxan de Qur'an û ayet rê nîşana kesên li ser vê yekê dimeşin dike(Siruş: 1372, r. 33).

Li gor çavkaniyên di warê sofîgerî û îrfanî de hatine, em heta niha negihiştine encama despêkê ya çavkaniya derketina sofîgeriyê. Her nivîskarek li gor asta xwe ya rewşenbîrî û ayîna xwe di vê derbarê de tiştek nivîsandine. Hinek hene rêçka sofîgeriyê dÎbn ser ayîna Budî û hinek dijî dÎbn ser Xiristiyaniyê. Beşek din jî di wê baweriyê de ne sofîgeriyê çavkaniya xwe ji felsefeya Yûnan wergirtiye. Lê beşeke zêde di wê baweriyê de ne çavkaniya îrfanê ji ola Îslamê despê kiriye, Qur'an û hedîs jî çavkaniyên fikir û baweriyên sofîgeran bûn.

Tevî ku ji welatekê ji bo welatek din û ji serdemekê ji bo serdemek din guhertin di reftar û kevneşopiyên sofîgeriyê de çêbûne; lê her li ser fikrê xwe yê ola Îslamê berdewam bû û di hinek rewşan de jî zêdegavî di nav de hatiye kirin.

### 2.2.4. Sedemên Belavbûna Îrfaniyê

-Sadebûna dûayên sofîgeriyê ligel daxwazên ruhî yên xelkê

-Sadeyiya daxwazên arif û balkişandina wan li ser armancên manewiyatê

-Hevgirtin û dîtina wekhev a ligel Qur'an û ayetan

-Nediyariya dûakirinê di sedsalekê de bi awayek hêsan cihê pejirandina şerîetê digirt

-Rastbêjî û piledariya bangxwaz (Kesên fikrên Îslamiyetê belav dikin) û alîgirên wan

-Zehmetiya zanayên olî şansek da arifan(Edhem:2012, r. 110).

### 2.2.5. Cûdahiya Îrfan û Felsefeyê

Fîlozof dixwaze ji rastiyê fêm bike, lê arif dixwaze cîhana tê dîtin derbas bike û bigihe bingehên wê yên rastî. Ji bo rastbêj bigihin cîhana meteryal, bi awayek giştî sûd ji dû rêyan werdigirin. Yek ji wan hestyarî û mantiqe, ya din jî merasîm û kevneşopiye. Ya yekemîn fîlozof li ser wê rê yê dimeşin û ya duyemîn jî arif(Edhem:2012, r. 110).

### 2.2.6. Gotinên Bê Wate (Şetehat)

Gotinên bê wate xala herî giring a şîrovekirina navbera îrfan û lojîke. Ji bo vê mijarê ji gelek aliyan ve pêwîste mirov li ser raweste û li ser baxive, lê di dîtina lojîkê bi xwe de ev mijar dîtineke rexneyî ya lojîkiye. Ango cihê komkirina mijarên dijî hev e. Bi wateya, 'Neguncandina du kesên ligel xelkê naguncin, ji bilî şetehat hemû corên din ên dijî zimanê îrfan de hebûna wan heyî'(Ebdurehman:2014, r. 134).

### 2.2.7. Edebiyata Îrfanî (Sofî):

Peywendiyên di navbera îrfan û wêjeyê de peywendiyekî demdirêj e û di navbera wan de gelek mijarên hevbeş hene. Mijarên herî zêde wan bi hev ve girê dide, aliyê wê ziman e. Ji ber ku ziman di mijara îrfanî û wêjeyê de cihe balkişandinê bû. Ji ber ku ziman sedemê derbirîna hestên wêjevanan bû. Ji bilî ku herdû mijar ango îrfan û wêje, reng, hebûn, zewq û tama taybet didin rih (giyan). Zekî Mûbarek di vê derbarê de wiha dibêje: "*Jiyana sofiyan li*

*ser bingehê zewqê ye û ev yek jî bingehê yekemîn ê hunerê ye. Ango sofî keseke timî bi mûral (zewq) e. Çi tişta dibîne dixwîne, dibihîse û li wateya wan digere. Sofî di vî warî de bi giştî di helbest û bi taybet jî vehunandina stranan de kesên herî hişyar û bi ageh bûn*"(Zîdan:2001, r. 68).

Taybetmendiyek din ku peywendiyên îrfan û wêjeyê derdixe, cihê lêkolîn û giringiyek zêdetir e. Ew jî cîhana nimûneyî ye (Alemê Mîsal). Bi wateyeke eşkeretir wateyên wêjeyî bi heman awayî ango îfran ji bo rizgarbûna ji cîhana veşartî û ne eşkere, hewara xwe digihînin wêneyê nimûneyî (mîsal). Ev jî ji ber ku wêneyên nimûneyî dikarin tabîr li derbirîna derûniyan bikin. Ti guman di nav de nîne, di çarçoveya van wêneyan de wêneyên cor bi cor ên rewanbêjiyê pêktînin. Ev jî derbirînê li wêje û hunerê dikin, lewra mirov dikare bibêje wêje gelek pêwîstiyên îrfan digire nava xwe(Ebdurehman:2014, r. 137).

Dr. Marûf Xeznedar di derbarê sofîgerî û îrfan de dibêje ku 'sofî, xwediyê wêjeyek nazik in û hewara xwe digihînin sembolên sofîgeriyên Rojhilatî. Ji ber ku em wan di navbera fikir, wêne û mijaran de dibînin ku helbestvanên dest didinê. Ji Îbn Erebî û Îbn Farîz û kesên din ên Erebî heta digihe Celaledînê Romî, Cahî û Nîzamî ku bi Farisî nivîsandine. Em wekheviyek (lêkçûn) ecêb dibînîn ku bandora helbestên hev di fikir û giyanî de ji heman çavkaniyê ye û ev jî ezmûna helbestên wekhev çêdike'(Resû l: 2008, r. 422).

Veguhandina îrfan û sofîgerî di warê naverok û awayê xwe de li ser bingehê helbesta asayî hatiye dariştin. Lê ji despêka dirûstbûna wê ve xwediyê taybetmendiyên xwe bû û ev jî bûne sedem ku ji taybetmendiyên helbestê dûr nekeve. 'Despêka serhildana vehunandina sofîgeriyê li ser destê pêşangeha sofîgerî û di sedsala 2 a koçî de û bi taybet jî di sedsalên 3 û 4'mîn a koçî de pêşketiye'(Wesman: 2013, r. 263).

Rabîe Edewye yek ji helbestvanên arif bû û helbesta îrfanî nivîsandiye. Weke yekemîn helbestvanê îrfanî û sofîgeriyê tê hêjmartin. Heta navbera salên 180-185'ê koçî jiyan kiriye. (Wesman: 2013, r. 262). Ev helbestvana navdar hewl daye heskirinê heta astekê bilind bike û heta gihand asta yektaperestiyê. Sofîgeriya Îslamî despêkê di wêjeya zuhd de pêşketiye. Wêjeya zuhd û bi taybet jî helbest ji bo derketina helbestên sofîgeriyê despêkek baş bû(Wesman: 2013, r. 263).

### 2.2.8. Şerîet û Îrfan

Eşkereye di navbera sofîgerî û şerîetê de nakokiyekî dîrokî diyar dibe. Dîroka vê nakokiyê vedigere despêka derketina sofîgeriyê û weke rêbazek din pêşket. Tirsa şerîetê hebû, di sofîgerî û îrfanê de bi du arasteyan bû. "Yekemîn: Tirsa yekemîn tirsek selefîyane bû. Ji bo paqijgirtina ola Îslamê, pêşîgirtina li destêwerdana li ehkam, erk û ji bo nebe pirsgirêk û paradoksekê di eqîde de; pirsgirêk di gotin, tefsîr û şîrovekirinên cûda Qur-an mezin dibe û dibe sedemê ji rê derketinê. Heta ev jî digihek kesek kafir, ji ol derketî û zendîq. İbn Tîmî weke yek ji dijminên sergerm ê ehlê sofîgeriyê tê danîn, di vê derbarê de gelek nivîs û guftûgo li ser hene. Ibnî Tîmî di wê baweriyê de ye tenê heskirina Xweda ku krokiya sofîgeriyê ye, ji bo pêşvebirina wê ne bes e. Belkî pêwîste mirov tirs, çaverêyî û hêvî ji Xweda hebe. İbn Teymiye dibêje, xweskirina ji bo Xwedê ne tenê nayê hêjmartin, belkî xwediyê wê ber bi ol derketinê ve dibe(El-Fuzan:2009, r. 40). Ev di demekê de ye arifek navdar ê weke Rabîey Edewî wiha dibêje, Xwedêyo ger ji tirsê, min bixe di dojehê de. Herwiha ger ji bo çûna biheştê jî we di perêsim, bila biheşt li min heram be. Xwedêyo ger ji ber heskirina we, we diperêsim ciwanî û cemala xwe li min veneşêre(Emîn: 2009, r. 40).

Gengeşeyên di dîroka sofîgeriyê de evbû ku arifên Misilman hinek caran ji erkên şerîetê zêdetir bernameyên karên xwe hebûn. Tevî encamdayîna erkên xwe, dest jê berdana ji heramkariyan û li berçav girtina nehî kiriyan; heta xwe ji kesên rê bi wan dihat dayîn jî xwe diparastin. Mînak, piraniya wan kêm dirazin û bi kêmî dixwarin, cilûbergên neciwan li ber xwe dikirin(Şahîn:2013, r. 139).

Li gor çavkaniyên behsa peywendiyên di navbera şerîet û sofîgeriyê de dikin, "Çareseriya mamnavendî ya ji bo şîrovekirina vê mijarê û gelek caran jî behsa çîroka Mûsa ya ligel Xidir dikin ku di Qur-an'a Pîroz de behsa wê hatiye kirin. Weke belgeyek ji bo zanista *Zahir* yan jî *Batîn*(El-Şibîb:1963, r. 400). Di vê derbarê de Xezelî dibêje, kesên dibêjin rastî berevajî şerîetê ye û 'Batîn' berevajî 'Zahîre' nêzî kufrê ne û ligel rastiya bi şerîetê ve neyê girêdan dest nakeve(Resûl:2008, r. 401).

Bi kurtî dîtinên di derbarê peywendiyên îrfan ligel şerîetê ji hev cûda ne. Hinek dibêjin peywendiyên îrfan û şerîetê peywendiyek dîrokî ne. Lê bi dîtina hinek kesên din, peywendiyek wisa diyar di navbera îrfan û sofîgeriyê de nîne. Emê ji bo herdu dîtinan û ji bo pirştrastkirina dîtina wan mînakên diyar bînin.

Li gor dîtina beşek nivîskarên di warê îrfaniyê de, îrfan ti peywendî bi şerîetê ve nîne û di gelek rewşan de dijberiya şerîetê jî kiriye. Letîf Helmet di vê derbarê de dibêje, divê em wê yekê baş bizanin ku sofî bi eşkere di gotin û fikrê xwe de berevajî şerîetê tevdigerin. Di helbestên xwe de gelek tiştan dibêjin û ew yek ligel zanayên şerîetê dikeve çarçoveya kufir de (Helmet:2009, r. 12), Nivîskar ji bo dîtina xwe piştrast bike, çend mînakan ji gotin û helbestên helbestvanên şerîetê tênin. Mînak; Helac dibêje ladînî Xuda gumra bûm le lay min gumrayî/Erkî serşanme û lay Musilmananîş rîswayî(Helmet:2009, r. 15).

Herwiha Îbn Erebî di dîtineke xwe de li ser şerîet û Xweda dibêje: "*Ez Xweda me û Xweda ez im*"(‘Elî:1979, r. 15). Ji bilî van helbestan, İbn Fariz gelek xezel nivîsandine û pêşkêşî Xweda kiriye, behsa xwe û Xweda kiriye. Ne tenê ev, belkî helbestvan û arifên weke Rabîey Edew jî li ser heman fikir û ramanê bû. Tevî ku bi xwe yek ji helbestvanên arif û mitesewef bû. Ji rê derketina di şerîetê de li ser beşeke zêde ya arifan dihat dîtin, ev yek jî eşkere ye. Mirov dikare mînaka 'Tellesanî' bêne ku dîtinên wî di derbarê Qur-an û sunnetê de berevajî şerîet, ligel ehlê sune weke kafir bi nav dikin. Telesanî dibêje Qur’an hemû heval peydakirin e ji bo Xweda, yektaperestî di axaftina me de ye(Elî:1979, r. 197).

Li gor dîtina Letîf Helmet derketina mezhebê sofîgeriyê dijî şerîetê ye. Wekî ku sofîgerî di civaka Kurdewariyê de belav bûyî û wisa hatiye nasandin ku rih dirêjkirin, nimêjkirin, rojî girtin û xelwetgerî ne Xwedanasiye; belkî felsefeyeke taybet e û dixwaze mirov ji astengiyên şerîetê azad bike. Bi wî awayê mirov Xweda ye û Xweda mirov e, li ser erdê kes nikare astengiyan ji bo ti kesekê dirûst bike(Helmet:2009, r. 148).

Bi awayek giştî mirov dikare balê bikişîne ser wê yekê ku bingehekî ne Îslamî yê sofîgeriya Îslamî heye. Herdu rêbazên ku li Kurdistanê bi navê 'Mezhebê Qadirî û Neqşebendî' tên peyrewkirin, bi ti awayî ji dûr û nêzîk peywendî bi rêbaza sofîgeriyê ve nîne. Bi temamî girêdayî (pabendî) şerîeta Îslamê ne, kevneşopiyên olî gihandine xelkê, nekû sirûd, merasîmên mezhebî û sofîgerî. Sofiyê rast gotinên wisa dike ku bi eşkere li hemberî şerîetê derdikevin(Helmet:2009, r. 156). Em dikarin di vî warî de gelek belgeyên cihê baweriyê eşkere bikin. Ji wan jî Sîrac el-Bexdadî wiha dibêje, ‘*Ena Aşiq Ella ezucil we ellah yeşiqnî-Ez evîndarê Xweda me û Xweda evîndarê min e*’(Elî:1979, r. 197). Ger mirov bi baldarî balê bikişîne ser van dîtinên bi vî awayî, mirov dibîne fetwayên dûdilî hatine dayîn. Ev cor di fetwayê de li aliyê ehlê şerîetê dikeve çarçoveya kufir û derketina ji ol hatiye şîrove kirin.

### 2.2.9. Hinek Xwederxistinên Arif û Sofiyan

1-Hinek sofî ji bo her nimêjekê xwe dişûştin.

2-Hinekan zivistanan û di hewayek derve de xwe paqij dikirin.

3-Hinek ji wan nimêja sibehê bi destnimêja şevê dikirin ango şev heta sibehê nedirazan.

4-Hinek ji wan çend rojan nedirazan û her bi destnimêj diman.

5-Hinek jî li ser tiliyên xwe nimêj dikirin, qaşo bihîstine Pêximber (s.a.s) carekê wisa kiriye.

6-Hinek çend roj an jî çend heftiyan di rewşa cezbe û bihêşiyê de diman.

7-Hinek li ser giran û bi gotina 'Allahû Ekber' di despêka nimêjê de ji hişê xwe diçûn û nedikarîn nimêja xwe bi cih bihêlin. Nimêja wan diçû.

8-Herwiha hinekan sema û govend dikirin, bi giştî di cîbicîkirina nimêjê de nimêj nedikirin(Mehmûd:2017, r. 106).

# 3. DI El 'KELÎMAT UL-QÎSAR A BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ

## 3.1. Di Derbarê Zanistî De

Baba Tahir yek ji helbestvanên arîf e giringiyek mezin daye meseleya zanistê. Di 'Kelîmat el-Qîsar-Peyvên Kurt' de wiha dibêje: "*Zanist belgeyeke zanînê ye*"(Baba Tahir:1363, r. 15).

Mezinahiya fêrkirin û fêrbûnê di wê yekê de eşkere dibe ku zanist di kiryarên xwe yên herî bilind û taybetmendiyên xwe de ye. Piştre fêrker jî dikare kiryara herî baş bidest bixe, ji ber ku yê li beramberê xwe fêr dike. Di heman demê de pabendî fermanên Xwedayê xwe dibe. Di vê demê de jî dikare pileya cîgir (Xelafet) bidest bixe. Ji ber vê yekê jî Xezalî dibêje fêrkirina zanist û zanyarî ji aliyekê ve ligel Xweda kareke baş e, li aliyê din jî fêrker digihîne pileya cihnişîn (Xelafet) û ev jî pileya herî bilind e. Ji ber ku ligel Xwedayê mezin zanist weke taybetmendiya xwe ya herî bilind daniye(Xezalî:1375, r. 46).

Ev mijarane di despêka derketina ola Îslamê û mamelekirina di sofîgeriyê de, bi awayekê bû pêwîst bû hemû bawerî di fîltera şerîetê de derbas bibûna. Ev jî bi zanista Xwedayî berdest dibû lê di sedeya 4 û 5'mîn ên koçî de, komek şêx û sofî derketin. Ji zanista şerîetê dernediketin û îtiraf pê dikirin. Em dikarin di vê derbarê de wêneyê Ebû Hesen Xereqanî weke mînak bînin(Bêrtlês:1382, r. 85).

Di vê demê de zanist û mantiq li jora hemû wêjeya Farisî bû. Lewra fikir û ramanên sofîgeriyê paş diketin. Êdî fikra 'Fîrdewsî' ne navdar bû. Ji bo vê yekê jî beşeke sofiyan dest bi fêrbûna zanist û zanyariyan kirin. Lê tû ji van sofiyan nekarîn xwe di vî warî de pêş bixin. Ev jî ji bo wê yekê vedigere ku sofiyan nedikarîn xwe dûrî ti pîvanekî şerîetê bikin. Herwekî Ebû Sexr Ebû Xeyr dibêje ku pêngava yekemîn a sofiyan avêtî, dirandina defter û ji bîra xwe birina zanistê bû(Xenî:1383, r. 59). Herwiha Xezalî bi tundî êrişî sofî û dostên zanistê dike, wan weke ji rê derketina ji ol bi nav dike. Ev dîtin di pirtûka 'Tehafet’ul-Felasîfe'yê de bi eşkere diyar dike. Her vê yekê jî wisa kir ku Etarî Nîşan Purî bi dijwarî li dijî zanistê derbikeve û bi dîtina wan hemû sofî dijberiya zanist dikin. Xezalî tevî ku peywendiyek tund di navbera Pêximberan û sofiyan de li ser 'Îlahm û marîfetê' heye; di vê derbarê de wiha dibêje, sofî ji bilî di rewşa niha di nav de dijîn, fikra ti tiştek din nakin. Bi vê sedemê jî fikir û dîtinên sofiyan li ser şîroveyan cûda ne. Lê zana keseke li pey rastiyê digere. Ji bo dîtina rastiyan temaşeyî rewşa takekesî nakin. Lewra dema tû ji sed sofiyan li ser mijarekê pirs bikî, wê sed bersivên cûda bidin. Lê dema zanist tîrêjên xwe bide weke rojê hemû cihê digire, hîcaban didirêne û çend eniyan jinav dibe(Şirûş:1379, r. 55).

Tevî ku li wê meydanê Ebdullah Xefîfî Şîrazî bi berdewamî rêya zanistî girtibû, tevî ku hinek sofiyên din jî ne ligel fikir û dîtinên wî bûn, lê ji bo çareserkirina gelek pirsgirêkan ji bo çareserkirinê diçûn ligel. Wî jî bi zanayî, bîrmendî û jêhatiya xwe ji wan re ew pirsgirêk çareser dikir. Xezalî tevî xirabkirin û wêrankirina zanista fikrî (Ilım el-eqlî), lê zanyariyek baş di derbarê zanista fikirînê de hebû. Vê yekê jî wisa kiribû hinek sofî dijberiya wî bikin. Dij

derketin û xwe dûrxistina ji zanistê ligel sofiyan tiştek asayî bû. Ji ber ku hinek di nivîs û gotarên xwe de rastî rexneyan dihatin, xwe ji zanist diparastin, nedinivîsîn û behs nedikirin. Ebû Lehesin Şajlî, tevî şarezayiyeke zêde di derbarê zanist de hebû, lê xwe ji nivîs û behskirina diparast(Zerîn Kub:1387, r. 158). Lê hinek sofiyên din hebûn, hinek lêkolîn û di derbarê zanist de weke şerm didîtin. Ji wan jî Ebu Lihsin Kindî, rêya wî dikeve karwanekê ji bo behsa hedîsan bike, lê ji tirsan armanca xwe vedişêre û behs nake. Heta rojekê daxwaza xwe di kirasê xwe de veşartibû û dikeve xwar, di wê demê jî sofî rexne lê digirtin û bi tundî jêre di gotin; şerma xwe veşêrin(Îbn Cuzî:1381, r. 230).

Bêgûman di nava sofiyan de fêrkirina zanist behsa wê hatiye kirin û mercên bi bandor jî jêre hatibûn danîn. Rebîî Kurî Xesîm dibêje: "*Fîqe (Zanista Şerîetê) fêr bibe û piştre goşegîriyê (tecrîd) hilbijêre*." Mutrîfê Kurê Ebdullah dibêje: "*Mezinahiya zanistê li ebdayetiyê mezintir e*." Yûsifê Kurê Esbab jî dibêje: "*Merce mirov fêrî beşek zanistê bibe. Ev jî ji wê yekê baştire ku tû heftê caran ji bo Xweda biçî şer*." Ji Meafê Kurê Îmran vedigêrin ku gotiye; nivîsîna ayeteke min ji nimêja şevê û îbadetê baştir û xêrtir e(Îbn Cuzî:1381, r. 114). Cuneydê Bexdadî di vê derbarê de wiha dibêje: "*Rê dibe dû beş yan bi zanist e yan jî bi exlaq e. Exlaqek ku zanist ligel nebe, tevî ku baş jî be nezanî û gêjiye. Zanistek exlaq ligel nebe, her heskirin û şeref e*"(Hucwîrî:1386, r. 604). Di vê derbarê de Baba Tahir wiha dibêje: "Riweye el-Ilmû ecir el-mirîdîn' e(Baba Tahir:1363, r. 15). Ji ber ku eşkere bûye dema navê zanist li zanistê kirin, ji bo wê yekê bû rûyê wê bibînin(şihud). Di nava kesan bi xwe de eşkere dê bibe. Lewra ger mirîd û sofiyek heta roja dawiyê di meqamê zanist de bimîne, amaje û mezheb tênegihe; ev jî dibe sedemê nezanîna wî mirîdî û nikare ji meqamê amaje û mezheb derbikeve.

Baba Tajir dibêje: "*el-ilim Delîl-Zanista Delîl e*"(Baba Tahir:1363, r. 15). Ev tê wê wateyê ku zanist destûrên Pêximber e. Her ev yek jî dibe sedemê bidestxistina marîfet û hikmetê. Di nava kesan de hûrbînî û lêkolîn tên kirin û di heman demê de li derveyî kesayetî jî bandora 'Wilayet' di nav de ye. Di derbarê zanist û hikmet de jî Baba Tahir wiha dibêje ku "*el-Hîkmetû Tercûmanî, et-tercûmanî kehnifanî ze'feran bifethil elta we zemme el-cîm*"(Baba Tahir:1363, r. 15). Hîkmet zanisteke di nav û derveyî xwe de lêkolînan dike. Ev lêkolîn û hûrbîniyane di demekê de tên kirin ku mirov ji dozexa (cehenem) nefê rizgar dibe. Ev jî di demekê de çêdibe, dema mirov navbeynkariyê qebûl bike û ji doxeza neftê rizgar bibe. Ev mijar bi kiryarî bikeve di nava dil û derûnê mirov de û di heman demê de mirov ebdayetiya Xwedayê xwe bike.

Bi heman awayî Baba Tahir di derbarê zanistê de jî dibêje: “*Rael ‘îlmû yedullu eleyhî'l ewced yedellu lehu*”(Baba Tahir:1363, r. 16). Di derbarê zanist û hîkmetê de ew yek eşkere bûye ku peywendiyekî zêde ligel wijdanê heye. Wijdan jî rewşeke serxweş a têgihiştina ji tiştên eşkere ye. Piştre jî her tişta bikeve di çarçoveya wijdanê de, ew e ku bi qêr û hewarê tê binavkirin. Hinek caran rêwî di rewşa wecid (hebûn) de gelek caran dike qêr û hewar. Tişta ku li vir armanca Baba Tahir, ew jî ew e ku zanist delalet (Nîşan) li heqê Xweda dike. Sedemeke nêzî rêwî, para nefsa xwe hebe yan jî na; hebûn di rewşeke xwezayî de ye. Ev jî nîşana li Xwedayê bi tenê dike. Di heman demê de rê nîşanî rêwî dike, li ser maf û ji bo maf. Ebû Nesir ji bo vê armancê salekê ti agehî ji para xwe nebû, belkî şewqa Xwedê ew ji bo van karane pal daye. Berevajî zanist bê agehiya ji tiştekê radikêşe. Ev jî tê wê wateyê ku zehmeteke kesek agehiya wî ji wî hebe û ligel wî para wî ne giring be. Lewra Baba Tahir wiha dibêje: “*Wed-delîl eleyhî yecizib îla qerbe wel delîl lehu yecizib îleyhî*”(Baba Tahir:1363, r. 17). Bi wateya amajekirina rêwî ji bo kar, rêwî bi xwe, sedem û nîşanên rakêşana ji bo Xwedayê mezin e. Rêwî bêyî ti sedemekê xwe nêzî Xwedayê Mezin dike. Pile û payeya xwedîderketîna di bin ayeta “*Fexilil mucahîdîne bî emwalîhîm we enfûsîhum ellel qaîdîne derece wekele we edellahe el husna we fezullahe el mucahîdîne ellel qaîdîne ecren ezîmen derecatu mînhu we mexfiretu we rehmetuke*” Cara yekemîn tekoşîna rêwî dest pê dike. Rêwî dema ji bo pile û payetiyê têdikoşe, ti xelatkirinek wisa nîne. Lê di encamê de ji bo Xwedayê Mezin radikêşe. Cara duyemîn amaje bi wan kesan hatiye kirin ku bêyî daxwaza bidestxistina mal û nefsê têdoşe, ev jî ji bo aliyê Xweda radikêşin. Lê bi awayekî cûda di koma yekemîn de ji bo pile û paye û ji bo xwe nêzî Xweda bikin, têdikoşin. Ev ayeta pîroz balê dikişîne ser wê yekê koma duyemîn xelatek mezin, pile û paye û lêbûrînê werdigirin û ev jî Xwedayê Mezin soz daye.

Baba Tahir yek ji wan helbestvanên arîfe gelek giringî daye zanist û marîfiyetê. Di beşeke belavoka 'Kelîme El-Qîsar-Peyvên Kurt' de bal kişandiye ser mezinahî û giringiya zanist û wiha dibêje: “El ilmu bil merîfe mu’erife”(Baba Tahir:1363, r. 17). Ev tê wê wateyê ku çavgirtinek mezin bi çavlêkirina Xwedayê Mezin dibe zanîn, lê çavlêkirin û çavlêkirina bêyî mûraat nezaniye û nakeve çarçoveya zanînê de. Xezalî di vê derbarê de wiha dibêje: "Mirovan di derbarê zanist de çend enî (cephe) avakirine, lê hemû li ser wê yekê hemfikirin ku zanist erk e. Wêjevan zanistê bi zanista 'Kelam-Gotin' datînin. Ev jî ji ber wê yekê ku wê grûbê perestîja Xweda fêm kiriye, zat û taybetmendiyên Xwedayê Mezin dizanin. Feqyekan zanist bi zanista Feqhî datînin, bi sûdwergirtina ji vê zanistê perestîj, helal û heram ji hev cûda dikin. Kesên sîkere (Mufesrîn), û ayetan vedigêrin, di wê baweriyê de ne kevneşopî ew

zanista komkirina hemû zanistan e. Sofî jî di vê derbarê de dÎbn çend beş. Hinek hal û meqam weke zanist bi nav dikin, hinek jî exlaq, nefs, cûdakirina melatî û şeytanî bi zanist datînin. Hinek sofiyên din jî weke zanista nefsê bi nav dikin(Xezalî:1375, r. 54). Ebu Hesen Xirqanî di vê derbarê de wiha dibêje: "*Şeytan bi qasî du komên mirovan li dijî dîn derneketiye. Ya yekemîn kesên xwedî zanist û yên ji bo cîhanê têdikoşin. Ya duyemîn jî xweparastinek ji zanist bêbeş*"(Xirqanî:1385, r. 311).

Di derbarê mezinahiya zanistê de gelek lêkolînvanên navdar û şîrovekarên Qur-an'a Pîroz hatine, gelek lêkolîn û şîroveyên giring di derbarê mezinahiya zanistê de kirine. Piştre jî ev lêkolîn ligel tekstên helbestên îrfanî berhev kirin e. Armanca vê yekê jî ew e ku bikarin cûdahî û şîrovekirinê di navbera gotin û dîtinên arif û ol de li ser zanistê bidest bixin. Mînak; di pirtûka 'Tesîr el-Kerîm El-Rehman' de, di derbarê tevsîr û şîrovekirina ayeta 122 a sureta 'Tewbe' de, ev ayet di derbarê mezinahiya zanist û pisporbûna di nav de tê wê wateyê ku li vê cîhanê pêwîste hemû kesji bo bidestxistin zanistê bi endazeyek baş hewl bide. Ev jî ji ber wê yekê ye ku zanist yek ji beşên herî giring ê ol e. Ji ber vê yekê jî, her kesê Misilman li ser erke ku xwe fêrî zanistên olî bike, wate û nihêniyan (tiştên veşartî) bizane. Di heman demê de pêwîste ji bo belavkirin û pêşvebirinê hewl bide(El-Elsadeî:2002, r. 242). Her di vê ayetê de tenê çawa ji bo cîhad û koçkirina ji xaka xwe ji bo cihek din ji ber dîndariyê, tenê ji bo mirovê Misilman ne bes e. Herwekî di vê ayetê de behsa wê tê kirin; "Wema kana el mû’mînûne leyenfîrî kafe” Wate: "Mafê mirov nîne bi giştî warê xwe bi cih bihêle." Belkî pêwîste fêrkirin, zanist û lêzanî (Tifqe) di cîhanê de bê bidest xistin û ol weke rê dÎbne, ‘*Felewla nefere min kullî firqetî minhu taîfetû têtefqehû fidînî*’ ‘*Çima di her civakekê de çend kes ji warê xwe koç nakin û ji bo li vê cîhanê zana bin*’(El-Bistanî:1906, r. 205).

În Kesîr di derbarê şîrovekirin û tevsîrkirina vê ayetê de xwediyê vê dîtinê ye; "Gotinên kesên weke Eliyê Kurê Telhe, Qutade, Zehak û Ewanî" bi belge têne. Bi dîtina wî ev kesane zêdetir li pey fêrkirin û fêrbûna zanista şerîetê bûn. Di vî warî li cîhanê dihatin naskirin." (Îbn Kesîr: 1387, r. 135-136). Herwiha nivîskarek navdar ê weke Meybodî di derbarê vê ayetê de wiha dibêje, awayê zanayên olî ji bo dest ji zanista şerîetê berdin, gotinên Pêximber kom bikin, kevneşopî û kiryarên wî bilind bigrin(el-Mubîd:1371, r. 243).

Bi wateyeke din jî zanista herî baş ligel Xwedayê Mezin zanîn û fêrbûna Qur-ana Pîroz e. “*Xeyrekûm men teeleme Qur’an’u elmuhu*” Wate; ‘*kesên herî baş ew kesin ên fêrî Qur-an'ê dÎbn û di pratîkê de jî bikin’*

Di vî cihê kêm de çima Baba Tahir di derbarê zanist û marîfetê de gotineke wî nebe, herwekî çawa li vê derê wiha dibêje, ‘*vebezate el mu’erufe keferu*’(Baba Tahir:1363, r. 18). Ev tê vê wateyê ku bêyî agehdarbûna ji zanista Xwedê, hemû zanîn û zanist ne jîr û lewaz in, ji ber ku meqamê zanist meqamek nedyar e di tiştek diyar de. Serê zanist ji nav de dernakeve û winda dibe. Bi wateyekî din jî veşartina zanist eşkere yê biker e. Ev jî ji bo wê yekê vedigere ku risalet meqamê zanist e û di heqê Xweda de winda bûye. Bi giştî mirov dikare wê yekê bêje ku ligel xelkê îrfan û şerîetê, zana agehdar bûn û bi marîfeta Xwedayê marîfetê agehdar bûn. Baba Tahir weke helbestvaneke mezin ê arîf baweriyeke zêde bi zanist û zanista şerîetê hebû. Lewra wiha dibêje: “El ilmû hebese el zahîrû wel muşahîd hebesel batinî”(Baba Tahir:1363, r. 17). Ev tê wê wateyê ku rêwî (salih) di meqamê zanistê de be, êdî endamên gewde, rih û nefs bi temamî tê girtin. Ger bi wî awayî be Baba Tahir agehî ji wê yekê hebû dema zanist bi zanist tê danîn û di kiryarê de neyê cûdakirin ango bi kiryar û gote be, lê ger berevajî wê yekê be wê demê zanist nayê hêjmartin. Belkî nezanîna nadyar (murekeb) e. Zanist ji ber girtina awayê perestina nefs û li berçavgirtina heskirina rast bidest dixe. Lê berevajî xebitîna bi karê heskirinê, rastî dernakeve holê, belkî di wê rewşa rêwî poşman bibe de.

Baba Tahir di berdewama axaftinên xwe yên di derbarê zanistê de wiha dibêje: “Ceelelahu cemîe el cewarîh fî hebese el ilim”(Baba Tahir:1363, r. 17). Wateya vê gotinê girêdayî gotina berê ye ku delalet li wê yekê dike ku Xweda hemû endamên laş li hebsî (zîndanî) zanist de bi cih kiriye.

Baba Tahir wiha dibêje: “*Fela tetleq carîhe mîn secnîha îla bî îlmûl axir*”(Baba Tahir:1363, r. 17). Bi baweriya Baba Tahir, nabe û bi ti awayî jî nabe ti carheyek bêyî beşeke zanistê nabe. Tenê bi şertekê tê kirin ew jî bi zanistek din ve bê girêdan. Yan jî dibêje: “*Femin etleqeha min sicnîha bîxeyrî ilim feqed xerece mîn hebesî el ilmû we esî we teedî*”(Baba Tahir:1363, r. 17). Ev tê wê wateyê ku dema kesek di çarçoveya hebsî zanist de be, di heman demê de zanistek din reha bike, wê demê ciwarih îsanî encam daye û ji sînorê mirovbûnê derketiye.

Baba Tahir li aliyekî din jî her di warê zîndanîkirina zanist, heqewe û peywendiyên ligel zanistê de wiha dibêje: “*Wel ilmû qeydul ebûdiye we hebese el heqe femen etleqeha bi xeryî ilim feqed xerece min ebudiye we îsteemel huriye*”(Baba Tahir:1363, r. 18). Li vir armanca Baba Tahir ew e ku gelek dîtinên cor bi cor bikarbîne û heta digihe rastiyê. Zanist, tê wateya pabendbûn (girêdan) ê û divê endamên laşê mirov nîşan bidin. Sedema zîndanîkirina

endamên laşê mirov rast û maf e, nekû her ewqas belkî pêwîste mercên wê zîndanîkirinê li ber çav bê girtin. Di heman demê de pêwîste astengiyên weke zîndanîkirinê li ber çav bên girtin û pê razî bîn. Di demekê de ger hinek kes xwe reha bikin û xwe ji zanist û endamên laşê xwe derveyî zanist besepênin, wê demê bi xwe rastî nexweşiyan tê. Yan jî dibêje, '*Wel ilmu muwekil bîl kelamu el wecid muwekil bil xelis*'(Baba Tahir:1363, r. 18).

Ger em bi hûrî temaşeyî vê gotina Baba Tahir bikin, ew yek ji bo me eşkere dibe fikra vê gotina ji du ayetên pîroz hatî wergirtin ku dijî hev in û di wê ayetê de wiha tê gotin: "*Min erefe tale min sanîhî we min erefe kulu lîsanîhî*" Armanc ji 'ifr'ê ev eku 'ifr' di wateya xwe ya yekemîn de tê wateya zanist û dema bi zanist tê binavkirin, zanist di xizmeta zanist de ye. Mirov dikare mînakek diyar û berçav weke mînak bêne ku ew jî dîtina hestpêkirina bi wijdan û fêmkirinê ye. Ev jî dikeve çarçoveya zanîn û marîfetê. Di wateya duyemîn de jî 'irf' tê wateya dîtina 'şehud'. Lê bi dîtina hinek nivîskar, arif û helbestvanên din, ti dijberî di nava van herdu dîtinan de nîne. Mewlana Celaledînê Romî di vê derbarê de wiha dibêje:

*Girdiş kef ra çe dîdî muxteser* *Heytit bayed be dirya direngir*
*Enke kef ra dîd sirguyan bud* *Wanke dirya dîd ew heyran bud*
*Enke kef ra dît eyd dr sixin* *Wanke Dirya dît şid bî ma û min*

Ev tê wê wateyê ku zanist bi xwe fermanê bi zanist bike bi kiryarî û ziman wê yekê îspat bike. Lewra zêdetir li ser vê dîtinê radiweste û dibêje:

*Tu ragir meeniyî dir xatir efted* *Kedr salih meanî nadir eftid*
*Niyarî ez xeyal en ginşitin* *Dihî bîrun bigiftin ya nuştin*

Li vir ew yek eşkere dibe ku dema em bibînin 'şihud' hemû belge û endamên rêwî ji kar dûr dixe û red dike, di heman demê de hatiye zanîn ku 'wecid' rewşeke xweşiyê ye. Mînaka eşkere jî hestpêkirina bi wijdane bidest dixe yan jî di bînîn (şihud) a ciwaniya (cemal)hestpê hatî kirin de, dikeve berdest.

Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje: "*El ilmu tetrîqu wel wecid texrîqu wel heqîqe terîq*"(Baba Tahir: 1363, r. 18). Ev tê wateyê ku zanist dibe sedemek ji bo hewara bigihîne wicûd ku di vê rewşê de wecid dibe şewitîn û hewara xwe birina ber rastiyê. Bi wateyek din jî zanist û wecid eşkere ye û armanc ji rastiyê jî çavdêrîkirina hestpêkirina bi awayek ti tiştek di mirov de tiştek namêne. Ji ber ku di zanist de zana û tiştên hest pê tên kirin, rêya wan diyar û eşkere ne û peywendiyên wan diyar in. Ji ber di wecid de xudyet namîne. Ev nayê wê wateyê ku bi ti awayî rêwî hebûna rast nemîne, belkî rastî rewşeke heladinê tê. Lewra Baba Tahir

zêdetir li ser vê mijarê diçe û wiha dibêje; zanist sedemeke rêwî ber bi aliyê heq (Xweda) ve dibe. Di heman demê de zanist dibe sedemek ji bo ezmûnkirin û parzandinê. Ji ber ku zana timî bi şerkirina ligel nefsa xwe ve mijûle û dixwaze giyanê Xweda bikişin aliyê xwe. Ji bo giyanê xwe paqij bikin. Di vê rewşê de paqijkirina giyan, şerê nefs û şeytan paqij dibe. Di heman demê de hebûn (wecid) dibe sedemek ji bo xirabkirina şeytan ku zana dest jê berdaye. Rastî di nava çirûska agir de gur dibe, di derbarê vê şewitîn, zanist û hebûnê de Baba Tahir wiha dibêje û armanca xwe eşkere dike. Baba Tahir dibêje: "*El ilmu hereqe wel wecid hereqe wel heqîqe hereqe femen ehreqe el ilmu wefa we min ehreqe wel wecid sefa we min ehreqe el heqîqe tefa*"(Baba Tahir:1363, r. 18). Li vir Baba Tahir dibêje, dema rêwî nefsa xwe û şeytan dişewitîne, ev daxwaza zanist e. Ango dema kesekê xwest nefsa xwe û nefsa şeytan bişewitîne, wê demê soza ku ligel Xwedê dayî aniye cih. Bi heman awayî hebûn (wecd) jî sûtemeniyeke ku hemû amajeyên weke mal, serwet û nefsê dişewitîne. Li vir jî 'Micahid Fî Ellah' serî hildide û ev jî dibe serhildana mijarek din. Ew jî *'Fanî Fî Ellah'* e. Lewra ger kesek *'Baqî Fî Ellah'* be, li hemberî hemû rêwiyên din serdikeve. Ji xwe ger *'Baqî Fî Ellah'* nebe, dîsa dikare li hemberî rêwiyên din serbikevin. Mercê wê jî ew e ku 'Fanî' di nava rêwiyên din de nebe. Li vir mirov dikare 'Tifa' baldariyek be 'Biqae Ellah' bi wateya ku heqe û rêwî dihelêne, ji deryaya hevgirtinê bê derve.

Diyare zanist ligel ehlê îrfan cihê giringiyê bû. Lewra beşeke zêde ya arifan bi zanist ve mijûl bû û di heman demê de xelk ji bo vê yekê pal didan. Di vê derbarê de Baba Tahir weke pêşengekê vê rêyê xwe nîşan dide, behsa zanist, nûra zanist û şîroveyên zanist dike. Di heman demê de zanistê dike rêyek ji bo gihiştina nûra îlahî. Lewra di wê baweriyê de ye ku zanist tekane rêya derbaskirina mirov ji nefs û nefsa şeytan e. Ji ber vê yekê di vê çarçoveyê de bi dirêjî behsa zanistê dike û dibêje: "*El ilmu narellahe we wecidu nurullah femen xaife el ilmu ehreqe el nare we min xalife wecid xeyre el nur*"(Baba Tahir:1363, r. 18). Eşkereye zanist ligel Baba Tahir weke agirekê bû, agirek ku çi daxwazên efsaneyî û şeytanî hene dişewitîne û jinav dibe. Di heman demê de her kesê li dijî zanist raweste, wê di roja qiyametê de agirek wî bişewitîne. Yan jî kesê agirê zanist dîtiye û pê bişewite, wê zana bibe. Lê ger kesek dijberiya zanist bike û bi xwe jî agehdar be ku dijbertiya zanist kiriye, vêca di her pile û postekê de be, hest bi êş û nexweşiyan dike. Ji ber ku zanist weke agir e û dirîbît lê dişewitîne. Bi wateyek din jî zanist agireke û rêwî dişewitîne. Di vî warî de ev armanca Baba Tahir nêzî ayeta ku Xwedayê Mezin dibêje: "*Îne lezîne ettequ îza mesehum taîfu min el şeytanî tezekeru efa zamun mubsîrun*" Ev tê wê wateyê ku zanist agireke, aramgirtin û hêsan xwaziya rêwî dişewitîne. Lewra timî û bi berdewamî ji ber nekarîn û karkirina bi zanistê dilgiran in û di

rewşa şewitînê de ne. Vê yekê jî peywendiyên baş û zêde ligel hebûnê heye. Ji ber ku hem zanist û hem jî hebûn (wecid) nûra Xwedê ne. Li vir her rêwiyek peywendî bi zanist û hebûnê ve bike, wê demê ew nûra Xwedê dibîne û dikare bidest bixe. Ev nûr jî rêwî rastî serxweşiyê (sekr) dike. Berevajî jî her kesê dijberiya zanist û hebûnê bike, ev ayeta ku Xwedê dibêje wan digire nava xwe; "*El ilmu nura yeqzefu lahe fî qelbî mîn yeşae*" Ango kesên dijberiya hebûnê bikin, wê demê ew nûra zanist li wir diguhere û rêwî jî serxweşiya jê werdigire.

Baba Tahir mijarek din têne holê û ew jî beşa derketina Roja Xweda ye û dibêje: "El ame iştifaqu el wecdul ehraq"(Baba Tahir:1363, r. 18). Roj derketin rewşeke hatiye bidest xist. Ji têkeliyek ji xweşiya Xweda bi nexweşî û jê qut kirinê (*Hebe fîllahî bîl elemu feraq*)ev wê demê rû dide ku zana hest bi wê yekê kir ku heskirina Xweda bi şewitîn û negihiştina heskirina Xweda jêre çêdibe. Wê demê derdê dûriyê zana pal dide ku nûra rojê Xwedê di dilê wî de hil bibe û ev jî bi bandora hebûnê çêdibe. Ji ber şewitîna xemsariyên zanist e. Ji ber ku 'Zanist, hîkmet, hebûn û heq' xwedî pile û bandorên zêde ne. Di her çarçoveyekê de behsa bandora van hersê başane tê kirin, ger bi wateyek yan jî bi biwêjeke felsefî ji bo vê mijarê bibînîn. Wê demê mirov wê bibîne îrfan li gor cihê sûdwergirtinê wateyeke cor bi cor heye. Ji hinek aliyan ve bi wî awayî derdikeve ku rastî aliyê dikeve ber çavan (şihud) û rastiye. Ji hinek aliyên din ve jî îrfan bi xwe jî aliyê zanistî heye (marîfiyet) û derdikeve. Ev mirov digihîne wê armancê ku dema mirov digihe rastiyan, pileyek ji hebûnê derdikeve. Li vir jî Xweda bêyî kefiyê (kefye, hîcab) xwe ji bo dilê zanistvan û arifan derdixe û xwe tecelî dike. Li vir jî êdî cûdahî di navbera arif û marîfan de namîne. Ev ew rastiye ku Baba Tahir bi dûr û dirêjî behsa wê dike û armanca wî ye. Ev mijar ligel beşeke zêde ya zanayan cihê fikirînê ye. Secadî di vê derbarê de wiha dibêje, rastiya her tiştekê pile û meqamê aramiyê ye. Herwekî çawan rastiya mirov jî komkirina kemaliyata heman heywan û heman heywanên din e. Lê xwe di pileyeke bilindtir de nîşan dide. Kemal bi armanca meqamê kamilbûn û temamkerê wan e(Secadî:1379, r. 745).

Bi hûrbîniya fikra sofîgeriyê ew yek ji bo me derikeve holê ku rastî ligel sofiyan weke derketina zatê Xweda bêyî kefî, hîcab, dîtin (Teînat), helandin (Mihwe), piranî (Kirasit) û gumanê (Muhume) ye. Ev dîtin ligel bi vî awayî hatiye û dibêje; rastî di biwêj û gotinên şêxên sofiyan de ango zat û rastî jî, bi awayek din jî taybetmendî wê demê ava zat e û navê rastiyê jî taybetmendiye. Zatê herê pîroz ango Xweda û taybetmendiyên wî ye(Dêhxda:1346, r. 479).

Tessî di pirtûka 'el-Melie' de wiha dibêje: "*Rastî di bingehê xwe de tevahiya rastiyan e*" Wateya wê jî bi berdewamî agehdariya ji tiştên baweriya te pê tên e(Tessî: 1381, r. 368) Di

Xetma Lahûrî de jî wiha behs tê kirin; "*Rastî tê wateya biwêja Xweda bêyî kefî û hîcabatê*"(Xetma Lahurî:1378, r. 2847).

Xewace Ebdullahê Ensarî di pirtûka 'Sed Meydan' de dibêje, yan divê hemû rê rast bin, her tiştê rast be bi awayek giştî rast in(Hîrewî:1375, r. 183). Bi dîtina arifan jî, rastî tekane, resen, tenê ye û nabe dû. Tişta rast reha be tenê Xweda bi xwe ye. Her çi tiştên din ên hene, li derdora vê beşê dizivirin(Şerîetî:1372, r. 74). Qeşeyrî di pênasekirina rastiyê de wiha dibêje, rastî dîtina Xwedê ye. Rastî hewldana bijardekirinê ye û rastî jî dîtina rastiyê ye. Ango dîtina rastiyê ew e ku ya ji bo me hatî dîtin. Ev bi wateya ji bo me hatî diyarkirin e(Quşeyrî:1385, r. 127).

Hoceyrî di pênasekirina rastiyê de wiha dibêje: "*Rastî ji diyarkirina vegerê pêktê, nayê redkirin û nabe jî bê kirin. Ev rastî ji despêka dirûstbûna mirovahiyê ve (Adem) û heta dawiya cîhanê wê deshilatdar be û wê deshilata wê bimîne. Rastî ragirtina Xweda ye û parastina pakiya Xweda ye"*(Hoceyrî:1386, r. 559-560). Bê gûman kesê/a li pey rastiyê bigere û armanca wî rastî be, divê ji bo gihiştina vê armancê xwe bi kuştin bide. Ev ew rêye ku Mensûrê Kurê Celal hilbijartiye û di nav derbas bûye(Hoceyrî:1386, r. 127-128).

Baba Tahir di vê derbarê de zanist, rastî û hebûnê bi hev ve girê dide û bi dîtina îrfanî wiha dibêje: "*El ilmu yehmilu wel wecidu yetxilu wel heqîqe tedînehu wel muerefe tunise*"(Baba Tahir: 1363, r. 18). Divê ev yek bê eşkerekirin ku 'Zanist û Hebûn'ê re pileyeke bilind heye. Herwiha hebûn bi xwe rastî û marîfete jî. Lê li vir rastî nayê wê wateyê ku ya me berê bal kişandî ser. Belkî li vir armanca rastiyê, dîtina şûnwarên rastiyê ye û ev jî yekemîn pileya rastiyê ye.

Zanist peywendiyek baş ligel nasîna rastiyê heye. Herwekî çawa peywendî bi marîfetê ve jî heye. Eger em bi hûrî temaşeyî fikrên Baba Tahir bikin, derdikeve holê ku zanist peywendî bi bêdengiyê ve heye. Bêdarî bi wê wateya ku Îbn Erebî dibêje: "Ji wê yekê pêktê ku dema hebûn (wicud) û rêwî (salk) di bin ronahiya nûra Xweda de dihele û namêne, wê demê di dema dûbare serhildan û jiyana Xwedayê Mezin de vê carê hebûneke heta hetayê werdigire. Vê carê hebûneke êdî ji ber tîrêj û nûra zatê Xweda de nahele û jinav naçe.

Lê ligel xelkê sofî cûdahî di vê rewşê de hene û Secadî di vê derbarê de wiha dibêje: "Sofî di rewşa hişyariyê de ne, lê xwe weke xerîb dibîne. Tevî ku em wisa dizanin, hemû ligel wê yekê ne û ev jî wê yekê radigihîne ku di vê rewşê de sofiyê bê bêdar (Kesê şev û roj nerazin)ti giringiyê nabîne di nava civakê de be"(Secadî: 1380, r. 264) Lê evbêdariya sofiyan

dîtinên cûda li ser hene, hinek bi karek baş û jîr bi nav dikin û bi erênî behsê dikin. Hinek jî bi karek xirab û neguncayî bi nav dikin. Bi wateyek din jî hinek bêdeshilatiyê bi nêzîkbûna ji Xweda binav dikin û hinekên din jî vê hîcabê datînin û ji bo pê bigihin zatê Xweda. Lewra em pêwîst dibînin ku çend dîtinên cûda di derbarê bêdeshilatiyê de bênin û piştre jî bi Baba Tahir ve peywendîdar bikin. Dîtinên wî yên di derbarê zanist û bêdarî de eşkere bikin. Quşeyrî di vê derbarê de wiha dibêje, hiş anîna fikra xwe û xwedî zanist û piştî cîhana nediyar hestê xwe têne ser xwe(Quşeyrî:1385, r. 112).

Hocuyrî dibêje, "*Bêdarî ji bêmiradiyê pêktê*"(Hoceyrî:1386, r. 283). Bi dîtina Cîrcanî du beşên bêdariyê hene û di vê derbarê de wiha dibêje, bêdariya xeflet û bêdariya xelafet. Bêdariya xeflet tê wateya bêdariyeke nêzî xefletê ye û weke peywendiyeke ji bo gihiştina zatê Xweda ye. Lê bêdariya xelafet bêdariyeke peywendîkiriye, bi dostî û rêya herî eşkere ya gihiştina ji bo dîtina hebûna Xweda ye(Circanî:1377, r. 119).

Baba Tahir wiha dibêje: "*Mîn esteemele el ilmu bîl ilmu xelese emelehu we mîn esteemele wel îlmu bîl muerefe hebete emelehu*"(Baba Tahir:1363, r. 20). Ev yek girêdayî dîtina Baba Tahir û berê ye ku tê wê wateyê ku paqijbûna kiryaran ji guman, encamên nefs û karkirina zanist di meqamê marîfiyetê de bikaraniye ku arif ti kiryarekê li ber çav nagire di nava zanista Xweda de winda bûyî be. Yan jî ji serxweşî û hebûnê de. Lewra Baba Tahir zêdetir li ser vê dîtinê diçe û dibêje: "*El ilmu cezebnî faqamenî el şatîe el behru el wecid ew qefenî fîl ehrî weselemnî lîl xeriq faesteenit fî weset el behir. Bil ilmu fema encanî we xelebe el wecid ela femaze edna îla xereqa fetebet elxelase fema xelesnî îla cehel*"(BabaTahir:1363, r. 20). Bi wateya arif, zanist rewşa xwe eşkere dike ku bi awayekê agehiya wî ji rêwî hebe. Ango li ser reftar û exlaqê wan kar dike. Ji ber ku zanist nasîna eşkereyan e, yan nasîn û zanîna nimûne zanist bi hest û wijdan e. Ev jî li kenarê deryayek yektayî radikêşe. Lê têgihiştina mînakên eşkereyên bi wijdan, rewşa serxweşî û hebûna ji bo rêwî (selk) têne pêş. Ev serxweşî, wecdeya arifî û zanistvan di rewşa nefsê heywanî têne derve. Di heman demê de dibe nava cîhanê hebûn û wehdetê de. Di bêdariyê de nuqmê deryayê (Hebûn) dibe. Ji xwe ger ev rewş agehdarî zanista xwe be, wê demê zêdetir û hêsantir diçe nava deryaya hebûnê de. Ji ber ku "Bi taknasîna xweda, piştî selmandina (îspatkirin) wî, ev weke mijara yekemîn a Xwedanasînê tê hêjmart. Yek ji mijarên giring ên felsefeya Îslamê, bi awayek giştî jî takperestî (Tuhîd) di felsefeya Îslamê de ji sê arasteyan pêktê. Takperestiya zatî (Tuhîd zatî), takperestiya taybetmendî (Tuhîd sifatî) û takperestiya kiryarî (Tuhîd Ef'al)"(el-'îlm el-Hewa: 1376, r. 406).

Takperestî ligel arif û sofiyan ew e ku çav ji bilî yekê ti tiştek din nabîne. Dil ji bilî yekê nezane û ji bilî yekê jî neyê nava çarçoveya zanistê de. Dema takperestiya sofîgeriyê bigihe lûtkeyê, zilam lal dibe. Dema bandora takperestiyê bê holê, wê demê ziman rasterast dest bi axaftinê dike(Hêrewî:1375, r. 327).

Dema ji bo pêngav avêtina ber bi zanist, rastî û takperestiyê ve diçe ji zanistê destpê dike. Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje: "*el illim şer el heq*"(Baba Tahir:1363, r. 20). Diyare Baba Tahir gelek eşkereyî behsa mezihaniya zanist kiriye û gihandiye pileyek ku weke şirîkê rastiyê ditiye. Ev dîtin ligel xelkê îrfan gelek bi kêmî tê dîtin. Kêm arif hene ku karîna wê yekê hene ku bikarin dîtinek wisa bênin ziman. Ango Baba Tahir yek ji helbestvanên arîfe ku ji ber zanist û jîrîtiya xwe, kariye gelek dîtinên cûda di derbarê zanist, marîfet û takperestiyê de bêne holê. Ev tê wê wateyê ku Baba Tahir gihiştiye pileya kamilbûna xwe. Lewra mirov dikare bêje ku zanist weke nêçîrê ye û nêçîra xelkê dike. Herwiha dibêje: "*el illmû seyd wel îşare qeyd*"(Baba Tahir:1363, 20). Baba Tahir li vir balê dikişîne ser wê yekê ku zanist weke nêçîrvaniye û divê agehiya me ji wê yekê hebe em çawa ligel tevbigerin. Ji ber têgihiştina ji mînakên ranistê bi awayek zû li ber çavê rêwî winda dibe. Lewra pêwîste mirov bi hûrî ligel tevbigere. Ew jî zanista cîhanî yan jî roja qiyametê be. Herwekî Baba Tahir li vir behs kirî û dibêje: "El-ulum kulluha xeyr, wel heqîqe keha wehum wel mearif kulua şeyme" (Baba Tahir: 1363, 20) Li vir dîtina Baba Tahir wisaye ku zanist çi zanista dinyayî û çi jî zanista roja qiyametê, hemû jî hewldana ji bo nasîna kesên hest pê dikin. Di heman demê de zanist nirxandin, ceribandin û ezmûne jî. Weke Baba Tahir dibêje: "*el ulmul îxtar*"(Baba Tahir: 1363, r. 20). Ev jî her weke mînaka me berê behs kirî, tê heman wateyê. Divê ew zanista di dilê mirov de heyî bê paqijkirin, ji hemû tiştên pîs û heta tiştên bûne cihê gumanê jî. Di heman demê de wilayet kilîla zanist, biheşt û cenetê ye. Êdî mirov bi xwe dikare kîjan zanista bixwaze hilbijêre. Ji ber ku zanist ligel Baba Tahir diyarkiriye û her kes li gor daxwaza xwe hildibijêre. Lewra Baba Tahir dibêje: "*El ilm îxtiyar*"(Baba Tahir: 1363, 20), Dîsa bi dîtina Baba Tahir, rastî ji despêkê ve pileya yekemîn û duyemîne jî û hilbijartina rastî ya ji bo mirov e. Ev jî nêzî dîtina Huceyrî ya ji bo nasandina rastiyê kirî. Huceyrî dibêje: "*Heq ji rastiya diyarkirî ya redkirin, vegerandin neyî û nayê kirin pêktê. Ev rastî ji despêka dirûstbûna Adem û heta nemana cîhanê, timî deshilatdar e û xwediyê deshilata xwe ye*"(Huceyrî:1386, r. 559-560).

Baba Tahir hewlda ye ku zanist bi hemû rewşên meqam û zaraveyên îrfaniyê ve girê bide. Lewra li vir zanist û micahide bi hev re behs dike û dibêje: "Mîn wecede hesse, fî mee'ne îşare, ewere nefsuhu fî heaîq el îbare, feîlmuhu dunyayî" (Baba Tahir:1363, r. 20). Ev

jî tê wateyê ku dema kesek li ser hiş û fikrê xwe be û çi dema gihişt pileya xwe ya rastîn, ew bi xwe agehdar dibe. Zanista wî kesî jî digihe şax û mezhebê rastî yê zanista cîhanî. Bi wateya ku ji wê zanistê de datîne û wê zanistê ji bo xwe radikêşe.

Baba Tahir li vir zanist û rastiyê bi hev re girê dide û dibêje: "*el ilmu daî el heqîqe daî el heq, we yecîbul ceyb bidaî el heq*" (Baba Tahir:1363, r. 21). Zanist rêwiyeke ber bi aliyê rastiyê ve. Ger rêwî di nava banga rastiyê de ku rastî rastiye, êdî ligel beşdar dibe û dibe beşeke rastiyê. Dîsan Baba Tahir balê dikişîne ser mijarek din û dibêje: "*El ilmû resul wel heqîqe isul wel heqû siûl*"(Baba Tahir:1363, r. 21). Herweke me berê bal kişandî ser, zanist di pileya zanyariyan de eşkere ye û di nemana eşkerebûnê de mil bi mil ligel Pêxember e. Şanê (mil) Pêxember jî deshilata Pêxemberatiyê heye. Pêxember ji aliyê Xwedayê Mezin ve ji xelkê hatiye şandin. Ji ber ku zanist her weke Pêximber e, ango zanist heman rolê Pêximber dileyîze. Di vê navberê de rastî di pileya yekemîn a mezhebê de pileya herî bilind a rastiyê ye û dikeve çarçoveya meqamê rastiyê de.

Peywendiyên zanist û rasbêjiyê mijarek dine ku Baba Tahir gelek li ser rawestiya ye û helwesta xwe li ser aniye ziman. Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje: "*el ricuu bil ilmu sadiqîne*"(Baba Tahir:1363, r. 21). Ev tê wê wateyê ku dema kesek di xefletê de be, di cehil û nezanînê de be, dûbare ber bi zanist û xwendekariyê ve vegere û biçe, wê demê weke keseke rast tê hêjmartin. Ger li ser wê zanistê berdewam be û li ser şopa wê neçe, ango rêwî dema bi awayek rastbêj tê danîn, destê xwe ji cehil vekişîne û ber bi aliyê zanist ve biçe û jê gavde paş nebe. Baba Tahir gelek bi hûrî bal kişandiye ser vê mijarê û giringiyeke zêde dayeyê. Di gelek cihan de bal kişandiye ser vê meseleyê. Di heman demê de kesên ji zanist û rastiyê vedigerînin, bi dîtina Baba Tahir kesên bi berdewamî di çarçoveya zerermendiyê de ne.

Baba Tahir bal kişandiye ser vê mijarê û wiha dibêje: "*Wel ricuu bil heqîqe îlel ilmu feel xarisîn*"(Baba Tahir:1363, r. 23). Tê wateya ku her rêwiyek dema gihişt pileya rast, lê negihiştibe pileya herî bilind a meqamê heqê teala, vegere ji bo mezinahî û deshilata mezinahiya xwe, ji ber vê sedemê kiryara nefsê zindî û nagihe rastiyeke temam. Ji bo bigihe meqameke zanistî û di meqamê zanistî de namîne. Ger nefs beşdarî tevger û encama rêwî neke, ev beşdarîkirin û kêmkirina herduyan dibe sedemê rêwî zerer bibîne. Ger bi vî awayî temaşeyî armancên Baba Tahir bê kirin, wê demê vegera ji bo rastî yan jî meqamê rastî ji bo aliyê zanist, dibe dibe sedemê rêwî zerer bibîne. Bi dîtina Baba Tahir dema arif bixwaze bigihe pileya kemaliyê, divê ji pileya rastî û maf kêm neke. Herwiha dibêje: "*Wel ricuu bîllahî îlel ilmî birewe el heqîqe feil el arifîn*"(Baba Tahir:1363, r. 22). Bi dîtinek sade, ev

dîtina Baba Tahir tê vê wateyê, "*Vegera ji rastiyê bo zanist û bêyî kêmkirina pile û payeya rastiyê. Ew jî karê kamilbûna arif e*" Lê di wateyeke kûr a îrfanî de armanca Baba Tahir ew e ku geşta dawiyê ya rêwî vegera ji bo çarçoveyek ligel Xweda ye. Lê dema ev veger bi dîtina rastiyê be, ti tiştekê ji pile, meqamê rastî û mafiyê kêm neke; di vê demê de encam û reftarên arîfan temam in êdî bigihin pileya kamil an na.

Baba Tahir li cihek din jî diyar dike ku ji bo rizgarbûna ji nezanîn û paşketinê, divê em xwe bi zanistê ve girê bidin. Di vê derbarê de wiha dibêje: “Min teeleqe bil ilim”(Baba Tahir:1363, r. 22). Ev tê wateyê ku her kesê meqamê zanist derbas kiribe û rizgar bûyî be, ew kes çi di meqamê texlîdkirinê be yan jî hin kes bin gihiştÎbn meqamê çavdêrîkirinê, êdî ew kes rizgar bû. Tevî ku ji rastiyê vegeriya be aliyê zanist û zerer jî dîtibe.

Baba Tahir timî kesên xwedî zanist weke serkeftî û rizgarbûyî bi nav dike, lewra di vê derbarê de wiha dibêje: “*Min teeleme bil heqîqe ella*”(Baba Tahir:1363, r. 22). Ev bi dîtina îrfaniyan tê wê wateyê ku her kes an jî her rêwiyê ku gihiştibe meqamê rastiyê, êdî ew kes wê serbikeve yan jî di meqamê zanist de serkeftî bûye. Ji ber rastî rêyeke ji bo çûyîna ligel Xwedayê Mezin.

Bi dîtina Baba Tahir her tiştek zanist û bi taybet jî mamelekirina ligel karek dijwar e. Ji ber ku ger zanist ber bi rastiyê ve pêngavê bavêje, wê demê karek baş e. Berevajî jî dibe sedemê malwêranî, kavilbûna kar û xwediyê wê zererê dibîne. Herweke dibêje: “*Qebûl el ilim bimuwafaqa el heqîqiye rechan u qebul el ilim be mufeqee el nefs xeyren*"(Baba Tahir:1363, 23). Eşkereye ku armanca Baba Tahir ew e ku ger em zanist qebûl bikin û ber bi aliyê rastiyê ve bê, wê demê emê serkeftî bin û ber Xweda ve biçin. Berevajî jî ger ber bi aliyê nefsê pêngav avêt, wê demê wê ji bo me bibe sedemê zerermendî û zererê bigihîne me. Ji ber ku ger em zanist bi rastiyê ve peywendîdar bikin û tiştên ku nabe bên redkirin, wê demê nefs jî tamê werdigire û xwe ji zanistê vedikişîne. Ev di her tiştek din de bi hêsanî nakeve destê mirov, ji bilî ku zanist û rastiyê bi hev re bikarbênin. Lewra gelek caran Baba Tahir dibêje: "*El ilim qeyd el merîd miftahil ilim*"(Baba Tahir:1363, r. 23). Armanca vê yekê ew e ku dema kesek di rewşa armancdar de be, wê demê di meqamê texlîdkirinê de dimîne. Lê dema kesek di meqamê çavdêrîkirinê de be û pêgihişti be, wê demê ew dibe xwediyê zanist. Baba Tahir di wê baweriyê de ye ku dema kesek xwediyê zanistê be êdî nefs nikare li beramber serbikeve û li hember bibe deshilatdar. Di vê derbarê de wiha dibêje: "*El Sadiq la yezîl bîl ilim weleyatenezilil cehil*"(BabaTahir:1363, r. 24). Li vê derê armanc jê ew e ku rêwiyê rastbêj dema zanist bidest dixe, êdî nefs nikare li hember serbikeve, wî/wê ji rê derxîne û ber bi aliyê

nezanînê ve bibe. Berevajî jî ger rêwî nerastbêj be, wê demê zanist û zanyarî dikevin destê nefsê, wê demê jî rastî xirûr (gurur) û nefsê dibe. Yê armanca rast hilbijêre, dikeve pileya wîlayetê. Baba Tahir wiha dibêje: "*el ilim bî exfîlîhî cehlu wel cehlu bîl meerîfîhî ilmun*"(Baba Tahir:1363, r. 24). Ango armanca Baba Tahir gelek bi eşkere derdixe holê û bi dîtina wî, ger mirovek xwediyê zanistê be, lê ne bêageh û di xefletê de be, wê demê wê yekê ye ku di nezanî û cahêltiyê de dijî. Lê berevajî ger nezan û nexwendekar bî û xwediyê marîfeyeke baş bî, wê demê tû xwediyê zanista herî başî.  Bi wateyek din jî ev wate ligel aliyê xelkê îrfanî gelek navdar, belav û meqbûl bû. Ew jî ew e ku kesek di meqamê cihnişînê de bû û gihiştibû alema bilind. Lê bi mercê di xeflet û nezaniyê de be, ew jî ew wîlayeteye ku ti sûdekê nagihênê. Ev jî weke wê yekê ye ku nezanek nadir bî, ango her kesek çend zana be, lê negihiştibe meqamê wîlayetê; wê demê ew kes nezan û cahil e. Ger agehiya kesekê ji zanista Xwedê nebe, di alema bilind û giringiya zanistê de ew jî kesek nezan e.

### 3.2. Di Derbarê Marîfe De

Marifiyet yek ji taybetmendiyên jiyanê ye. Bi wateyeke din jî jiyan bêyî marîfiyet ti biha û giringiya xwe nîne. Ev jî dibe kilîlek ji bo em bêjin, jiyan tejî çalakiyên civakî, çandî û bihayên miroviye. Marîf jî yek ji dirûstbûnan e, lewra nabe li derveyî marifeyê em ji bilî marîfetê behsa civaka mirovatiyê bikin. Ango marîfet û civak, bi hev ve girêdayîn, ji hev nayên cûdakirin û xwediyê sîmayeke giştî ne. Her çendî marîfet takekesiye, bi wan ve derdikeve." lê bi ti awayî ne diyardeyek kesiye. Ji ber ku kesê xwediyê marîfetê, endamekî civakê û girêdayî sîstemeke civakê ye. Vêca wê sîstemê ji bo te derfet diyar kiribe wê cor û para marîfetê wergirî, li vir jî nabe mirov rolê takekesî yê di dahênan (îcatkirin) û zêdekiirna marîfetê de paşguh bixe. Lê bi giştî rewşa civakê, marîfetê dide kesan(Mîran:2012, r. 8).

Baba Tahirê Hemedanî weke helbestvan û arifeke diyar ê serdema xwe bi berdewamî di nava civaka xwe de hebûnek diyar û berçav hebû. Çi zanist û marîfeta hebû, peywendî bi kevneşopî û nêrîna civaka serdemê ve hebû, tevî ku li ser hinek diyardeyan dîtinên cûda jî hebin. Baba Tahir di vê derbarê de di 'el-Kelîmat'ul-Qîsar' dîtina xwe li ser marîfetê eşkere kiriye û dibêje, "*El ilim delîlûl merîfe yedulu elîha*"(Baba Tahir:1363, r. 15). Bi dîtina Baba Tahir mezinahiya fêrkiirn û fêrbûnê çavkaniya xwe ji wê yekê werdigire ku zanist û marîfet di pileya herî bilind a kiryar û taybetmendiyên Xwedayê Mezin çavkanî wergirtibe.

Ev jî ji aliyê gelek arif û sofiyan ve dihat pejirandin. Marîfe, mezinahiya fêrbûn û fêrkirinê ji wê yeke eşkere dibe ku zanist û zanyarî ji pileya herî bilind a kiryar û

taybetmendiya Xweda çavkaniya xwe werdigire. Xezelî di derbarê mezinahiya zanist û marîfetê de wiha dibêje, mercê fêrkirina zanistê bi arasteya sernizimkirina ji bo Xwedayê Mezin be. Di aliyekî din de jî dibe cihnişînê Xweda. Ev cihnişîn ji bo wî kesî dibe meqamê herî bilind. Bi vî awayî jî Xwedayê Mezin zanist û zanyarî di dilê wî kesî de bi cih kiriye(Xezalî: 1386, r. 46). Di despêka derketina ola Îslamê de, nasîna sofîgeriyê ligel zanist despê dike û di demekê de di fîltera şerîetê derbas dibe. Di sedsala 4 û 5 a koçî de, gelek arif hebûn zanista şerîetê derbas nekirine û wan bi xwe îtiraf bi vê yekê kirine. Di navendê de jî Ebû Hesenê Xirqanî mînaka herî diyar a wan arîfan bû(Bertlîs: 1356. r. 85).

Zanist û aqil li jora hemû wêjeya Farisî bû. Ev jî bi derkeftina fikrê sofîgeriyê ber bi paş de çû. Êdî fikra 'Fîrdewsî' navdar bû. Hinek sofiyan xwe fêrî zanist û marîfetê kiribûn, lê bi başî pênegihiştibûn. Ebû Seîd Ebûl Xeyr di vê derbarê de wiha dibêje, pêngava yekemîn a sofiyan dirandina defter û ji fikra xwe birina zanist e(Xenî:1383, r. 59). Xezalî di pirtûka "Tehafutu'l Felasîfe" de dîtina xwe wiha têne ziman; "*Sofî ji bilî rewşa xwe ya niha, bi xwe li ser çi tiştekê na axive. Bersiva sofiyan ji bo mijara zanist û felsefeyê cûda ye. Lê zana keseke di derbarê rastiyê de diaxive. Bi wî awayî têdigihe û ji bo zanistê temaşeyî rewşa xwe ya kesî nake. Ev jî wê yekê digihêne ku dema pirsyarek li ser zanista şerîet û marîfiyetê ji sed sofiyan bikî, tû bersivên cûda werbigirî. Lê dema zanist tîrêjan dide û tav dideyê, wê demê hemû cihekê digire, hîcabê derdixe û çend perdeyan dişewitîne*"(Sirûş:1379, r. 55).

Baba Tahir gelek bi eşkere û vekirî dîtina xwe ya îrfanî li ser marîfetê aniye ziman û dibêje: '*El merîfe wecede el tefzîl*'(Baba Tahir: 1363, r. 25) Di heman demê de marîfiyet ji hûrkarî û dîtina diyar e. Baba Tahir di berdewamiya ser vê mijarê de wiha dibêje: "*Merîfel cehlu ilmî*"(Baba Tahir: 1363, r. 25). Nezanîn li ser nefsê tê hêjmartin û ger têgihiştinên nefsê bêyî zanist bin, her wê li hemberî nezaniyê serbikeve. Di demekê de ev nezanîn û têgihiştin bêyî agehdariya zana nabe. Lewra nasîna yên di gewde yan jî derveyî gewde de weke zanist tên hêjmartin, ji ber ku ger zanist li beramberî marîfetê neyê bikaranîn, wê demê wê zanist li hemberî marîfetê bibe deshilatdar. Berevajî nezanînê ku bi awayekî giştî ger bê zanist be, dîsan her nezanîneke din e. Lewra Baba Tahir dibêje: "*Tihîr el arif fî weqit nîhayetîhî efle hale sime edehşet xiruc min hal bîxeyr ruîyetil hal fehuwe fî haletil heyat, şahid lîhalîhî muteeliq bîwicudîhî we fî hal edheşihu xaîb en halîhî weclidû cewde feîza bîhet el arif fîl meydan edehşe sar bîlahal wela rûîyetû wicûd wela îşhad xîbûye wela yekûne lehû fîl hal hicce wela fîl wicûd muhece feyebqe bîlaha wela rûiye wela wicûd we zalîke nihayetil behte*"(BabaTahir:1363, r. 25). Baba Tahir rewşa rêwî dike çar beş. Rewş (hîwe) li beramberî mirinê (mut) bijarde ye. Di vê rewşê de rêwî bi xwe agehiya wî ji rewş û hebûna (wicud) wî

heye. Rewşa seyr (Ecêb, Tehîr) bûn, ev rewş jî ne despêkê û ne jî di dawiyê de rêwî ji rewş û hebûna xwe ne bê ageh e. Agehiya wî ji rewş û hebûna wî/wê heye. Ger rêwî di dema seyr de agehiya wî ji wî bi xwe nebe jî, her agehiya wî/wê ji hebûna wî/wê heye. Rewşa dawiyê jî rêyeke helandinê ye yan jî yek ji rewşên dawiyê yên ecêbmayînê ye. Di vê rewşê de rêwî ji rewş û hebûna xwe xafil dibe. Di rewşê de rêwî bêyî rewş û hebûna xwe dimîne û heta rewşa helandinê, ev jî rewşa dawiyê ya helandinê ye.

Ger bi vî awayî be rewş di çarçoveya marîfetê de bandorekî diyar û pantayiyekî berfireh dagir kiriye. Ev yek ligel Baba Tahir jî gelek eşkere û zelal e. Lê rewş ligel ehxê îrfan; "Biwêjeke arif û sofiyan gelek sûd jê tê wergirtin. Ev rewş ji xeybê ve û dilê mirov bi wê yekê peywest dike. Di bingehê xwe de ev rewş ji wateya 'Hul' hatiye kutê wateya cûdabûn, guhertin, têkçûn û hwd."(Şerîet Medarî:1372, r. 617).

Rewş di warê wateya peyvê de, ji cîhana xeybê ber bi xwediyê dil ve tê û di rewşa mirovbûnê de mirov derdixe û diguherîne(Nurbexş:1378, r. 262). Tişta di bin bandora îrfaniyê de li ser diyardeya ruhanye hatî, tê wê wateyê ku rewşekî xeybî bêyî hewl, armanc û sînor e. Bêyî deshilata mezhebiye, belkî ji aliyê Xwedayê Mezin ve bi dil û derûnê rêwî tê û diguherîne. Pênaseya herî diyar û sade ya ji aliyê sofiyan ve li ser rewşê hatî nasandina Îzedîn Mehmûd Kaşaniye. Kaşanî wiha dibêje, ligel sofiyan armanca rewşê îlhamek nediyar û xeybî ye. Di cîhana jor de (Alim Elwî) hinek caran alternatîfa rêwî heye, bi berdewamî tê û diçe, heta ku rêwî tê guhertin. Di çûyîn hatinê de heta wê asta ku rêwî ber bi aliyê Xwedê ve diçe(Kaşanî: 1385, r. 89). Di pirtûka 'Resale Qesîre' ya ji zimanê Zinûn el-Misrî hatî wergirtin, rewş wiha tê pênasekiriye. Di derbarê îrfan de pirsyar ji Zenûn kirine, wî jî di bersivê de wiha gotiye; li vê derê bû û çû(Quşîrye: 1385, r. 127).

Baba Tahir rewş, zanist, marîfet û xeyb bi hev ve girêdaye û weke tiştek ji hev neyê cûdakirin datîne. Ji ber yek bi yek peywendiyên dîrokî û domdirêj ligel hev hene. Lewra dema rêwî meqamekê derbas dibe û tevî derbasî pile û meqamek din jî bûye, lê hê jî bandora meqamê din li ser heye. Lewra Baba Tahir jî gelek bi zelalî li ser vê mijarê rawestiya ye, fikir û ramanên xwe di derbarê marîfet, zanist û rewşê de aniye ziman. Wekî bi xwe balê dikişîne ser û wiha dibêje: "*Esbabu wel meaîf fîl heqîqel merîfe hecebe*"(Baba Tahir1363, r. 26). Baba Tahir bi eşkereyî di vê derbarê de wiha dibêje, sedemên nasîna mearif di derbarê rastiya marîfetê de, bi xwe rastiya marîfetê ye. Ev jî hicab arif a di derbarê dîtin û marîfetê de. Ev jî rastiya marîfetê ye ku armanca wê di armancên marîfet, zanist, kiryar û çalakiyan de ye. Ev jî

tê wê wateyê ku kesek di meqamê dîtinê (şihud) de fikir û bawerî li ser zanist û kiryarê hebe, ew jî bo dîtinê paşketiye. Ev tê wê wateyê ku arif di meqamê dîtinê de bû.

Baba Tahir wiha dibêje: "*Heqîqel merîfe zatul heqîqe hecebe*" (Baba Tahir:1363, r. 27). Ev jî tê wateya ku ger arif di meqamê xwe de navdar be û çavê wî li ser dîtina wî be, wê demê dibe perdeyê (hîcab) navdariya xwe.

Baba Tahir her di warê marîfet û hîcabê de wiha dibêje: "*Zat el heqîqe fî merîfe zat*"(Baba Tahir:1363, r. 27). Ev jî tê wateya ku rastî bi xwe li ber çavan e, peyameke pileya marîfeya Xwedayê Mezin e û hîcabat jî zatê rastiyê ye. Ev ji bo wê armancê hatiye bikaranîn ku armanca Baba Tahir ew e ku bêje, arif di pileya marîfetê de namîne, belkî marîfet dibe perdeyê (hîcabê) arîfê.

Yan jî dibêje: "*Merîfe zat lîl merîfe hecebe*"(Baba Tahir: 1363, r. 27). Ev tê wê wateyê ku marîfeta bi xwe, her ne ew marîfete ku dibe marîfeta hîcab. Ev jî heta wê astê ye ku arif ji rewşa xwe û marîfetê agehdar e. Bi wateyeke din jî marîfet bi xwe hîcabê danîne ser marîfetê, ji ber ku di marîfeta xwe de ji bo arif marîfet namîne û dema marîfeta perdekar (micub) amade dibe.

Baba Tahir, marîfet û tekezîkirinê têne pêş û dibêje: "*Wel hecebe kuluha mearîfun wel mearîfu kulaha înkar*"(Baba Tahir: 1363, r. 28). Bi wateya hîcab û zanyarî dÎbn sedemê marîfeya rêwî, ev nayê wê wateyê ku rêwî zanyarî û marîfet nebe. Dawiya her meqamekê dibe hîcabek û meqameke li jortir jî, ji hemû meqamên din e. Bi vê yekê jî heta rêwî marîfeteya xwe bibîne, ji zanyariyan dûr dikeve. Baba Tahir dibêje: "*Nisiyanîl heq bîl merîfe twhîdû zikir el heq bîl cehlî kufru*"(Baba Tahir: 1363, r. 28). Ev jî tê wateya ger rêwî ji ber marîfetê yan jî rewşa marîfetê, yan ligel marîfet, rastî û marîfet, xwe û marîfeta xwe winda bike û di bazinê rastiyê de bizivirîne ku ji ber zikrê heq bi nezanî yan jî di rewşa nezaniyê de ji ber nefs û têgihiştina ji nefsê, ew kifre û dapoşîn heq e.

Bi baweriya Baba Tahir heta ku rêwî di meqamê marîfetê de derbas nebe û jê fêm neke, wê demê hê jî di rewşa bijartinê de ye. Herwekî dibêje: "*Leyse lîl merîfî xutyar*"(Baba Tahir: 1363, r. 28). Ev tê wê wateyê ku heya rêwî di meqamê kemal de derbas nebe, wê demê hê jî tê zanîn ku di qonaxa hilbijartinê de ye. Dema ji marîfetê jî gihişt meqamê kemaliyê, wê demê jêre eşkere dibe ku hilbijartina wî ya derbasî rastiyê de ye. Herwekî wiha behs tê kirin; "*Wema teşauna îlla en yeşeellah*"

Baba Tahir di derbarê rastiya marîfetê de wiha dibêje: "*El merîfel hicizun enil merîfe*"(Baba Tahir: 1363, r. 28). Heqîqet rastiya marîfeta zanista heq e. Ev tê wê wateyê ku rêwî ji marîfeta xwe bêzar dibe. Yan jî bi wateya ku rêwî wateya marîfetê dide xwe, marîfetê dibe binê deryayê newekî deryayê bi xwe. Yan jî li cihek din di derbarê marîfetê de wiha dibêje: "*Ewel merîfe teshîsul îsmî we ewsetuha îsbata sîfe mîn heyfsul mewsuf we axîruha el cehlu bî heqaîqîha*"(Baba Tahir: 1363, r. 30). Ev jî tê wê wateyê ku rêwî ji despêkê ve reftarê xwe li ser wateya naveroka rastiyê ya di hebûna xwe de bi hest û dîtin hest pê kiriye. Bi wateyeke din jî divê rêwî marîfetiya xwe ji nav û taybetmendiyên rastiyê werbigire û çavkaniya xwe ji wê yekê werbigire.

Dîtina Baba Tahir ji ya hinek arif û nivîskarên di warê arifiyê de cûda ye û dibêje: "Kenellahu wela şey ûn merehu wekun ellahu wela şey un meehu" (Baba Tahir: 30: 1363), Xwedayê Mezin despêkê ti tiştek ligel nebû û di dawiyê de jî wê tiştek ligel nebe. Lê ligel hinek arifên navdar jî mirov di pileya kamil de dibe beşek ji gewde û giyanê Xweda. Ev dîtin ji aliyê Bayezîd, Îbin Erebî, Celal, Tellesanî û Ebdulkerîm Cîlî ve dihat pejirandin. Lewra Baba Tahir xwestiye vê yekê li gor dîtina xwe eşkere bike û herwekî me li jor bal kişandî ser. Lewra Baba Tahir hê zêdetir armanca xwe eşkere dike û wiha dibêje: "*Fewcûdul xelqî beynu hallen delaîl we esbabil merîfe*"(Baba Tahir: 1363, r. 30). Hebûna mirov di navbera ezel û ebedê de ye, lê di meqamê zanist û marîfetê de rêwî hêz û zanistê ji taybetmendiya rastiyê werdigire. Herwiha dibêje: "*Lîmerîfe şihud weqid edim el xelîqe bî wicûdî heq we îqraîhî wema nutuq bîmadîa el xelk îleyhî bî îlmîhî labîhalîhî*" (Baba Tahir: 1363, r. 31). Angot marîfet dîtina zatê rastiyê ye bêyî çav li hebûna mirov bike. Bi wateyeke din jî marîfet tê bidestxistin û dema rêwî bi awayek giştî di rewşa helandinê de be û gihiştibe meqamê man (Beqae). Ev jî tê wateya vegera ji bo meqamê marîfetê. Li vê derê jî yekbûn serî hildide. Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje: "*Leyse fî dunya exreb mînel urfeyn teqerebu bîl muwafiqe wetuxeyuhu bîl mebaînîhî fehem bîl xurbe lîqurbîhî murexerîdun we bîl eybîhî qanun*"(Baba Tahir: 1363, r. 31). Tê wateya di arifiyê de tişta herî balkêş li cîhanê nîne ku nêzî zatê Xwedayê Mezin bibe.

Baba Tahir wiha dibêje: "*El heqîqe mutalîbûn bîl exes we ehlil merîfe mutelîbûn bîl hirqe*"(Baba Tahir: 1363, 32). Armanc ji xelkê rast, despêk û dawiya her rastiyekê ye. Ji ber ku daxwaza wan yekperestiye û kiryarên xwe di gumana nefsê de paqij dikin. Ew jî ehlê marîfetê ne yan jî marîfeta wan di meqamê dawiyê yê rastiyê de ye û di deryaya marîfetê de dişewitin. Yan jî Baba Tahir li cihek din wiha dibêje: "*Zererûl alem ilmuhu wezerûrel merîd muraduhu wezererûel arif rebuhu*" (Baba Tahir: 1363, r. 33). Kesê ku ji zanistê dûr bikeve

zana nabe û divê timî zanistê li ber çavan bigire. Divê mirîd bêyî şêxê xwe bigihe miradê. Mirada arif jî pile û meqamê dawiyê yê marîfetê ye. Ev jî bi dîtina Xwedê dibe.

Baba Tahir wiha dibêje: "*El merîfe zerûruhu talîb bî sîhe el teleb*" (Baba Tahir: 1363, r. 33). Tê wateyê heskiriyên rastiyê. Di her meqam û pileyekê de, li pey şêxê xwe biçe, ger li gor daxwaz û rastiyê be, divê marîfetê li ber çav bigire.

Baba Tahir wiha dibêje: "*El arif zahîre zerîf we batînuhu terîf*"(Baba Tahir: 1363, r. 33). Divê rêwî paqij û xawên be, herwiha di dilê xwe de jî ter û nû be.

Ji ber giringiya marîfetê, Baba Tahir gelek li ser vê mijarê rawestiya ye û wiha dibêje: "*Men edee el merîfe cahîlun wemen eşaren îla tewhîdî edlun we esteslîn fîl merîn eqlun*" (Baba Tahir: 1363, r. 34). Sedemê ku rêwî xwe weke xwediyê marîfetê dizane, ew e ku di nava deryaya marîfetê de ye. Ango kesek di derbarê marîfetê de fêm bike, wê demê di derbarê marîfetê de dibe xwedî marîfet. Herwiha dibêje: "*Min wecîde nefsehu fî merîfetîhî, ade wicuduhu fî wextîhî cehlen fîl merîfetîhî*"(Baba Tahir: 1363, r. 34). Ev şêwaz wê yekê têdigihîne ku kesek bê û di derbarê marîfetiya xwe de fêm bike. Ev jî dibe ew têgihiştin ku di demek din de bi xwe dibe nezanek di nava marîfeta xwe de.

Bi dîtina Baba Tahir dema kesek ji meqamê zanist bê derve, wê demê diçe meqamê nezanîn û cahiliyê de. Herwiha dibêje: "*El xiruc îllel cehlî cihud*"(Baba Tahir: 1363, r. 34). Lê dema ji meqamê nezaniyê vegere, ew jî çaksaziyek (reform) mezin e. Herwiha dibêje: "*Wel cewee îllel cehlî merîfe*"(Baba Tahir: 1363, r. 34).

Baba Tahir giringiyek zêde daye marîfetê û li jora hemû zanistên din daniye. Baba Tahir wiha dibêje: "*Axîrel ilmu cehlun we axîrîl eqlî hîre we axîrul merîfe teslîm*"(Baba Tahir: 1363, r. 35). Bi dîtina Baba Tahir zanist mirov ber bi marîfetê ve dibe. Ji ber ku dema marîfet derketî, êdî hemû zanistên din winda dÎbn û dema wan derbas dibe. Lewra rêwî xwe ji hemû zanistan radikişe.

Bi dîtina Baba Tahir kesên ber bi nezanî û rêya windabûnê ve pêngavê bavêjin, wê demê ew dibe sedemê windabûna wî kesî. Di vê derbarê de wiha dibêje: "*La yerîfu terîqil merîfe îla men seleke dîqî înkar, wela ye'rif terîqil îlmî îla meseleke terîqîl cehlî*" (Baba Tahir: 1363, r. 37). Hinek kesên ku bixwazin bigihin marîfetê nikarin, eger bi rêya nezanînê ve be nabe. Herwiha Baba Tahir zêdetir li ser vê mijarê radiweste û dibeje: "*Men urifel xîre minel hesedî, we zekre neeme mînel tezkîhf wel îxlas minel xuzehe fehu arif*"(Baba Tahir: 1363, r.

37). Taybetmendiyên nef û aqij (mejî) wekhev in. Ango her kesê marîfeta wî û taybetmendiyên wî Xwedayî bin, dikarin bên naskirin û şîrovekirin. Baba Tahir sê astên cûda ji bo vê armancê cûdakiriye. Ji wan jî cinûdê nezanî, cinûdê aqil (mejî) weke tirs, xirûr, xem, netirsan û sexawet.

Bi dîtina Baba Tahir dema kesek bixwaze vegere aliyê Xwedê, wê demê şeytan nikare tiştekê pê bike û ji rê derxîne. Herwiha dibêje: "*Urife ricuî îlel heqî lem yezurel weswas*"(Baba Tahir: 1363, r. 37) Ev tê wateya ku dema kesek dixwaze ji rêya nezanî û cahiliyê (paşketinê) vegere aliyê Xwedê û marîfetiya Xweda, wê demê şeytan nikare wî/wê li ser rê derxîne û bixapîne. Ev jî ligel xelkê îrfan tiştekî belav bû û xwediyê vê baweriyê bûn. Ji ber ku dest ji xweşiyên cîhanê rakiribûn û tenê ji bo cîhana axîretê kar dikirin. Ev jî ji ber wê marîfetiya hebûn bû. Baba Tahir di vê derbarê de wiha dibêje: "*Ewel bîdayet ehlil merîfet tehqîq xewatir el qilub we hewaril bil esrar, we mutalibe xefîl hez bî merîfîhî xefa sirrî we xelbîhî xeyruhu wucud heta yekune merîfe muhîtuhu bîl cemee*"(Baba Tahir: 1363, r. 38). Ehlên mezhebê mezinên ol ji bo çend astan dabeş dikin. Di asta yekemîn de bi can û rih e, di asta duyemîn de jî bi rih, nef û aqil e. Di asta sêyemîn de jî tenê nefs e. Di asta yekemîn de di warê Îslam û Kufrê de ye, di asta duyemîn de jî dil û sing e, di asta sêyemîn de jî berdewamî û dûbarekirin e. Lê asta çarem û pêncemîn serî hildide. Ango di asta çaremîn de tenê giyan (rih) e û di asta pêncemîn de xemilandî û di asta şeşemîn de jî eşkere û veşartiye. Lê dabeşkirinek din jî di derbarê ehlê marîfet û zanist de cûdahî diyar dibe, lê her li derdora vê mijarê dizivire.

### 3.3. Di Derbarê Îlhamê De

Piştî behskirin û eşkerekirina herdu beşên îrfaniyê (Zanist û Marîfet) di Kelîmat Qîsar' a Baba Tahir de, niha jî beşeke din a îrfanî bêhnek diyar û berçav heye. Baba Tahir jî gelek bi eşkereyî behs kiriye û bal kişandiye ser. Ew beş jî îlham e. Baba Tahir bi giringî behs kiriye. Herwiha dibêje: "*Merîfe îla ehamu bîamî îhlam*"(Baba Tahir: 1363, r. 38). Ji bo cûdakirina îlhamê ji 'limat' a şeytanî, divê em wan bi rêya îlhamê ji hev cûda bikin. Ew jî tê wê wateyê ku tişta tê di nava dilê mirov de, dibe şeytan û dibe jî rehman be. Ev bi belge û şîroveyan nayê cûdakirin. Baba Tahir jî vê mijarê gelek zelal dike û dibêje: "*Men urful îlham min weswese we eluma minel hacîs sehelehu el firase. îlham el qaîhemena*" (Baba Tahir: 1363, r. 38). Xeyr û şer di dilê mirovan de hatiye veşartin û girêdan. Di her hebûnekê de xeyr û şer di nava dil de heye. Siwe el-Qae taybetmendiya şeytan e û aqil e. Rayîbûn nefse, nabe em cûdahiyê di navbera van beşane de bi xeyrbikin. Kesê nûra îlhamî di dilê wî de hat çandin, wê demê feraseta wî dirûst dibe.

Baba Tahir hê zêdetir behsa vê mijarê dike, dîtin û ramanên xwe yên îrfanî li ser îlhamê tên ziman û wiha dibêje: "El weswe lîmuwafeqel nefes welîlme lî muwafîqel îlm wel îlham lîl muwafeqel el heq"(Baba Tahir: 1363, r. 38) Baba Tahir li vê derê navê dûdiliyê) bikarnaniye, weke fikra nefsê ligel waswasiya (dûdilî) ku şeytanî girêdayî tîr û grûpekê bin. Ev nayê wê wateyê ku metirsiyên dûdiliya şeytanî û dudiliya nefs li ser rêwî kêm bÎbn, heta agehiya wê/wî ji wan metirsiyan çêdibe. Ev yek li aliyekê dikeve çarçoveya guman û xeyaliyê de. Bi wateyeke din jî hevsengiya guman û şikek xirab ji bo ti kesekê nabe. Herwekî Ruzbihan Biqlî dibêje, xewn û fantasiyê di dilê xwe de nahêle, ji dilê xwe derdixe(Beqlî: 1360, 40), Zemanî di vê derbarê de wiha dibêje, tîrêjek li dil dide û ranaweste, ger tenê di dil de bûya wê demê ew raman e û ger bi awayê 'tezkir' be jêre dibêjin, zikir. Ger hemû jî hizir û zikir be, jêre dibêjin dudilî û metirsî(Zemanî:1376, 598).

Herwiha di vê derbarê de dîtina gelek zanyariyên di warê îrfaniyê de tên holê. Hemû jî li ser wê yekê hemfikirin ku her kesê tiştek heram bixwe, wê demê mirov nikare cûdahiyê di navbera waswasî û îlhamê de. Lewra di vê demê de nefta mirov ber bi aliyê rastê ve naçe û bi berdewamî derewan dike. Lewra her îlhamek jî ji aliyê firîşteyan ve bê, dibe kesê ligel be yan jî berevajî red bike. Lê îlhamek ji aliyê Xweda ve bê, ebid nikarin red bikin û ligel nebin. Piştre jî Cuneyd û Îbn Eta baskek din tênin di nav de. Ew jî ew e ku dema du îlham ji aliyê Xwedê ve bên, pêwîste mirov kîjanê hilbijêre? Lewra Keşanî li ser zimanê Micedalladîn Bexdadî vedigêre, sê corên îlhamê zêde dike û wiha dibêje, ‘îlhama rih (giyan), îlhama dil û îlhama şêx. Lê hinek nivîskarên din îlhama aqil û îlhama baweriyê jî zêde dikin. Ger bi vî awayî be; rastî ew e û ew jî di bin çavdêriya wan çar îlhaman de bin. Ji ber ku îlhama dil û rih di bin fermana firişteyan de ne. Ger îlhama awaz alîkarê îlhama rih û awazê be, dîsa weke îlhama firîşte tê binavkirin(Kaşanî: 1385, 73).

Hocuyrî di pirtûka *'Keşif El-Hecûr'* de bi vî awayî behsa îlhamê dike û wiha dibêje: îlham bidestxistina diyarkirinekê ye, ji dil de çêdibe û îlhamên berî xwe ji nav dibe. Ji ber ku ji îlhama berê bihêztir e û dibe sedem ku îlhama berî ji nava dil de derxîne. Ehlên îlhamê jî li pey îlhama yekemîn digerin(Hocuyrî:1386, 563).

Baba Tahir hê zêdetir balê dikişîne ser îlhamê û wiha dibêje: "El firase xeteratun wel îşraf sabîtun"(Baba Tahir:1363, 39) ,Waswasî (dûdilî) di çarçoveya îlhamê de û demkurt e. Li ser Xwedayê xwe cêgir e û li ber çavan winda nabe. Armanc jê dûdiliya ku dil di xiyaba fermana ku fikra wê dike, jê fêm dike.

Herwiha Baba Tahir nehêniyê (veşartîbûnê) jî bi îlhamê ve girê dide û wiha dibêje: "*El fîrase ebzaru sirî bîl xiracîl sir*"(Baba Tahir: 40: 1363), Armanc ji nehêniyê despêka karê nehêniye ye ku ji dûdiliyê despê dike. Armanc ji nihêniya duyemîn jî meqamek li jora nefsê ye û ev jî eşkerekirina tiştên veşartiye. Bi awayekê ji bo derketina rêwî ji nefsa heywanî û şeytanî dibe alîkar.

### 3.4. Di Derbarê Mejî (Awez) De:

Mejî (aqil, awez) di warê pênaseya peyvê de tê wateya; 'Têgihiştin, agehdarî, dîtin, hûrbînî û fêmkirina tiştan. Awez di felsefeyê de dibe dû beş. Awezê Hizrî û Awezê Kiryarî. Armanca herduyan jî têgihiştina rastiyê ye. Awez di warê exlaq de hêzeke têgihiştina dîtina cîhanê ye, mirov dikare rastî û nerastiyan ji hev cûda bike. Di derbarê gotinê de jî pîvana hikûmdana di mirov de ye. Li gor Qur'an'ê jî, kesek têdigihe û têgihiştina wî heye. Yê din jî sedem û belgeyên ayînî têne. Lê li gor Qur-an'ê wateya herî giring a awezê, Qur'an tenê sedem anîn û belgeyên olî matiqîne'(Mehmûd:2017, 35).

Mewlanayê Romî bi awayek giştî ne ligel awez û felsefeyê de ye. Tevî ku di navbera awezê giştî û beşî de cûdahiyê jî dike. Awezê giştî di warê awezê beş de datîne. Lê ligel wateyeke zelal ji bo awezê giştî nîne. Di hinek mesele û mijaran de di wê baweriyê de ye tevahiya cîhanê, hinek caran li beramberî fikrê Ewliya de datîne. Bi awayek giştî helwesta bingehîn a Mewlanayê Romî wiha ye, 'Awez xizmetkarê ol e û şerte li beramberî ol raweste.'(Mehmûd:2017, 36).

Baba Tahir yek ji wan arifên navdare gelek giringî daya aqil (Mejî). Her tişt di pîvanên aqil de derbas kiriye û aqil li jora her tiştî daniye. Bi dîtinek din jî ligel Baba Tahir mejî ti tiştek ji zanist, marîfet û îlhamê kêmtir nîne. Belkî bi dîtina wî her çar beş bi hev re girêdayîne û ti ji van beşan bêyî yê din giringiya xwe namêne. Lewra wiha dibêje: "*El eqil ala, wetemeyîz fîl merîfe teklîf*"(Baba Tahir:1363, 40).

Mirov timî di wê baweriyê de ne mirovên din gelek reftar û helwestên cûda hene. Lewra dibe ji despêkê ve pêşbîniya (texmînî) gelek tiştên xirab bike. Lê bi berdewamî li benda nîşandana heskirin, mîhrîbanî û mejiye. Em dikarin vê yekê bêjin ku mirov zêdetir karîna mejî di nava xwe de bigire. Di heman demê de mejiyê hinek kesên din sînordar bi nav dike. Mejî ango çalakiyên hizrî. Lê ji bilî vê yekê jî karîna mirov digire û bi rêya pêwendiyên mezin dinirxîne û ji wan fêm dike. Li vir û herî dawî jî bawerî bi tiştên rast têne.

Li gor pênaseya Kant ku dibe pênaseya ji ya hemû fîlozofên din mantiqîtir be, mejî karîna herî bilind a marîfetê ye. Kant gelek ji mejî hez dike, lê di heman demê bal dikişîne ser sinordarkirina mejî. Dema mejî tê ser hemû tiştên derûniya çarçoveya ezmûna mirovan, mirov tenê dikare bixemilîne. Mînak, Xweda, rih, despêk û dawiya cîhanê, mirin û jiyan. Ev pirs jî bi rêya coreke endîşeyek bi vî serî hildide û dibe sedemê vejandina fikirînek kûr. Bi wateyeke din jî pirsyarên bi vî awayî bi berdewam li pêşiya fikir de dÎbn mijara hevrikiyan. Di demekê de û di warê marîfetê de mejî rastî çarenivîsek taybet û ecêb (seyr) dibe. Ji zimanê Fizulî tê vegêrandin û wiha tê gotin: "Bingehê ol çiye? Got, awez. Gotinê, bingehê awez çiye? Got, rawestandin. Gotinê bingehê rawestandinê çiye? Got, sebir pêvîst e(Heqîqet: 1375, 286). Bi dîtina Xezalî, awez û şerie bi hev ve girêdayîne, lê Xezelî felsefe red kiriye(Mensur Nijad: 1383, 193-194).

Bi dîtina Şems jî awez bi tiştên din ve hatiye girêdan, lê ne rizgarker e. Ev gotin rast nayê dîtin, lê ev ne tiştek giştî ye. Ango mejî girêdayî wê yekê ye ku kesek heta çi astê dikare sûd jê werbigire. Herwekî dibêje, awez heta li ber deriyê dergehî dibe, lê nabe hûndir de. Ango rûyê awez li vir hatiye girtin(Sabih Zeman: 1386, 426-429).

Bi awayek giştî em nikarin bi rêya awez bigihin rastiyê ango awez amrazeke neserekiye ji bo gihiştina rastiyê. Ligel beşeke zêde ya sofî û arifan rast tê danîn û heta astekê redkirina wê gelek zehmet e. Ligel ehlê zanistê jî ji bo gihiştina rastiyê, pêwîstî bi ezmûn û xwe îspatkirinê heye. Lê dîtinek berevajî jî heye, ew jî ew e ku ji bo nasîna rastiyê pêwîstî bi awezê heye. Lewra kesê bi awezê li rastiyê negere, dikare ji ol derbikeve. Belgeya ji bo vê yekê jî ew e ku bi awezê îspat dikin ku ola Îslamê oleke rast e û ji olên din zelaltir e.

Dibe ku hebûna derûnî weke sedemek di derbarê pêwîst nebûnê de, lê ev ji bo me hemûyan eşkereye ku xwediyê wê derûniyê ne. Lê çima hemû mirov ne Xwedaperest in. Îbn Erebî, putperestî jî weke xwedaperestiyê datîne, hemû pût perest, rohanî û hwd. bi Xwedaperest bi nav dike. Lê ev mijar di ola Îslamiyetê de nayê kûrkirin, her ferdekî Misilman li ser derûna xwe sedemekê têne ku Qur’an pirtûkek asîmaniye û sextekarî di nav de nehatiye kirin. Îslam bi hêza hizir û mejiyê xwe derket meydanê û tenê di nava çend salan de gihişt asta herî bilind a cîhanê. Di çend sedsalên despêkê de bûn hêza herî bilind a cîhanê. Bingehê ola Îslamê awez e, lewra awez, awezî olê herdu awezên mirovahî û nemirovahiyê digire nava xwe. Awezê xwezayî, derûnî, ezmûnî û berdest digire nava xwe. Awezê mirovanî bi dîtina ol ligel nasandina awez di felsefeyê de bi kêmanî ne dijber e. Di gelek mijaran de xalên wekhev hene(Mensur Nijad: 1383, 43).

Di vê derbarê de Baba Tahir dîtinek taybet li ser awezê heye û ji ya gelek şîrovekaran cûda ye. Baba Tahir wiha dibêje: "*Weteklîf lîl merîfe îktîsab, wel merîfe bîl îktîsab hîre, wella yerîfullahu ya ella*"(Baba Tahir: 1363, 40). Ev tê wateyê ku di bidestxistina marîfetê de abid û mebud di nava wan de bin, bandorker û yê bandorê dike bibîne. Ger bandorker bixwaze ji bo bidestxistina marîfetê û di heman demê de bidest xistî, ango burhaniya marîfetê bidest xistiye. Berevajî jî marîfetek bi bi bandorker û guman bê bidestxistin, ew şermî û sernizmiye.

Arifê ku marîfet bidest xistibe, ew marîfet bes e, derya dîtiye, ji bo xwe heyran û sergerdan e. Ev nayê wê wateyê ku xwediyê dîtinê be, belkî heyran û sergermî rûyê nezaniyê ye. Ji ber vê yekê ev arif xwe sergerdan nake, dema di nasîna Xweda û taybetmendiyên Xweda de nabîne. Ev jî tê wê wateyê ku marîfet dîtin e nekû bidestketin e.

Baba Tahir wiha dibêje: "*El eqil siracil ibûdiye, yerifû bîl heq minel batil, we tae minel meesiye, wel îlmu minel cehil*"(Baba Tahir: 1363, 41). Bi wateya; "*El eqil maîde bîhî rehman*" Ew mejiyê pileya têgihiştina zanistê derbas nake.

Bi kurtî bi dîtina Baba Tahir ji bo bidestxistina marîfetê, pêwîste arif bi rêya aqil bidest bixe. Ji ber ku her aqilek dibe sedemê şikandina astengiyên li pêşiya nasîna rastiyê. Ger wisa be, arif ji bo bidestxistina meqamê dîtinê (şihud), ji zanist, marîfet, îlham û aqil dest pê dike. Ger arif dest bi vê kiryarê kir, wê demê pileya mirovbûnê derbas dike, digihe asta rohanî. Helandin despê dike û piştre jî manê bidest dixe.

**ENCAM**

Di dawiya vê lêkolînê de em gihiştin wan encaman, ji wan jî;

1- Baba Tahir yek ji helbestvanên arif ê navdarê wêjeya Kurdiye û helbestên xwe bi bi zaraveya Lorî nivîsandiye. Di naveroka helbestên wî de gelek beş, zarave û taybetmendiyên îrfanî û sofîgerî tên dîtin ku bi awayek taybetmendî hatine bikaranîn. Baba Tahir di wêjeya Farisî de yek ji bingehên wêjeya îrfanî bû.

2- Baba Tahir di warê mezhebî de girêdayî baweriya Ehlê Heq (Yarsan) bû. Lê baweriya wî bi 12 Îmamên Şîeyan dihat û ji wan hez dikir.

3- Li gor çavkaniyên ku heta niha li ber dest hene û li ser Baba Tahir hatine nivîsandin, Baba Tahir he rçiqas li ser mezhebe Şi’îyan hatibe zanîn jî, lê çibo piştraskirina vê mijarê di deste me de çavkaniyek xurt tüneye.

4-Baba Tahir zimanê Erebî û Farisî bi başî dizanî. Li Hemedanê di hucre û xaneqayan de xwendin bi dawî kiriye. Di warê zanist, marîfet, bîrkarî û feleknasiyê (astrolojî) de zanyariyên baş hebû.

5-Sofîgerî ji despêkê ve bi Xwedaperestiyê dest pê kiriye. Di qonaxa kamilbûnê de bi sema û govendê xemiliye. Li ser bingehê cezbe û îş ber bi yekitîbûnê ve pêngav avêtiye.

6-Îrfan tê wateya nasîn, di warê naverokê de tê wateya dûbare nasînê yan jî nasîna tiştek lemskirî. Yan jî nasîna heqê teala bi xwe gihandin û sembola rastiyê. Tê wateya keşif û şihudê.

7-Baba Tahir nivîskarê belavoka 'Kelîmat el-Qîsare'. Ev belavok bi zimanê Erebî nivîsandiye, gelek sembol û gotinên veşartî yên îrfanî û wicûdî di nav de cih digirin. Bi awayek taybet, aloz û cûda di her pirtûkek din a îrfanî de nivîsandine. Baba Tahir di vê belavokê de gelek beş, zarave û ramanên xwe yên îrfanî yên taybet nîşan daye. Lê ya herî diyar jî 'Zanist, Marîfet, Îlham û Mejiye.' Ev beşane ligel arifên din jî gelek tekezî li ser hatiye kirin. Lewra li gor encama em gihiştinê, Baba Tahir zêdetir giringî bi zanist daye, çi zanista şerîetê, zanista xweza (siruşt) û pratîkî. Piştre jî behsa marîfetê kiriye û bi baweriya wî, divê çavkaniya marîfetê ligel ji aliyê Xweda bê. Piştre jî behsa îlhamê kiriye û bi dîtina wî, îlhama şeytanî û mirovî heye. Mirov dikare li gor dîtina xwe yekê hilbijêre û li gor kiryaran derdikeve holê ku ev îlhama miroveye yan jî şeytanî. Di dawiyê behsa mejî kiriye. Bi dîtina wî mejî çavkaniya

hemû tiştekê ye û mirov bi rêya mejî biryarê li ser tiştan dide. Wekî di beşa sêyemîn de gelek bi zelalî behsa van her çar beşane hatiye kirin.

**ÇAVKANÎ**


Bêrtêlis, Yugnî Edawir Wîç, (1382), *Tesewuf We Edîbat Tesewuf*, (Werger; Sîrus Îzdî), Tehran: Emîr Kebîr

Bestanî, Fuad Efram, (1906), *Ferheng El-Mu'cem'ul-Wesît*, (Erebî-Farisî) Cilda Duyemîn, Tehran.

Cihanbexş, Ferheng, (1384), *Zindîgîname we Şeir Şaîran Îranî*, Nesil Nîkaban, Çapa Duyemîn Tehran.

Circanî, Mîr Seyd Şerîf, (1377) *Teerîfat Ferheng Estelahat Miarif Îslamî*, Firuzan.

Daniş Pijwe, Minuceher, (13790), *Baba Tahir Irfanî Kennedey Dubeytî hay Aşiqaney Mihelî*, Mucelley Pijuhiş Elum Însan, Jimare 1- 2, Tehran.

Dehxuda, Elî Ekber, (1346), *Lîxetname Dehxuda*, Çapa Duyemîn Danşigae Tehran.

Ebdilî, Elî, (1372),*Be Hir Milet Ke Hestîm*, Tehran.

Ebdullah, Ebî Nesr b. 'Elî Serrac el-Tûsî (1381), *el-Leme'*, Daru'l Kutubi'l Hedîse, Musenna, Bağdat.

Ehmed Penahî Simnanî, Mihemed (1379), *Dubeytî Bumî Sirayan Îran*, Siruş, Çapa Yekemîn Tehran.

Elaedîn Secadî, (1979), *Mêjûy Edebî Kurd*, Çapxaney Merûf, Bexdad.

Elî, Ebu Ebdulrehman, (1979), *Miwazîn El Sufiye*, Dar el-Yeman, Beyrut.

Ensarî Hirurî, Xewace Ebdullah, (1375), *Sed Mîdan*, Teshîh Ebdalhî Hebîbî, Dinyay Kitab Tehran.

Estîz W.T, (1367), *Îrfan wel Felsefe*, Mektebetu's-Sûm, Tehran.

Ettar Nşabûrî, Ferîdûddîn, *Tezkiretu'l Ewliya*, (Tsh.: Ronald Nicolsin) Dunya Kîtab, Tehran.

Ezkayî, Perwîz, (1375) *Baba Tahir Name*, Tus, Çapa Yekemîn Tehran,

Fena, Fatîme, (1383), *Tewhîd, Danişname Cîhanî Îslam*, C. 8, Be Sirperestî Xilamelî Hedad Adil, Daîre El-Miarif Îslamî, Tehran.

Gulpinarî, Ebdulbaqî, (1380), *Tesewwuf der Yeksed Przêş û Pasix*, Ehya'ul Kitab, Tehran.

Helebî, Elî Esxer, (1376), *Mebanî Îrfan û Ehwal û Îrfan*, Tehran.

Hemedanî, Baba Tahir, (1365), *Dubeytî*, Pirtûkxane, Salih Hesîniye Emîr Silêmanî.

Hemranî, Eshed, (2000), *el-Tesewuf Minşae We Mustetahete*, Dar El Nefaîs, Beyrût, Libnan.

Henna el-Faxûrî, Xelîl Cûr, (1386), *Dîrokê Zanîsdustî Felsefe Cîhanî İslamî*, Ferheng, Tehran.

Heqîqet (Refiî), Ebdulrefiî, (1375), *Tarîx Irfan we Arifan Îranî*, Çapa Sêyemîn Kumiş, Tehran.
Hesînî Karzunî, Seyd Ehmed, Feheluyat Diramedî (1379), *Bir Dubeytî Sirayî*, Pijuhşinamey Elum Insanî, Tehran.
Hicuyrî, Ebwal Hisên Elî Bin Esman, (1386), *Keşif el-Mihecub*, Muqedeme û Teshîh Mehmûd Ebdî, Sirûş, Tehran.
Hidayat, Reza Qelî Xan, (1346), *Riyaz'ul-Arifîn*, Kitab Firuşî Wesal, Tehran.
Hîdayet, Rida Qulîxan, (1382), *Mucemme'ul Fuseha*, Bekaşuş Mezahir Mesfa Emîrkebîr Tehran.
Himdat Şahîn, (2013), *Gulxaneyê Îrfan*, Çapxaneyê Rojhelat, Silêmanî.
Hiyom, Rabird, (1379), *Edyan Zindeê Cehan*, Defteru Neşr Ferheng Îslamî, Tehran.
Hûmaî Celaleddîn, (1366), *Tasawwuf Der Îslam*, Întişarat Elmî we Ferhengî, Tehran.
Izaledîn Kaşanî, Mehmûd Bin Elî (1385), *Musbah El Hidaye we Miftah El-Kefaye*, (Teshîh Efit Kirbasî û Mihemed Diresabir Zigir Xaliqî), Çapa Duyem, Ziwar, Tehran.
Îbn Cuzî, Ebu el Ferec, (1381), *Tilbîs Iblîs*, Danişgahî, (Werger Elî Riza Zekawetî) Qeragezlu, Tehran.
Îbn Xeldun, Ebdulkerîm, (1363),): *Muqedeme Îbn Xeldun*, Întişarat Elmî we Ferhengî (Werger: Mihemed Perwîn Ginabadî), Çap. Heştemîn Tehran.
İlmu'l Hûda, Celîle, (1383), *Tewhîd Danişnamê Cihan îslamî*, Maarif Îslamî, Tehran.
Îmad Şukir Mehmûd (2017), *Tehew û Zaraveyên Irfanî di Helbestên Fexredîn Êraqî û Mehwî De*, Zanîngeha Yuzuncu Yil, Kolêja Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Van.
Îmaduddîn Ebî El-Firae, Îsmaîl Bin Kesîr El-Demşiqî, *Tefsîr el-Qur'an el-Ezîm*, Daru'l Kutub'ul İlmîyye, Beyrût Lubnan.
Îzedîn Mistefa Resûl, (2008), *Ehmed Xanî*, (Wergêr: Mele Mustefa ÇApkirawa), Hewal Ebûbekir. Hewlêr.
Kamil el-Şîbî, (1963), *el-Sale Beyn el Tesewuf û el-Teşê*, Dar El-Pîqafe, Bexdad.
Letîf Helmet, (2009), *Sofî û Sofigerêtî Karîgerî Hizir û Eyd û Kulture Ayîniyekan Le Ser Sofîgeriyetî Îslamî*, Çapa Duyemîn, Çapxaneya Saye, Silêmanî.
Lihun Qadir Ebdulrehman, (2014), *Diwalîzmî Dijyek Le Honrawe Lîrîkiyekanî Mewlanay Romî Mewlewî Tawegozî Da*, Çapa Yekemîn, Çapxaneya Rehayî, Tehran.
Lingiz, Martîn, (1378), *Îrfan Îslamî Çîst*, Suhrewerdî, Tehran.
Marif Xeznedar, (2010), *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Yekem, Çapî Duyem, Çapxaney Aras, Silêmanî.

Mehmûd Zeydan, (2001), *Nezeriye el-Muerîfe Ebid Mufekirî Îslam,* Musses El-Rîsale, Bexdad.
Mensûr Nijad, Ehmed, (1383), *Eqil Der Sehe Dîn Bezrig Esmanî*, Dihurî, Tehran.
Meybedî, (1371), *Keşif El-siwar û Edehe El-Ebrar,* Emîr Kebîr, Ebwa Fedil Reşîdaledîn Çapa Pêncem, Beh Ehtemam Elî Esxır Hîkmet, Tehran.
Mihemed Wesman, (2013), *Felsefe Sofîgerî*, Çapxaneya Rojhilat, Hewlêr.
Muqesud, Cewad, (1354), *Şerie Ehwal û Ajar û Dubeytî Hay Baba Tahir Uryan*, Encemen Asar Milî, Çapa Duyemîn Tehran.
Museeb Edhem, (2012), *Lewênewe Bo Mana Ezmunî Menewî*, Govarî Hejan, Hêjmara 25, Silêmanî.
Mu'temîn, Zeyn El-Abidîn, (1352), *Tehwel Şeir Farisî*, Tihur, Çapa Duyemîn Tehran.
Nezmî Tebrîzî, (1378), Dewîst Sixnur, *Tezekere ElŞeiray Menzum û Mensur*, Sirûş, Çapa Yekemîn, Tehran.
Nurbexş, Cewad, (1378), *Ferheng Nurbexş Esetalahat Tesewuf*, Bend Qelem Tehran.
Omer Şêx Nûredîn (2012), *Heqîqetî Tesewuf*, Silêmanî. Xerqanî Ebû Hesen, (1385), *Nur'ul 'Ulûm*, Bekaşuş Ebdurrefîq Heqîqet, (Ustad Refî), Behcet Tehran.
Quşeyrî, Ebdulkerîm b. Hewaz, (1385), *Risaletu'l Kuşeyrîye*, (Tsh.: Bediüzzeman), İlmu'l Ferhengî, Tehran.
Rehber, Muhemmed, Usman, (1381), *Qur'an-û Runaşnasî*, Estanqudus Rebewî, Meşhed.
Reşad Mîran, (2012), *Merîfe Tak û Komel Le Riwangeh Sosyologay Merîfewe*, Bilawkirawey Aras, Hewlêr, Kurdistan.
Ribka, Yan, (1383), *Tarix Edebiyat Îran,* Suxan Tehran.
Riwandî, Mihemed, (1388), *Rahee El Sediru we aye el-Sirur*, Bihî Seî we Teshîh Mihemed Îqbal, Întîşarat Ilmî, Çapa Heftemîn, Tehran.
Ruzbehan Beqlî Şîrazî, Ebu Mihemd Bin Ebî Nesîr (1360), *Şirih Şethiyat*, Şamil Giftarhay Şur Engîz we Remzî Sufyan, Teshîh we Muqedeme Ez Hanrî Kirbin; Werger; Muqedeme Ez Mihemed Elî emîr Meezî, Tihurî Tehran.
Sahib El Zemanî, Nesredîn, (1386), *Ferheng û Erşad Îslamî*, Xed Sum Tehran.
Salih Quzn el-Fuzan, (2009), *Dîdgah Sufiye Dirbare Ebadit û Dîn,* Govarî Ayindî, Jimare 82, Silêmanî
Secadî, Seyîd Cehfer (1379) *Ferheng Muarif Islamî*, Dewre Se Cildî, Kuş, Tehran.
Secadî, Seyîd Cehfer (1386), *Ferheng Îslahat Îrfanî*, Tehûrî, Tehran.
Seedî, Ebdulrehman Bin Nasir, (1422), *Teysîr'ul Kerîm er-Rehman Fî Tefsîr Kelame'l Menan*, Daru's-Selam Riyad.

*Seîdî*, Tehran.
Siltan Elîşah Ginabadî, Mila Siltan Mihemed, (1363), *Şerih Faris Bir Kelîmat Qesar Şêx Ecil*
Sirûr, Taha Ebdul Baqî, (1373), *Hellac Şehîd Tesewwûfu'l Îslamî*, Esatîr Tehran.
Siruş, Ebdulkerîm, (1379, Çapa Pêncemîn 5) *Qesey Erbab Murefet*, Musse Ferhengî Sirad, Tehran.
Şefî'î, Kedkenî, Muhemmed Rida, (1385), *Taziyanehay Silûk,* Agah, Tehran.
Şerîet Midarî, (1372), *Şerih we Tefsîr Luxat Qur'an*, C. 1, Estan Qedis, Meşhed.
Şimel, Ana Marîa, (1377), *Eb'ad Îrfanî Îslamî*, Ferheng ÎslamÎ Tehran.
Tarûmîzade, Hesen, (1383), *Tewhîd Danişname Cîhan Îslam*, Maarif Îslamî, Tehran.
Tedeyyin, Etellah, (1375), *Cilwehay Tesewwuf û Îrfan Der Îran Cihan*, Tehran.
Tiwana Emîn, (2009), *Mehwî Weke Arifêk Le Nêwan Serkeşî û Kofirda*, Govarî Ayîn, Hêjmar 82, Silêmanî.
Xelef Tebrîzî, Mihemed Hisên, (1362), *Burhan Qadie* Emîr Kebî, Çapa Pêncemîn, Tehran.
Xelîfe, Fetih Ellah, (1975), *Mixate Drat El-Felsefe El-Îslamî*, Mekteb Kerîdiye, Beyrut, Libnan.
Xenî, Qasim, (1383), *Tarîx Tesewuf Dirase Mutteuwartuthu Latanî*, Zewar Tehran.
Xetmê Lahorî, Ebûl Hesen Ebdu"r-Rehman, (1378), *Şerh Îrfanî Xezelhayê Hafiz*, (Tsh.: Bhaûddîn Xurumşahî), Qetre Tehran.
Xezalî Dus, Ebu Hamid Mihemed (1375), *Ehyae Ilumil Dîn*, (Thq.:Be Kuşiş Hiseyn Xedyucim), Ilim û Ferhengî, Çapa Heştemîn, Tehran.
Xezalî Dusî, Ebu Hamid Mihemed, *Kîmyayê Seadet*, Ilmî û Ferhengî (Teshîh Hesen Xedyucim), Çapa Yekemîn, Tehran.
Yesrebî, Seydî Yehibî, (1379), *Dîn û Îrfan*, Ferheng û Endîşey Îslamî, Tehran.
Zimanî, Kerîm (1376), *Mınagir Eşq*, Çapa Şeşemîn, Tehran.
Zirîn Kub, Ebdul Hisên, (1387), *Erziş Mîras Sufye*, Emîr Kebîr, Tehran.
Zurqanî, Seyyîd Mehdî, (1378), *Ufquhay Şi'r û Endişey Senayî*, Ruzgar Tehran.

**PÊVEK**


Berga Kitêba ‘**Şerha Kelîmatu’l-Qîsar a Baba Tahir’**




## Rûpela Ewil a Kitêba Baba Tahir



**Mînakên Gotinên Baba Tahir ên Din av Kitêbê de**



Rûpela Dawî Ya Kitêba '**Şerhû Kelîmat Baba Tahir**'



**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

*LİSANSÜSTÜ TEZ ORİJİNALLİK RAPORU*

**VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**04/09/2019**

Tez Başlığı / Konusu

**DI el-KELÎMATU'L-QÎSARA BABA TAHIRÊ HEMEDANÎ DA TAYBETMENDÊN ÎRFANÎ**

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 85 sayfalık kısmına ilişkin, 04/09/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 3 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 3 (Yüzde Yedi) dır.

**Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:**
- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimeden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal İçemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

04/09/2019
**NARMÎN MOHAMMED HUSSEİN**
Adı, Soyadı, İmza

| | |
|---|---|
| **Adı Soyadı** | : **NARMÎN MOHAMMED HUSSEİN** |
| **Öğrenci No** | :**17950001006** |
| **Anabilim Dalı** | : **Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı** |
| **Programı** | : **Örgün Eğitim** |
| **Statüsü** | : Y. Lisans X☐ Doktora ☐ |

**DANIŞMAN**
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
04/09/2019

**ENSTİTÜ ONAYI**
**UYGUNDUR**
04/09/2019
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ
**Anabilim Dalı Başkanı**